# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN HEJMAR (9) Havîn 2023



- Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî
- Tundirewî di navbera Şoreş û Desthilatdarîyê de
- Têkilîyên Bîrdozî û Sîyasî Yên Di Navbera Partîya AKP Û Komên Radîkal De
- Îran

Desteya nivîser:

**Hejar Şekir**

**Yûsif Mistefa**

**Rakan Şêxî**

**Kurdyar Dirêî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastîne**

**Hejmara (9) Havîn – 2023**

## NAVEROK

**Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî ........ 5**

**Tundirewî di navbera Şoreş û Desthilatdarîyê de ........ 29**

**Têkilîyên Bîrdozî û Sîyasî Yên Di Navbera Partîya AKP û Komên Radîkal De ..... 63**

D. Celal Zênatî

**Îran ........ 90**

## Gotina hejmarê

**Xwendevanên hêja:**

Jixwe mijarên vê jimarê berdewamîya mijarên jimara çûyî ne.

Mijara yekem "Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî" e ku hêmanên sereke yên efsana Kawayê Hesinkar (Kawa, Çiya û Agir) berdewam dike, her wiha Newroza nûjen û çawanîya pîrozkirina wê radixe ber çav.

Lêkolîna duyam"Tundrewtî di navbera şoreş û desthilatdarîyê de", mijara karîgerên ku tunderwtîyê hildibirîne weke (karîgerên derûnî, civakî,siyasî, aborî û bandora derve) şirove dike.

Di lêkolîna bi navê "Têkiliyên Bîrdozî Û Siyasî Yên Di Navbera Partiya AKP Û Komên Radîkal ", mijarên têkilîya Daiş û kurê Erdogan, têkilîyên Beşgeha Sadat bi Erdogan û Daişê re û rola wê di perwerdekirina sawkarîyê de û biyangên ku Daiş çêkereke ku her dwletekê li gor xwe ew bi kar anîye, zelal dike.

Weke bidawîkirina lêkolîna "Komara Islamî ya Îranê", beşê dawî li ser doza kurdî û pêşeroja Îranê radweste.

**Sernivîser**

# Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî

**(2 ji 2)**

## 3. Kawayê Hesinkar:

Di demekê de ku civak di rewşeke tirsê de dijiya û xwe radestî zordarê hov ``Ezdehak`` û kahinên wî kiribû û êdî nema karîbû parastina zaroyên xwe bike û direviya çiyayan, di wê demê de Kawayê Hesinkar derket holê. Ew weke kesekî kedkar û şervan ku bi çakûçê xwe şer dike, dihat pesindan. Xuya ye navê Kawa nêzî navê kara ye. Jixwe navê kara li wan kesên azad û biçek ên di civaka êlê ya medî ya kevin de bûn. Lêkoler Ehmed Xelîl[1] wisa dibîne: ``Peyva Kar di zimanê kurdî de, tê wateya kar an jî karîna kirina tiştekî. Di sedsala şeşem a berî zayînê de. Piraniya kesên azad ên li ser xaka Medyayê (çiyayên Kurdistanê yên kevin) dijiyan bi navekî hevbeş dihatin navkirin ku ew nav jî Kar bû. Ev kes ji aliyê medenî, mafî û pîşeyî ve azad bûn. Impiratoriya Asûrî li ser destê van azadan hilweşiya û impiratoriya Medî li ser destê wan hat damezirandin…`` Ev yek navê padîşahê medî yên navdar bi bîra me tîne (Kîkaws/Kiyaxisro/Kîxisro). Dibe ku navê Kawa weke nasnavekî be ku tê wateya kesê payeblind, hakim an jî padîşah[2]. Di pirtûka Avista ya pîroz de navê Traytona kurê Atifya[3] heye. Ev kes ji êla lehengan a ku leşkerên ronahiyê ne (Ahora Mazda). Ev kes kujerê Ezdehakê sêserî û şeşçav e. li gor Avistayê ew kesê duyem e yê ku Hawmaya pîroz vegerandiye cîhana maddî. Ew carinan weke xwedawendê ku riwekan dinimîne tê dîtin. Her wiha ew carinan weke xwedawendekê bi sûretê mirovan tê pêşkêşkirin. jixwe hawma, riwekeke li ser çiyayan şîn tê û weke guvaşekê ji bo xwedawend Ahora Mazda tê pêşkêşkirin. heya niha Hawma li ba ariyên kevin nehatiye nasîn. Xuya ye ev yek bi kuştina Kawa ji Ezdehak û vegera xortan ji ser çiyayan re digunce.

Her wiha navê Kawayê Hesinkar amajeyê bi karê hesinkariyê yê ku agir tê de heye, dike. Agir jî li ba bapîrên kurdan pîroz bû. ya ku vê yekê tekez dike,

---

[1] Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, Şahsamana Medya, çapa yekem, 2011, weşanger: Saziya Mukriyanî ya lêkolîn û weşanê, Erbîl, r180.

[2] Dr. Xelîl Ebdilrehman, Evista/pirtûka pîroz a ola zerdeştî, çapa duyem 2008, weşanger: Rewafid a çand û hunerê, Şam, r30.

[3] Heman jêdera borî, r132

belavbûna berfereh a hesin û kanzayan di çiyayên Zagrosê de ye[4]. Jixwe lutkeya wê di serdema medî de bû ku pê re serdema hesinî hat (nêzî 1000-1500b.z). pêwîst e were zanîn ku kurdan navê hemdem ``hesin`` ji mêj ve li hemû kanzayên hişk dikin û her tişta hişk bi hesin bi nav dikirin. Hesin, li gor ku ramanger Ebdela Ocelan, xwedî rolekê bû di şoreşên ku li dijî zordarên civaka kole de[5]. Ew wisa dibêje: ``… Piştî ku hesin bi awayekî zêde hat bikaranîn, sîstem derbasî qonaxeke bû em dikarin bibêjin ew qonaxa guhertina ber bi demokrasiyê ve ye. Lê tevî ku vê qonaxê gelek nûkirin û çeksazî hewandin, wê nikarîbû nîşaneyên hilweşînê veşêre…em dibînin ku bandora mezin a duyem a hesin li ser aboriya kileyî û binyata civakî di bajaran de ku piştî 1000b.z heliya û aloz bû, li ba çîna ku karê destan li bajaran dikin, dixuye. Çimkî bilindbûna nirxê kanzayan û malgirtina wan ji hêla çîna siyasî ya desthilatdar ve, dihişt yek ji cûreyên pêrewiyê di rêbazê têkiliyên koletiyê de derkeve. Lê dema kanza û di serê wan de hesin ketin destê karkeran bi nirxekî arzan, hişt ku ev çîn bibe çîneke nû ku rikbera rêjîmê ye û êdî bajar ji navendiya rêjîma koletiyê derketin û ber bi sîstema civakî ve çûn ku tê de civak bi rola rikber û dijberê rêjîmê dilîze…`` Vê yekê –weke ku Ocelan dibêje- hişt hesin bi awaykî afsanewî di hişê civakê de cihê xwe bigire. Her wiha Gront Fîlhilm[6] dibîne ku hesinkar xwedî cihekî bilind bûn di koşkên padîşahan di şahsamanên kevin de, nexasim şahsamana Hûrî. Ev hesinkar berpirsên dabînkirina çek û mertalan bûn.

Dîroknas li ser dewlemendiya çiyayên Kurdistanê bi hesin tekez dikin[7]. Li gor şûnwarên hunerî yên kanzayî yên ku hatine vedîtin, zanayên erkolojîk[8] dibînin ku di sedsala sêyem a berî zayînê niştecihên xwecihî yên kûtî û ji bilî wan ji bapîrên kurdan, di dema xizmeta wan a bo şahsamana hîsî, kangehên kanzayan li cihekî li jora Çemê Dicleyê (li cihekî bi navê Ergan-Madan) bi kar

[4] Ji bo agahiyên zêdetir: Rafide Ebdilah Ebdisemed Qeredaxî, Kurdistana Iraqê di dîroka kevin de li gor jêderên mîxî yên sedsala 3b.z heya 612b.z-seta doktoriyê di dîroka kevin de li Zanîngeha Silêmaniyê, fakulteya zanistên mirovahî, beşa dîrokê, 2008

[5] Ebdela Ocelan, ji desleta kahinên somerî ber bi şartistaniya demokratîk ve, beşa yekem, bê weşanger û hejmara çapê, Pdf. R168.173.

[6] Gront Fîlhilm, hûrî/dîrok û şaristaniya wan, wergêr Dr.Farûq Ismaîl, çapa yekem 2000, weşanxaneya Cedel, Heleb, r93.

[7] F.Diyakov – S.Kovalîv, şaristaniyên kevin/beşa yekem, wergêr Nesîm Wakîm Yazecî, çapa yekem 2000, weşanxaneya Elaidîn, Şam, r 189-195.

[8] Selewat Golyamov, Ariyaya kevin û Kurdistana mayînde (kurd ji kevintirîn gel), wergêr: Dr. Ismaîl Hesaf, çapa yekem 2011, weşanger: Saziya Lêkolîn û weşanê Mukriyanî, Hewlêr, r301

anîne. Neviyên wan jî dev ji vî karî bernedan, loma em vê yekê li ba niştecihên çiyayên Kardoxê dibînin[9]. Êlên Kardoxê[10] bi vî awayî ji aliyê pîşesaziyê ve dabeşkirî bûn: şivan, cotkar û hesinkar. Kesînfon/Zînofon ê ku vegera 10 hezar leşkerên yûnanî di rêya Kurdistana kev re bi rê ve biriye, amajeyê dike ku hilberînên bronzî li çiyayên Kardoxê peyda bûn û çîna hesinkaran yek ji hêmanên civaka kurdî ya kevin bûn.

Ji ber ku piraniya mirovên ku girêdayî heman tuxmî ne û xwedî heman çanda hevbeş in, ew mirov bi heman rêbazî dihizirin. Her wiha ji ber wekheviya rewşên derdora wan, em dibînin ku kesayeta Kawayê Hesinkar di mîtyolojiya hin gelên din de jî heye; her wekî lehengê mîtyolojiya sikendinafî (Noridî) ``Thor``, xwedawendê agir ê ixrîqî/romanî ``Hîfaystos/Volkan`` û ``Sefarûcê hesinkar[11]`` ê ku xwedawendê hetafê bû li ba gelên sulafî. Her wiha Hireqil di mîtyolojiya ixrîqî de ku wî ejdehayê efsanweî Hîdra[12] kuşt. Her wiha hin lehengên din jî hene ku cihê xwe di çîrokên gelêrî yên gelên din de girtine.

| | | |
|---|---|---|
|  |  |  |
| ***Lehengê mîtyolojîka skendinafî (noridî) ``Thor[13]``*** | ***Sefarûx, xwedawendên hetafê li ba gelên sulafî*** | *``Hîfaystos/Volkan``* ***xwedawendê agir û çêkerê çekên xwedawendan*** |

[9] Çiyayên Kardoxê, çiyayên Rawandozê li başûrê Kurdistanê û çiyayên Dêrsimê û Erzîncanê li bakurê Kurdistanê dihewînin. Niştecihên vê herêmê kardox bûn.

[10] Selewat Golyamov, Ariyaya kevin û Kurdistana mayînde (kurd ji kevintirîn gel), wergêr: Dr. Ismaîl Hesaf, çapa yekem 2011, weşanger: Saziya Lêkolîn û weşanê Mukriyanî, Hewlêr, r315

[11] Malpera brick- school, xwedawendên sulafî yên kevin, xwedawendên sulafî, lînk: https://healthfemale.ru/ar/old-slavic-deities-slavic-gods.html

[12] Hîdra: hovekî efsanewî ye di mîtyolojiya ixrîqî de. Ew marekî pirserî ye û her ku serekî wî tê jêkirin, du li şûnê çêdibin.

[13] http://www.odinsvolk.ca/thorshammer.htm

Em nimûneyên mîna kesayeta Kawayê Hesinkar bi taybet di koltûra gelên arî yên dûrî xaknîgariya Kurdistanê de dibînin (mîtyolojîya nordî û cermanî li bakurê Ewropayê[14]/2000b.z[15]). Jixwe peyva Nord[16] tê wateya ``bakur`` di zimanê cermanî de. Lehengê efsaneyê weke Kawa radihêje çakûçekî û ew xwedî hêzeke ne ji rêzê ye û navê wî Thor e û ew kurdê xwedawend Odîn e. Odîn jî xwedawendekî kevin e li ba gelên cermanî. Thor şervanekî gewre ye û dilovanê mirovan e. navê wî tê wateya birûskê û ew bi çakûçê xwe yê ku ji dest wî dernakeve tê naskirin. Dijminê wî marekî nebaş e ku navê wî Corminkand e[17]. ew sembola şer e di cîhana jêrîn de. Thor dawî dikare wî bikuje.

Ragihandina Kawa ji şoreşê re û libakirina wî ji kirasê xwe re (weke nîşana despêkirina şorerê), gele amajeyan dihewîne, dibe ku yên herî girîng ev bin: Padîşahê zordar û kehnûtên wî weke kesine ku ji çand û niştec biyanî ne, bi nav dike. Her wiha bi giyan û kesayeta leşkerî ya xwediyê alê amaje dike. Zanayên siyaset, dîroknas, civaknas û ji bilî wan, dibînin ku al, çana di dem û cihine taybet de diyar dikin.[18] Lê di şeran de, al bi awayekî sereke ji bo hevrêziya hêzan di şerê leşkerî de tên bikaranîn. Al weke alavekê ji bo diyarkirina nasnameyê û cudakirina hevalan ji dijminan tê bikaranîn. Ji aliyekî din ve, ew sembola serwerîyê di qada şer de ye. Ji ber wê jî dema ew liba bimîne, leşker di şer de berdewam dimînin, lê dema ew al dadikeve, ew tê wareta binkeftinê. Bi awayekî giştî, al sembola nasnameya komeke diyar e. di dema birêvebirina şoreşê de, Kawa kirasê xwe weke al li ba kir. Ew jî dihat wateya ku ew ê şoreşê bi rê ve bibe. Bi vî awayî wî karîbû kurdan di bin ala xwe de kom bike û bi dadana agirekî mezin, serkeftina xwe ragihand. Ev yek jî tê wateya ku Kawa şervanek û pilansazekî leşkerî ye. Heya weke niha jî hê

---

[14] Wekîpîdya, ferhenivîsa azad, Thor (Mîtyolojîk).

[15] Malpera Cîhana zanînê, Vaykîng kî ne? bê dîroka weşanê, lînk: https://knowledge0world.blogspot.com/2012/12/blog-post_9.html

[16] dibe ku ev peyv hatibe bikaranîn ji ber ku mirovê seretayî bi dawîbûna serdema qeşayê re ku ji başûr ber bi bakur ve diçû, berê xwe dida bakur. Mirov dida pey nêçîrên xwe. Jixwe bi helîna berfê re, xakên nû dihatin dîtin. Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku peyva Nord dema mirov bi lêv bike, dişibe peyva kurdî Nû Erd.

[17] Beşa pêşîn a navê mar (Cor/Gor) ejdehayê somerî Gor (xwedawendê cîhana jêrîn û yê mirin û tarîtiyê) tîne bîra me. Jixwe gor di kurdî de tê wateya cihê veşartina kesê mirî.

[18] [18] Encyclopaedia Britannica; Flags and Anthems of the World; Link: https://www.britannica.com/topic/Flags-and-Anthems-of-the-World-1694666

alên kurdî, cil û bergên kurdan dinimînin. Ev yek di cilên folklorî yên kurdî de baş diyar e, bi taybet di dema Cejna Newrozê de ku tê de agir tê dadan. Her wiha cilên kurdî di cejnên kurdî yên din de. Libakirina kiras, tê wateya şikandina tirsê û tê wateya ku gelê nasnameya wî çewisandiye, rabûye şoreşê da ku nasnameya xwe vegerîne. Ji ber ku pirs xizmên kurdan in, wan –weke ku me berî niha aniye ziman- saman, ol û çanda bapîrên kurdan ên medî desteser kir û ew al ji xwe re kirin al û navê wî kirin ``Dîrafş Kawyanî`` [19] û ew ji xwe re kirin, semboleke neteweyî. Hin çavkaniyên dîrokî amaje dikin ku xweragirtina leşketan ji medan birine ku ew medî bi şer û mêraniya xwe navdar bûn. Îcar, kesayeta Kawayê Hesinkar, amaje bi wî fermandarî dike ku wî kurdên çiya kirin yek û ew di şoreşeke mezin de li dijî padîşahê zordar bi rê kurd bi rê ve birin. Ew padîşahê zordar weke hovekî bû ku li ser her du milên  wî mar hebûn. Kesayeta fermandarê medî yê navdar ``Kiyaxsar`` û şoreşa wî ya li dijî impiratorê asoriyan ku xwedawend pê re hebûn û li ser milê wan xwedawendan mar hebûn an jî serî hebûn  an jî tiştine din, heya asteke mezin nêzî kesayeta Kawayê Hesinkar û şoreşa wî ye.  Ev jî tê wateya ristina efsaneyê di wê serdemê de (nêzî 612 b,z) bi dirûvê wê yê niha. Serdema ku tê de şoreşa medî li hemberî padîşahê asûrî bi ser ket û geşbûna serdema hesinî û belavbûna ola zerdeştî bi awayekî berferehtir ku bi rê wê ji nû ve nakokiya di navbera şer û xêrê de hat dariştin û bi rêya wê serdema koletiyê bi dawî bû û civakên Kurdistana kevn bi navê medan bûn yek. Hin çavkanî dibêjin ku di sedsalên 7 û 6 ên berî zayînê de, welatên medan bûn jêdera belavbûna têgihiştina olî û felsefeyî. Di wê demê de du gelên arî li rex hev dijîn ku ew jî medî û pirs bûn ku her du niha bi gelê kurd û parisî di serdema nûjen de tên nimandin.

## 4. Xwespartina bindestan li çiyayan û sembola çiyayan di çanda kurdî de:

Di dema vegera nêzî 10 hezar çekdarê yûnanî bi serkêşiya Zênofon (400-401 bz), ew navê gelê kardok/kardox tîne ziman. Ev gel li Çiyayên Kardox ê ku Çiyayê Cûdî jî dihewîne, bi cih bûn.[20]Ereb jî di destpêka serdema islamî de,

[19] Mihemed Sibhî Hecar, Artêş û hunerên şer li ba pirsan, malpera berevaniya niştumanî ya libnanî – hemar 76, nîsan 2011. Lînk:https://www.lebarmy.gov.lb/ar/content/

[20] Mihemed emîn Zekî bek, puxteya dîroka kurd û kurdistanê, ji demên herî kevin û heya niha, wergêr Mihemed Elî Ewnî, çapa duyem, 2005, weşanxaneya karûbarên çandî yên giştî li Bexdayê, r101

ji kurdên ku li çiyayan dijîn re bekirda digotin[21], ji ber wê jî navê Amed kirin Diyarbekir. Jixwe asoriyan ji xaka medan re digotin Amed.[22] Ev navlêkirina ereban (DiyarBekirda) wate Diyarbekir, ji gotina ku dibêje ew li êla Bekir a erebî vedigere xurttir e, çimkî rêjeya ereban li gor kurd û ermenan, pir kêm bû. Gelek asorî û suryanî navê mala beqirdaya/bekirdaya li cihên çiyayî yên ku kurd lê dijîn dikirin. Hebûna pêşiyên kurdan bi her du rêzeçiyayên mezin (Zagros û Toros ve hatiye girêdan). Jixwe ji kombûna herduyan re Çiyayên Ararat/Agirî tê gotin ku berê li bakurê Kurdistanê ew agirpij bû.[23] Dibe ku çiyayên Zagrosê bin ên ku kurdên bindest berê xwe danê; çimkî ew sînorê bakurê rojhilat ê şaristaniya somerî û şaristaniyên di pey re pêk tîne. Avesta dide diyarkirin ku piştî êrîşa Ahrîman li ser erdê, çiya hatin çêkirin.[24] Her wiha efsaneyên tofanê yên li Kevana Berhemdar amaje dikin ku kesên ji tofanê rizgar bûn cihê xwe di çiyayan de girtin û ji wir careke din belav bûn. Ji van gotinên borî û li gor nerînên çandên wan serdeman, em digihêjin wê encamê ku afirandina mirovan li çiyayên Kurdistanê yên kevin ji nû ve pêk hat.[25] Çiya weke penageh û parêzgeheke xwezayî tên hesibandin ku mirov dikare li hemberî gelek metirsiyan xwe di wan de biparêze. Çiya weke cihekî stratejîk di gelek serdeman de hatiye dîtin. Jixwe têkiliyeke xurt di navbera kurd û çiyayan de heye. Ew têkilî ewqasî xurt e ku lêkoler Basîl Nêktîn bibêje ku mirovê kurd û çiya cêwî ne. Heta ku dema kurd koçber dibin, bi awayekî zikmakî berê xwe didin çiya û giran. Weke mînak, kurdên ku koçî Şamê kirin, berê xwe dan Çiyayê Qasiyûn û li wir bi cih bûn û tê de taxek bi navê Zorava ava kirin. Her wiha kurdên ku koçî Libnanê jî kirin li Çiyayê Şofê û yê Libnanê bi cih bûn. Kurdên bakur û rojhilatê Sûriyeyê jî cihê xwe li ser deverên bilin û giran ava kirine. Çiya xwedî taybetmendiyeke sembolîk in, çimkî tê bawerkirin ku ew cihê xwedawendan e. li gor baweriya sometan, xwedawend berî ku mirovan biafirînin, li cihekî pîroz diman ku ew jî çiyayê

---

[21] Heman jêdera navborî, r102

[22] Mihemed emîn Zekî bek, puxteya dîroka kurdan… wergêr Mihemed Elî Ewnî, çapa duyem, 2005, weşanxaneya karûbarên çandî yên giştî li Bexdayê, r135

[23] Ji agaiyên zêdetir li Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl vegere, Şahsamana Mediya, çapa yekem 2011, weşanxaneya Saziya Mokiryanî ya lêkolîn û weşanê, Hewlêr.

[24] Dr. Xelîl Ebdilrehman, Avesta, Pirtûka pîroz a zerdeştiyan, çapa duyem 2008, weşanger: Rewafid a çand û hunerê, şam, r802.

[25] Çiyayê Nêsîn ê nêzî bajarê Silêmaniyê di efsaneya babilî-somerî de. Çiyayê Araratê di Tewratê de,. Çiyayê Cûdî di Quranê de. Çiyayên Zagrosê (mediya) di Avêstayê de û Çiyayê Şingalê di Laleşa êzîdiyan de.

pîroz bû ango Çiyayên Gerdûnê.[26] jixwe tê zanîn ku çiyayên bilind ên li ser tixûbê someran, Çiyayê Zagros in. Têkiliya di navbera pêşiyên kurdan û çiyayan de weke têkiliya dê û weled e. piraniya lêkolînan amaje dikin ku têkiliyeke xurt di navbera peyva kurd û têgihên ku li çiyayan dihat kirin de heye. Hemû jêder li hev dikin ku navê kurd li gelekî çiyayî yê leheng dihat kirin. Ev yek hemû êlên ku di xaknîgariya Kurdistanê de dijîn dihewîne ku bi hev re gelê kurd pêk anîne, dihewîne. Ev gel tev ji aliyê leşkerî û siyasî di bin ala medan de bûn yek. Efsaneya Laneta Akadê amaje dike ku xwedawend Enlîl kûtî (pêşiyên kurdan) ji çiyayê Kuwîn anîn: ``Xwedawend li aliyê Çiyayê Kuwîn nihêrî û li dor hemû rêzeçiyayên derveyîn geriya… Enlîl ew ji çiyayan anîn…``[27] Li gor lêkoler Cernût Fîlhilm:[28] ``Sêwirandina ku dibêje mirov ji keviran çêbûye, li gor efsaneya Elî Kumî û her wiha li çîrokeke netam a der barê ducaniya xwedawenda çiya Weşîta, li kevneşopiya Hûrî ya kevin vedigere. Hûriyan ew efsane ji herêmên xwe yên pêşîn li deverên çiyayê yên kurdî, veguhestin herêmê. Ji sêwirandinên tekûz ên ku em tu gumanan li dor wan nabînin di kultûra rojhilat a kevin de, babeta serwerên xwedawendan e ku ew ji samanên xwe hatine bidûrxistin û li vegerandina serweriya xwe digerin…

Gelek caran niştecihên Kurdistana kevn dema rastî êrîşên dijmin an jî dagirkeriyê yan jî bobelatên xwezayîn dihatin, xwe li çiyayên bilind digirtin.[29] Çimkî dijmin û êrîşkaran nikarîbû hemû çiyayan bide ber xwe û niştecihên wê qir bike. Weke mînak, baweriya leşkerî ya asûrî dibêje gerek e dema deverek were dagirkirin, gerek e serê wan were jêkirin û xortên wan werin kuştin û şewitandin û hejmarek ji wan were dîlkirin da ku paşê bibin koleyên wan. Bi dehan deqên mîxî yên ku vê yekê tekez dikin hehe. Ji ber wê jî ramana xweparastina xortên nûhatî di çiyayan de, di dema hatina êrîşkaran de hebû. Yek ji deqên kevin amaje dike ku padîşahê asûrî (Asûr Nasir Apilîyê duyem) êrîşî welatê Nîrbo kir ku tê de Çiyayaê Birados li başûrê Kurdistanê heye ku

[26] Dîwana Efsaneyan, somer, akad û asûr. Pirtûka duyem a xwedawend û mirovan, werger; Qasim el- Şewaf, pêşkêşkirin: Adonîs, bê çap û weşanger, r83.
[27] Rafide Ebdela Ebdisemed Daxî, Kurdistana Iraqê di dîroka kev de li gor jêderên mîxî yên sedsala sêyem a berî zayînê heya 612 berî zayînê, seta derçûna doktoriyê di dîroka kevn de li zanîngeha Silêmaniyê, Fakulteya zanistên mirovahî, beşa dîrokê, 2008 r51
[28] Cirnot Fîlhilm, Hûrîm, Dîroka wan û şaristaniya wan, werger; Dr. Farûq Ismaîl, çapa yekem 2000, weşanxaneya Cedel, Heleb r115.
[29] Rafide Ebdela Ebdisemedê qeredaxî, Kurdistana Iraqê di dîroka kevn de li gor jêderên mîxî ji sedsala sêyem a berî zayînê û heya 612 bz/ seta bidesxistina doktoriyê di dîroja kev de ji zanîngeha Silêmaniyê/beşa dîrokê 2008, r110.

ev dever li ser sînorê Nînewa (paytexta asûriyan) ye. Sedema êrîşê jî serhildana wî bajarî li dijî wî bû:[30] ``… wan berê xwe neda min û li ber lingê min xwe neçemandin. Piştî dorpêçî û şer, bajar hat êrîşkirin û şûr 3000 şervanên wan nêçîr kirin û dîl, ga û sewal ji wan hat birin û gelek dîlên wan hatin şewitandin û gelek şervan hatin dîlgirtin û dest û pêyên hinan ji wan hatin qutkirin û guh û pozên hinên din jî hat birîn û çavên gelekan hatin derxistin û paşê komek ji laşan û yeke din ji pozan hetin çêkirin. Her wiha serê wan bi darên derdora bajêr ve hatin daleqandin û ciwanên nûhatî hatin şewitandin û bajar bi erdê ce hat pirçiqandin. Bajarên welatên Nîrbo hatin rûxandin û sûrên wan ên qayîm hatin hilweşandin…`` ji ber wê jî em dikarin bibêjin ku ramana xwegirtina li çiyayan û xwejinûve birêxistinkirin û paşê careke din şerê dijmin kirin, her tim di şerên berevaniya di ber hebûnê de li ba pêşiyên kurdan hebû.

Xuya ye girêdaneke xurt di navbera çiyayên Zagrosê û Newrozê de heye, çimkî her du sembola roja nû ne. dema em navê Zagrosê dahurînin em ê bibînin ku ji van beşan pêk tê: za (zayîn), gi (navê genim di kurdiya kevin de)[31] ro (hetaf ango roj di kurdî de) û tîpa ``s`` weke qertafeke paşgir e ku ixrîqiyan bi dawiya peyvan ve dikir.[32] Ew jî tê wateya zayîna roj û genim. Çimkî qontarên çiyayê Zagrosê şoreşa çandiniyê hewand. Ango ew tê watea hilata rojê ji pey lutkeyên bilind ango rohilatbûn, nexasim ku rêzeçiyayên wê li rojhilatê xaknîgariya Kurdistanê cih digirin. Ji aliyekî din ve, artêşên kurdî yên medî li çiyayên Zagrosê bi rêxistin bûne û ji wir berê xwe dana şerê impiratoriya asûrî. Aliyê rojava yên çiya hejmarek gorên kevirî yên mîrên mediyan dihewîne ku ew gor pîroz tên dîtin.[33] Ya ku balê dikişîne ew e ku navekî din ji çemê Diyala yên ku ji Kurdistanê derdikeve û di nav çiyayên Zagrosê de diherike. Ew nav jî Kawa Ro ye.[34] Ji aliyekî din ve, helîna berfa

---

[30] Rafide Ebdela Ebdisemedê qeredaxî, Kurdistana Iraqê di dîroka kevn de li gor jêderên mîxî ji sedsala sêyem a berî zayînê û heya 612 bz/ seta bidesxistina doktoriyê di dîroja kev de ji zanîngeha Silêmaniyê/beşa dîrokê 2008, r110.

[31] Nimêjên Golyamov, Ariyaya kevin û Kurdistana mayînde (kurd kevintirîn milet in), wergêr Ismaîl el-Hesaf, çapa yekem 2011, weşanxane: Saziya Lêkolîn û Weşanê ``Mûkiryanî``, Hewlêr r60.

[32] Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, şahsamana Mediya, çapa yekem 2011, weşanxane: Saziya Lêkolîn û Weşanê ``Mûkiryanî``, Hewlêr r33-81.

[33] Toma Biwa, Kurd, wergêr: Selah Irfan, weşanxane: Navenda Lêkolînên Kurdî (Kurdolojîk), Silêmaniyê 2010, bê hejmara çapê, r29.

[34] Basîl Nîktîn, Kurd, koka wan, dîroka wan û welatê wan…, Edîtorî û redekte û pêşkêşkirin: Selah Biwarî, weşanxane: Kovara Aso ya çandê. Bê hejmara çapê û dîrokê, r78.

çiyayên Kurdistanê ku dibe sedema bilindbûna rêjeya ava çemên Dicle û Firatê di werzê biharê de û bikaranîna wê avê bi rêya kuneke ku di sûrên Nînewa de hatiye, hişt ku şoreş bi ser bikeve. Van tevan hişt ku kurd bigihêjin wê baweriyê ku çiya cihê lehengan e ku ew ji zordariyê rizgar kirine û bi saya wan gelê kurd ji nû ve vejiyaye. Di serdema nûjen de, çiya mîna sûr û parêzgehekê ji bo kurd û şoreşên wan ên li dijî zordaran in

**5. Sembola pîrozbûna agir di efsaneyê de:**

Piştî zêdebûna hejmara xortan di çiyayan de û zêdebûna nerazîbûna niştecihan ji ber zilm û zora Ezdehak, Kawayê hesinkar ev xort bi çek kirin û bi rêxistin kirin û agirekî mezin dada da ku êrîşî cihê padîşahê bilind bike ku zuqûratê bi bîra me tîne. Di encamê de şoreşeke giştî dest pê dike û hêzên Ezdehak têk dibin. Piştî ku Kawa bi rêya çakûçê xwe Ezdehak kuşt ku li serê wî da, careke din agirekî mezin weke nîşaneya serkeftina şoreşê dadide. Ev yek êrîşa keleha Nînewa bi agir ji hêla mediyan ve û kuştina padîşahê asûrî tîne bîra me.

Dadana agir weke ragihandina şoreşê û piştî kuştina padîşahê zordar, tê wateya dirûvê giyanî yê vê şoreşê. Agir xwedî cihekî pîroz e di olên kevin de, bi taybet li ba gelên arî ku xuya ye navê wî ji agir hatiye dariştin. Çimkî hemwateya agir, ar e. perestgehên zerdeştî her tim agir di wan de heye û ew weke kurdê xwedawend Ahoramazda tê dîtin. Tê zanîn ku ola zerdeştî berdewaniya ola arî ya kevin e ku jê re ola mezdî dihat gotin.[35] Zerdeştî wisa dixuye ku ew yek ji mezhebên wê ye.[36] Jixwe li gor nerîna fîlozofên kevin agir, li gel av, ba û axê, koka gerdûn û afirandina mirovan e. Dibe ku zehmet be ku em vê yekê ji aliyê wateya peyvê ve fêm bikin, lê em dikarin nîşaneyên wê yên sembolîk bipelînin. Eger ne ji baweriyên derdora wan her çar hêmanan be, dê çanên mirovî bi pêş neketa û şaristanî û destan dê pêk nehatana. Ji hezarên salan ve û berî derketina olên kurdî yên kevin jî, agir li ba kurdan pîroz bû. Kurdistana kevin serdema kevirî ya kevin dît ku tê de karînên mirovan bi pêş ketin û mirovê biaqil derket holê ku karîbû hin dîyardeyên xwezayî ji bo xizmeta xwe bi kar anîn. Jixwe agir bi roleke mezin di pêşketina

[35] Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, şahsamana Mediya, çapa yekem 2011, weşanxane: Saziya Lêkolîn û Weşanê ``Mûkiryanî``, Hewlêr r192

[36] Artir Kirîstinsin, Îran di serdema sasaniyan de, wergêr: Yehya Xeşab, weşanxane: El-Nehda el- Erebiye ya çap û weşanê, Beyrût, bê hejmara çapê, r19.

binyata mirov û têkiliyên wî yên civakî de lîst û bi rêya wê ji xwarina xav berê xwe da xwarina kelandî ku helandina wê hêsan dibe. Pehtina xwarinê enerjiyeke zêdetir da miorv ku hişt qebareya pergala helandinê û dev biçûk bibe û bandor li hêza argûçkan û şêweyê diranan û ajbûna mejî di hezarên salan de kir. Mirovê seretayî dît ku xwarina pehtî ji ya xav biçêjtir e û bi rêya tama goştê lawirên ku di nav agirê daristanan de hatibûn biraşin, ev yek hîz kir. Ji aliyekî din ve agir kesên dixwestin xwe germ bikin û yên ku ronahî di şevên tarî de dixwestin, li dor xwe kom kirin. Xuya ye teqîna agirpijan û birûsk û dadana jixweber a madeyên organîk û xazan an jî petrola ku ji bin erdê derdikevin, hişt ku mirov bigihêje wê baweriyê ku agir encama hêzeke gewre ya veşartî ye ku bi awayê mîtolojiyayê hat şîrovekirin. Nexasim ji ber ku agirê ku ew jêdera germahî û ronahiyê ye, hişt ku mirov bêtir bi tarîtiyê re bigunce. Agir bi bîrdanka mirovahiyê ve weke jêdera ewlehî û geşbîniyê û carinan hilweşînê jî hat girêdan. Ji ber wê gel agir pîroz dibînin. Her wiha agir di çêkirina cêran û kanzayan û çêkirina alavên kanzayî de jî girîng e, lê di heman demê de, bandorên wê yên hilweşîner jî nayên veşartin, dema ji bin kontrolê derkeve.

Agir li ba civaka kurdî ya çiyayî ku zvistana wê dirêj û sar bû, pir girîng bû. Li çiyayan her tim pêwîstî bi germahî, ronahî û xweparastinê heye. Di zimanê kurdî de, ar tê wateya agir û arî jî tê wateya xweliya agir; jê jî navê hin bajarên kevin hatiye dariştin, her wekî Ur (ev nav lê hatiye kirin ji ber ku peykerên agir tê de hebûn).[37] Paşê ew bû sembola ku bajaran diyar dike. Hin jêderên din dibêjin ku peyva Ur di somerî de tê wateya bajar. Kurdan ev peyv li ba xwe hiştin û ew derbasî dariştina navên bakar û gundên xwe kirin; her wekî Ûrmiye, Orme, Orfe û Oremariî û ji bilî wan. Zerdeşt agirê pîroz weke sembola dadmenî û têkoşîna li dijî hêzên şer hesiband.[38] Di Avistayê de gelekî behsa agrê pîroz hatiye kirin.

Ixrîqan ji betrolê re zeyta medî digotin.[39] Artêşa medî bi çekê xwe yê ku bi navê agirê medî dihat binavkirin, dihat naskirin.[40] Paşê navê wê bû agirê ixrîqî. Wan serê tîrên xwe bi zeyta medî şil dikirin û dema diavêtin armaca

[37] Ji bo agahiyên zêdetir, Cemîl Nexle el-midewir, dîroka Babil û Asûrê
[38] Toma Biwa, kurd, wergêr: Selah Irfan, weşanger, Saziya Hindawî ya fêrkirin û weşanê, Qahîre, bê hejmara çapê, r28.
[39] Heman jêdera borî, r198
[40] Heman jêdera borî, r28

xwe, agir pê diket. Xuya ye ku ev yek sedena hêza leşkerî ya medî bû ku artêşa padîşahê asûrî têk bir piştî ku agir bi ser wan de barandin.

Dibe ku sedema pîrozdîtina agir li ba kurdan ve ji serdema niylotîk ve bi wan re maye. Di destpêka sedsala şeşem a berî zayînê de, gundên çandiniyê li qontarên çiyayên Torosê geş bûn, weke mînak, veşartina miriyan li rex agirdankên mezin çêdibû.[41] Kurd agirdankan weke tiştekî pîroz dibînin.[42] Her wiha dadana agir di bedena xwe de ji hêla hin kurdan ve, sembola şoreşa li dijî zordariyê ye. Heya niha hê kurd agir pîroz dibînin û wê roja berî Newrozê pê dixin û heya ji wan tê wê pêxistî dihêlin.

Ji tiştên borî  bi rêya şîroveya giştî ya hêmanên efsaneyê, em tê digihêjin ku Cejna Newrozê ne tenê rê û resmek e, lê belê bi rêya wê kurd şoreş û çanda xwe derdibirînin ku wan ji hezarên salan ve li hemberî dagirker û zordaran li ber xwe daye û li hemberî koletiyê serî hildan. Gelê kurd, statû û çanda xwe parast û her tim tijd bû ku azadiya xwe bi dest bixe (temen çi be bila ew be). Gelê kurd koletî û desthilatiyê li ser kurd û gelên din napejirîne, lê belê ew jiyana hevbeş li gel her kesê azadîxwaz re dipejirîne. Tevî ku baweriyên kurdan cihêreng in û aliyên wan ên siyasî û aborî ne weke hev in, lê ew her tim agirê Newrozê dadide û hesên hevbeş di navbera wan de hene. Ev yek jî girêdaneke manewî ya herî bihêz e ku dikare hemû kurdan çi li Kurdistanê çi li derveyî wê kom bike.

## Newroz di serdema nû de:

### Newroz di çand û kultûra rojhilatî de:

Diyardeya hênikbûna biharê, bê guman, bala piraniya gelên cîhanê kişandiye, heta ku hin wê weke cejneke werzî ango mûsimî dibînin  û kirasekî mîtyolojîk ên pîroz lê dikin. Weke mînak, someriyan jê re digot ``zag-mug`` ku tê wateya jidayîkbûn an jî zaynê. Ev yek heya niha di kurdî de heye.[43] Cejna newrozê êdî bû xwedî cihekî bala di cîhana rojhilatî de. Bi dehan gelên ku li

[41] Mirşid Yûsif, Domozî (Tawûsê Melek), lêkolînek der barê koka ola kurdî ya kevn de, çapa yekem, 1999, bê weşanger, r21.
[42] Toma Biwa, kurd, wergêr: Selah Irfan, weşanger: Navenda Lêkolînên kurdî (Kurdolojîk) Silêmaniyê, herêma Kurdistanê, 2010, r133.
[43] Dr. Mihdî Kakaye, dirêjbûna Cejna Newrozê di kûrahiya dîroka kurdî de, malpera diyaloga nûjen/ hejmar: 4750, 16. 3. 2015. Lînk:
https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=459689

xaknîgariya di navbera sînorê Çîn û Çemê Nîl de dijîn, vê cejnê pîroz dikin; her yek li gor çand û çîroka xwe. Newroza kurdî tenê ye ku tê wateya şoreşa li dijî zordaiyê û damezirandina gelê kurd. Îcar ev cejin ne tenê cejneke mûsimî ye, weke ku hin kes dibêjin, lê belê ew sembola şoreşa li dijî zordarî û koletiyê ye.

Ji ber girîngiya Newrozê di çanda rojhilatî de, Komeleya Giştî ya NY projeya biryara hejmar 64 da ku di dewra 64 a benda 49 a lîsteya kar –çandaa aştiyê de hat pêşkêşkirin.[44] di destpêka sala 2010an de van dewletan Azerbîcan, Avganistan, Îran, Tirkumenistan, Tirkiye, Tacîkistan, Qîrgîzistan û Kazexistanê daxwaza ragihandina roja 21ê Adarê weke roja cîhanî ya Newrozê û weke cejneke niştumanî ji van dewletan re kir. Projeya biryarê da diyarkirin ku zêdeyî 300 melyon kesî li derdora cîhanê roja Newrozê pîroz dikin. Ew roj roja biharê ye û weke destpêka sala nû tê hesibandin. Ji zêdeyî 3000 salî li Asyaya navîn, Belqan, Gola Deryaya Reş, Rojhilata Navîn, Qoqaz û gelek deverên din Newroz tê pîrozkirin. Di encamê de roja 21ê Adarê weke Cejna Newrozê ya cîhanî hat hesibandin ku tê de roj û şev dibin yek û sala nû ji bo gelên cûr bi cûr tê destpêkirin

Di maseya reşemiya 2010an de, UNCO biryar da ku Cejna Newrozê jî bikeve lîsteya nimûneyî ya kultûra çandî ya ne madî ya mirovahiyê. Her wiha di roja 21ê Adarê de weke roja Newrozê ya navneteweyî hat danpêdan. [45]

Her dewletek bi rêbazê xwe û li gor çîroka xwe ya taybet, Newrozê pîroz dike û weke cejneke neteweyî dibîne. Weke nimûne, tirk wê pîroz dikin çimkî ew dibêjin ku di wê rojê de tirk ji geliya Erîgînkon rizgar bûn. Berî wê bi dehên salan tirk di wê geliyên de asê mabûn. Li gor efsaneyê, dema tirk li hemberî dijminên xwe bi bin ketin, neçar man berê xwe bidin çiyayan. Ji ber ku wan rêya xwe şaş kir di geliyê de asê man. Ev gel di wê newalê de man heya ku gurekî ango keriyekî guran rê da pêşiya wan û berê wan da dîwarekî kanzayî ku ber bi cîhana derveyî newalê ve diçe. Piştî ku wan bi rêya agirekî gewre ew dîwarê kanzayî heland, ji wê newalê rizgar bûn û ji nû ve vegeriyan dîrokê.

---

[44] dewra 64, benda 49 a lîsteya karên Komeleya Giştî ya NY - Çanda giştî

[45] Newroz, Wîkîpîdya.

Roja ku ew rizgar bûn, roja destpêkirina buharê bû, loma ew wê rojê pîroz dikin.[46]

Tevî wê jî damezrînerê dewleta neteweyî ya nûjen ``Atatork`` ev roj weke cejneke fermî nepejirand. Lê belê wî kurd weke tirkên çiyayan bi nav kirin û hikûmetên tirkî ahengên kurdî yên ji bo Newrozê çewisandin. Ew jî bi rêya zordarî û bikaranîna guleyan û girtina kurdan û kuştina wan. Ji bo ku Yekîtiya Ewropayê razî bike û hinekî li hemberî fişara gelêrî ya kurdî xwe şahîk bike û dengan di hilbijartinan de bi dest bixe, AKPê bi serpereştiya Erdogan di sala 2005an de danpêdan bi Cejna Newrozê kir û hin rewşenbîrên tirakn ev efsaneya tirkî belav kirin da ku bibe hincet ji bo pîrozkirina vê rojê. [47]

Pirs jî dibînin ku Cejna Newrozê, sersala parisî ye ku dikeve roja destpêkirina biharê (21ê adarê). Newroz, yekem roj e di meha firordîn di salnameya hetafî ya îranî de ku ew jî bi biharê dest pê dike. Wateya Newrozê jî di zimanê parisî û kurdî de, tê wateya roja nû. Ev cejin a neteweyî ya herî mezin e li ba îraniyan lê ew bi kirasekî parisî wê pîroz dikin. Ferdosî Bavê Qasim di pirtûka xwe ya bi navê Şahname de çîroka Newrozê wisa vedibêje: ``Tê gotin ku padîşahê parisî ``Cem`` li dunyayê digeriya. Dema ew gihaşt Azerbîcanê ferman de ku erşê wî li wir were avakirin. Dema ew li ser erşê xwe rûnişt, roj hilat û ronahiya wê li ser tac û erşê wî belav bû û milet kêfxweş bû û got: Ev rojeke nû ye. Ji ber ku ji tîrêjê re di zimanê pehlewî şîd tê gotin, ev peyv li navê padîşah zêde bû û navê wî bû Cemşîd. Tê gotin ku ji ber vê sedemê ev roj tê pîrozkirin. Di çîrokeke din de tê gotin ku padîşah Cemşîd karîbû mirovahiyê ji werzê zivistanê rizgar bike ku wê zivistanê dê hemû jîndar bidana ber xwe û ew ji nav bibirina. Cemşîd erşekî bi elmasan xemilandî ava kir, paşê cinan ew eriş hilda esimanan û li wir Cemşîd weke hetafê li ser erişê xwe rûnişt û hemû jîndar li dor wî kom bûn. Ji ber wê navê vê rojê kirin Newroz.``[48] Ji xwe em dibînin ku ev çîrok ne weke efsaneya Kawayê Hesinkar e. hin jî vê efsaneyê diguherînin û dibêjin ku Dehak

[46] Prof. Dr. Necati DEMİR; TÜRKLÜĞÜN EN ESKİ BAYRAMI NEVRUZ VE TARİHÎ ALT YAPISI ; bê hejmara weşanê ; Link: http://www.necatidemir.net/images/demir/bkosem/nevruz.pdf

[47] Wela Xidêr, Cejna Newrozê li ba kurdan… sembola serkeftin û rizgariyê û destpêkirina biharê. Di dîroka 21ê adara 2016an de hatiye weşandin, malpera Tik peres, lînk: https://www.turkpress.co/node/19845

[48] Newroz, Wîkîpîdya.

padîşahê medî yê dawî ye û jê re Estiyak kurê Kîxisro dihat gotin. Her wiha ew dibêjin ku Kawa, Koriş e (damezrînerê dewleta parisî û kurê rêveberê parisî Qembîrê yekem û Mandana keça Estînak e).[49] Jixwe tê zanîn ku cudahiyeke mezin di navbera her du kesayetan de heye. Nexasim ku Koriş li ser destê şivanekî xizan xwedî bûye û serketina wî li ser mediyan piştî xiyaneta fermandarê medî Harpak bû. Ji aliyekî din ve Estînak xwe nedikir xwedawend û xort nedikuştin û ew di koşka xwe de nehat kuştin lê belê hat dîlgirtin. Çîrokeke parisî ya din dibêje ku  hepeyman di navbera Ferîdûn û Kawa de hat çêkirin û piştî ku Kawa Dehak kuşt, hukm teslîmî Ferîdûn kir. Lê xuya ye ku ev çîrok bi hevpeymana padîşahê medî Kîxisro û yê babilî bandor bûye ku her duyan ji bo şoreşa li dijî padîşahê asûrî li hev kir. Li gor vê çîrokê, Kawa Dehak kuşt û hukm radestî Ferîdûn kir û Kîxisro padîşahê asûrî kuşt û mîrata asûriyan radestî babiliyan kir.

Di serdema padîşah Korişê mezin (neviyê padîşahê medî Estînak ji aliyê dêya wî ve), di sala 538bz de hat erêkirin ku Cejna Newrozê weke cejneke niştumanî were pîrozkirin . di serdema padîşah Daryosê yekem de, roja Newrozê I Pir Polîs (paytexta pirsan wê demê) hat pîrozkirin, lê kirasekî parisî lê hat kirin.[50]Tevî girêdanên dîrokî û çandî yên xurt di navbera kurd û pirsan de, hin şofînîzmên pirs li ser nijadperestiya der barê çanda xwe de û mandelekirina çanda kurdî rijd in; tevî ku pêşiyên kurdan berî hatina pirsan bi hezarên salan li Kurdistana kevin bi cih bûbûn. Deqên mîxî yên padîşahên asûrî didin diyarkirin ku  hebûna êlên parisî li herêmê cedigere sedsaka nehem û heştem a berî zayînê.

Her wiha lêkolîner Selewat Golyamov[51] amaje dike ku  cihûyên ku ji Babil û Aûr û Nînewa hatin dîlgirtin, Cejna Bîrim ji Cejna kurdî ya medî Newrozê wergirtine. Her wiha gelên din jî hin çîrokên wan ên weke vê hene û li ser wî esasî vê rojê pîroz dikin. Em ji tişta borî tê digihêjin ku hemû gelên ku vê rojê pîroz dikin, ew weke destpêka sala nû dîtine.

---

[49] Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, şahsamana Mediya, çapa yekem 2011, weşanxane: Saziya Lêkolîn û Weşanê ``Mûkiryanî``, Hewlêr r80
[50] Heman jêdera borî.
[51] Selewat Golyamov, Ariya kevin û Kurdistana mayînde (kurd ji kevintirîn gel in) wergêr: Dr. Ismaîl Hesaf, çapa yekem 2011, weşanger: Saziya Lêkolîn û Weşanê (Mokiryanî) r292.

Xuya ye hin kurd di hin serdeman de, nema rojan Newrozê pîroz kirine, sedemên wê gelek in, weke mînak, ji bo ku derfeta pîrozkirina vê rojê bidin kurdan, gelek xelat û bacên ku gerek e bidin padîşahan li ser kurdan dihatin sepandin. Nexasim piştî ku ew weke cejneke fermî di hin impiratoriyan de hat pejirandin, her wekî impiratoriya ixmînî (331-559 bz), eşkanî (226-250bz) sasanî (226-640bz) wan ew kir cejneke parisî. Ji ber ku wan nikarîbû vê cejnê qedexe bikin, umewî û ebasiyan jî ev rêbazê bacan bi kar anî. Êdî Newroz bû xwedî baceke taybet ku ji bo desthilat û serdestan dihat dayîn. [52]Ji aliyekî din ve, hin oldaran ev roj heram kir û hin kurdan ev yek pejirand. Tevî wê jî Newroza kurdî hê berdewam e û piraniya kurdan dev jê bernedaye û wê bi rêbazê xwe pîroz dikin. Efserê ingilîzî Morpîr[53] dibêje ku di sedsala 19em de di 1812 de, kurdan li çiyayê Hemawendê bi boneya rizgariya ji padîşahê zordar Ezdehak Cejna Newrozê pîroz kir. Tevî ku heya niha tu şûnwar nehatine dîtin ku efsaneya Newrozê biçesipînin, lê adet, hest, sembol û rêûresmên ku temenê wan digihêje hezarên salan, xwedî gelek wate ye û xwe weke rastiyeke bêguman dide pêş. Ew beşekî jêneger ê kultûra çanda kurdî ye. Pir bisûd e ku payebilindên siyasî çandî yên kurdî bi pêvajoyekê rabin da ku cîhanê bi Newrozê bidin danasîn û hewil bidin biryareke neteweyî derxin ku Cejna Newrozê cejneke neteweyî ya gelê kurd e û ew li ser reseniya gelê kurd di saziyên navneteweyî de tekez dike, da ku derewên nijadperestan red bikin ku pêşiyên wan ji deverên dûr hatin herêmê. Çimkî ev nijadperes dibêjin ku kurd ne ji herêmê ne û ew koçberî wê bûne. Lêkoler Arşak Safrastiyan rewşa kurdan di serdema nû de wisa pênase dike:[54] ``…Di nîva kevin a zemînê de, kesek rastî zordariyê bi awayekî berdewam nehatiye û şaş hatiye fêmikirin, weke kurdan. Ji destpêka dîrokê ve, dibe ku tu gelên ku li herêmeke xaknîgarî ya diyar dijîn, nebûne qurbanên nihtên pîs û şaş weke gelê kurd…``

**Newroza kurdî di serdema niha de:**

Êş û azarên ku kurd di meha adarê de rastî wan hatine, neyê wê wateyê ku ev miha miheke reş e. gerek e em cudahiyê bixin di navbera roja 21ê adarê

---

[52] M. Dr. Ferset Meriî, Newroz di şaristaniya islamî de, dîroka weşanê 4ê îlona 2019, malpera kovara Hîwarê, Lînk:
http://alhiwarmagazine.blogspot.com/2019/07/blog-post_48.html

[53] [53] Selewat Golyamov, Ariya kevin û Kurdistana mayînde (kurd ji kevintirîn gel in) wergêr: Dr. Ismaîl Hesaf, çapa yekem 2011, weşanger: Saziya Lêkolîn û Weşanê (Mokiryanî) r325.

[54] Arşak Safrastiyan, kurd û Kurdistan, wergêr: Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, çapa duyem 2008, weşanger: Serdem- Silêmaniyê/herêma Kurdistanê, r25

ku destpêka yekem meh ji sala kurdî ye û bûyerên ku berî vê dîrokê qewimîne ku di dawiya sala kurdî de qewimîne. Şaşîtiyek di nav kurdan de belav bûye ku meha adarê, meha Newrozê ye û li gor salnameya zayînê, yekem meha kurdî di 21ê nmeha avdarê dest pê dike û di 22yê nîsanê de bi dawî dibe[55] (jixwe ew jî dema em bibêjin ku her miheke kurdî ji sih rojî pêk tê). Me xwe sipart navê meha Newrozê çimkî ew xwedî bandoreke mezin e di çand û şoreşên kurdan de.

Ev meh li ba kurdan pîroz e û ew pê geşbîn in û tiştên xwe yên girîng dihêlin vê mehê. Di vê mehê de rêberê kurd Kiyaxsar li hember impiratorê asûrî di sala 612bz bi ser ket. Her wiha Ehmedê Xanî ew roj hilbijart da ku bibe roja dîdara Mem û Zînê di destana Mem û Zîn a navdar de. Her wiha biryar hatibû standin ku Şêx Seîdê Pîran di wê rojê de dest bi şoreşa xwe di 1925an de bike.  Her wiha danûstandinên aştiyê di navbera hikûmeta tirkî û PKKê de di Newroza 2013an de hat ragihandin. Ev yek bi dilê melyonan kurd bû lê rêjîma Erdogan ew paşê madele kir. Ji aliyekî din ve di Newroza 2019an de, serkeftina li hemberî Daişê hat ragihandin. Daiş weke Ezhakê serdemê dihat binavkirin ku bû sedema binpêkirin û komkujiyên pir dijwar li dijî kurdan, her wekî serjêkirin, êşkencekirin, revandina jinan, rûxandina malan û koçberkirina niştecihan.

Tevî wê jî meha Newrozê hejmarek bûyerên biêş hewandin. Dibe ku ev yek bi awayekî ji qestî ji hêla dijminên kurdan ve pêk hatibe da ku giyanê şoreşgerane di wan de vemirînin. Kurd bi êş bidarvekirina yekem serokê komara kurdî di serdema nû de bi bîr tînin ku ew ji hêla rêjîma Şah ve di 31ê avdara 1947an de hat bidarvekirin. Her wiha koçberiya melyonî ya kurdan ji başûrê Kurdistanê ji ber êrîşên hovane yên rêjîma Iraqê di 31ê adara 1991ê de pêk hat û qonaxa duyem a operasyona Enfalan a xwînê di 22yê adarê heya 30 adara 1988an de pêk hat[56]. Di sala 1992yan de jî zêdeyî 90 kurdî li ser destê hikûmeta tirkî di Newrozê de jiyana xwe ji dest da û gelek bûyerên din jî hene. Xuya ye ku kurd hilweşandina peykerê Kawayê Hesinkar li Efrînê ji hêla dagirkeran ve ji bîr nakin ku artêşa tirkî li gel çeteyên xwe di adara 2018an de êrîşî wê kirin.

---

[55] Her mehek ji her şeş mehên destpêkê yên sala kurdî, ji 31 rojê pêk tê û her şeş mehên dawî ji 30 rojî pêk tên, tenê meha sibatê 29 roj e.

[56] Operasyona Enfalan, ferhenga berfereh a zansitê.

**Rê û resmên pîrozkirina Newroza vê serdemê:**

Ji ber ku civakên kurdî ketin bin zordariya gelek çand û îdylojîkên olî û neteweyî, gelek rê û resmên Newrozê winda bûn û êdî ev roj tenê bûye weke geşteke malbatî ber bi xwezayê ve. Dibe ku parçebûnên îdyolojîk di tevgera siyasî ya kurdî de, xwe rolekê be di hêsankirina qirkirina çandî ya ku li dijî kurdan pêk tê. Tevî wê jî gelek welatparêzên kurd hewil didin ku xwe bi adet û kevneşopiyên Newrozê ve bigirin ku heya niha ew rê û resm di bîrdanka komî ya kurdî de parastî ne. dibe ku gelek jê nizanin ku ev amadebûnên ji bo Newrozê heya astekê dişibin, bûyerên ku di efsaneya Kawa de pêk hatine. Ev yek bûye adetek li ba gelek civakên kurdan. Wisa dixuye ku xweamadekirina ji Newrozê re heya astekê dişibe xweamadekirina ji şoreşekê re. dibe ku ev sedeme be ku rêjîmên zordar yên ku kurdan diçewisînin ji vê cejnê bitirsin û rê li ber lidarxistina wê bigirin an jî bi kêmanî wê biçûk bikin û rastiya wê biguhêrin. Li Rojava weke mînak mirov dikare bandora partîtiyê li rê û resmên Newrozê bibîne. Her partiyek alîgirên xwe li cihekî kom dike û hewil dide hestên gurbûyî di cejnê de di çarçoveya rêxistina xwe de bihelîne. Di heman demê de alîgirên wê jî pîrozkirina vê rojê di çarçoveya şewandina goşt, cilên bedew û diyarkirina jina kurd weke jineke nazik, romentîk û bêvîn û lawaz dimînin. Hinên din vê rojê dikin weke jêdereke sûdwergirtina bazirganî. Ev yek berovajî cewherê cejnê ye ku ew tê wateya şoreşa civakê li dijî zulmê, nexasim ku gelek civakên kurdî heya niha di bin zor û zilmê, dorpêçî û koçberiyê de ne û ew rastî komkujiyên pilankirî tê. Ji ber wê jî gerek e rêbazê pîrozkirina vê rojê bi awayekî be ku hestên mehû kurdan ên şoreşgerî gur bike ku kurd ji serdemên kevin ve bi vî giyanî navdar in û di heman demê de bi hemû kurdên li parçeyên din bijîn. Parastina nirxên manewî yên cejnê, beşek ji berxwedana li hemberî qirkirina çandî ye ku kurd bi giştî rastî tên û berdewamiya jiyana kurdî ye. Ya ku hêviya me xur dike, ew e ku kurd heya niha bi vê cejnê ve girêdayî ne tevî ku cudahî di rêbazê pîrozkirina wê de heye û tevî ku hin hewildan hene ku vê rojê biçewisînin ji aliyê rêjîmên zordar ve.

Bi awayekî giştî mirov dikare rêbazê pêşwazîkirina kurdan ji cejnê re bi vî awayî puxte bike (tevî ku gelek wateyên dîrokî yên van rê û resman nizanin: roja berî cejnê ku weke roja dawî ya sala kurdî tê pejirandin, kesê kurd xwe ji wê re vala dike û karên xwe radiwestînin û agir dadidin. Eger devereke

bilind hebe, kurd dixwazin wî agirî li cihê bilind dadin. Bi awayekî bêpilan her kes û di her temenî de li dor kom dibin û hin jê xwe di ser re çem dikin da ku xwe pak û tahir bikin, çimkî agir di çanda kurdan a kevin de pîroz bû; mîna ku dadana vî agirî weke ya Kawayê Hesinkar ji bo ragihandina şoreşê. Bi rêya lixwekirina cil û bergên kurdî û gotina hin srûdên neteweyî, hestên xwe yên neteweyî tînin ziman. Li hin herêman, weke başûrê Kurdistanê, Kawa û şehîdên kurdan li her çar parçeyên Kurdistanê tên bibîranîn û nahêlin kes agir vemirîne û hewil didn dadayî bimîne. Ji ber wê jî gelek rastî girtin an jî hatin kuştin ji ber ku li hemberî rêjîmên dixwestin agir vemirînin li ber xwe dane. Êvara Newrozê malbat xwe ji bo cejnê hazie dikin. Ew jî bi rêya amadekirina konên ku dê li geştîgehê werin vekirin; (ev tayebtmedî li Rojava heye). Her wiha xwarinên cihêreng amade dikin. Roja cejnê serê sibehê berê xwe didin xwezayê û bi rêya gotina ``Newroza we pîroz be`` cejnê li hev pîroz dikin. Di vê rojê de hestên şoreşgerî û neteweyî yên bilind li ba kurdan gur dibin. Di vê rojê de kurd ji rojên dîtir bêtir dibe bihêz û leheng li hemberî dezgehên ewlekariyê yên li dijî wî. Ev dezgeh jî êrîşî kurdan dikin û di encamê de gelek kurd li ser destê wan hatine şehîdkirin; çi bi rêya guleyan be, çi jî bi rêya pêlêkirina wan bi zerîpoşan be (her wekî Newroza Nisêbînê di sala 1992).[57] Di Newroza Qamişlo 2008an de, hejmarek ciwanên kurd şehîd bûn…gelek bûyerên din jî yên mîna van hene. Do serdema nû de têgihiştina çandî ya kurdan zêdtir bûye. Rewşenbîrên kurd amadekirina cijnê avêtiye ser milê xwe, ew jî bi rêya amadekirina cihê Newrozê û amadekirina ahengê bi awayê festîvalê ku tê de gotarên şreşegerane tên gotin. Her wiha şano tên pêşandan û stran û helbestên kurdî yên neteweyî tên pêşkêşkirin û sikêtşên folklora kurdî tên pêşandan da ku wateyên bala yên Newrozê û pêşiyên kurdan werin bibîranîn. Lê dibe ku ev yekê têrê neke da ku hestên şoreşgerî li ba kurdan werin afirandin. Nemaze ku geşbînî ji ber rewşa partîbûnê ku dixwaze cejnê bi partiyê ve girê bide, li ba wan hene. Van partiyan ew cejin di çarçoveyeke çandî û dîrokî de hiştiye ku dûrî rewşa reş e ku piraniya kurdan tê de dijîn. Hin hewildan hatin kirin ku ev yek were derbaskirin û nirxên manewî yên Newrozê weke şoreşeke li dijî zordariyê werin vejandin,

[57] Sedat Sûr; Şahidên komkujiya Nisêbînê: Ji Çemê Çax Çax xwîn diherikî; 20/3/2015; ANFnews; Link: https://anfkurdi.com/kurdistan/sahiden-komkujiya-nisebine-ji-ceme-cax-cax-xwin-diheriki-37389

çimkî pêwîstiya kurdan bi serkeftineke weke ya Kawa heye da ku kurd ji qeyd û bendan rizgar bibin û ji nû ve vejîn. Ev yek bi awayekî taybet li bakurê Kurdistanê ji hêla Tevgera Azadiya Kurdistanê ve pêk tê ku wê çakûç û agirê û sembolên mîna wan ji xwe re kirine sembol. Êdî ev cejin bûye mîna serhildaneke gelêrî li hember zordarên tirk. Gelek caran kadroyên tevgerê şeva Newrozê agir bi bedna xwe xistine. Mezlûm Dogan bûye xwediyê cihekî taybet li ba kurdan di vê babetê de. Her wiha bi rêya lidarxistina Kongira Neteweyî ya Kurdî (KNK), tevgerê hewil da kurdan bigihîne hev da ku bibe rêbazekî rizgarkirina kurdan ji zulm û zordariyê. Gotara rêberê kurd Ocelan di Newroza 2013an de, li bakurê Kurdistanê ku tê de behsa diyaloga kurdî-tirkî kiriye, xwedî bandoreke erênî ya berfereh li ba kurdan û tevgerên siyasî li tevahî Kurdistanê bû; çimkî ew mîna rêbaz û ramanên şoreşgerî yên kurdî yên kevin bû û Kawa û şiyarkirina hestên şoreşgerane li hemberî zordariyê bi bîra miletê kurd ê bindest anî. Vê yekê jî hestên kurdan bilind kirin. Dibe ku ev beradgîma xwedî rolekê di berdewamiya rêya şoreşgerî de be li ba gelek kurdan û baweriya şer a çalak a vê tevgerê zêdeyî 40 salî biparêze. Serkeftina kurdan li hemberî Daişê nimûneyekî diyar ê vê zihniyetê di dîroka me ya hemdem de ye.

Cejn û efsaneya wê, çîroka çêbûna gelê kurd dinimînin û çanda Kurdistanê ya resen û enerjiya berdwamkirina di jiyanê de dinimîne. Dema ew wê li dar bixin bêyî ku hemû rê û resmên wê yên borî pêk bînin, ev yek neheqî ye. Gerek e bi kêmanî li gor serdemê û doza civakên kurd li hemû Kurdistanê were guncavkirin. Bi rêya wê gerek e hewil bidin mafên rewa bistînin û vîna azad û rêveberiya xweser ji bo jiyaneke aştiyane di welat de werin pêkanîn.

Hin pêşinyar hene ji bo pêşxistina rê û resmên cejnê û mîna dîmenên efsaneyê bin; her wekî kombûna li nêz girekî yan jî cihekî bilind û pêşandana şanoyeke mîna efsaneyê ku lehenfên efsaneyê binimîne. Gere e ev şano salane were dubarekirin û ji salên borî bêtir. Her wiha gerek e meşek hebe ku rê de agir were hildan û srûda neteweyî ya kurdî were gotin û wêneyên şehîd û sembolên dîrokî werin hildan ku ew sembol şaristaniya pêşiyên kurdan ên medî, hûrî, mîtanî, kûtî û ji bilî wan dinimînin. Ji aliyekî din ve gerek e hin xelek ji bo rewşenbîr, hunermend û reqsa kurdî werin veqetandin û pêşangeh ji bo wênesazî û peykersaziyê were lidarxistin ku bûyerên cejnê û wateyên wê yên dîrokê binimînin. Her wiha gerek e pêşbirkeke çêkirina

xwarina kurdî hebe û xwarin tenê di çarçoveya xwarinên kurdî de be. Ji aliyekî din ve gerek e levhatin di navbera aliyên nelev de werin pêkanîn û diyarî di navbera wan de werin dan. Her wiha gerek e serdan di navbera partî û tevegerên siyasî yên kurdî de werin pêkanîn û kîn û dijberî di navbera wan de di dema Newrozê de werin rawestandin û ev yek bibe mîna biryarekê û li ser hemûyan were sepandin. Ji bo pêkanîna van tiştan an jî tiştine baştir, gerek e hevkariyeke dilsoz di navbera payebilindên çandî û siyasî yên kurdî de pêk were.

## Dawî

Newroz beşeke girîng ji xaknîgariya çandî yê Kurdistanê dinimîne. Wisa dixuye ku ew girêdayî şerê mayînde yê mecazî di navbera şer û xêrê de ye (di navbera kurdên kurê Ahoramazda û sîstemên zordar ku ji hêla Ahrîman ve hatine afirandin). Rewşa kurdên vê serdemê ev e. Ew gelekî hewcedarî Kawayê Hesinkar in da ku wan ji nû ve bixe yek ji bo wî ji Ezdehakên serdemê rizgar bike û azadiya wî pêk bîne û agirê pîroz ji nû ve were dadan da ku tarîtiya li ser civakên kurdî ronî bike.Newroz weke zayîna kurdan a nû dest pê dike. Tevî ku bi dehan şoreşên kurdî çêbûne, lê wan nikarî serkeftiyên şoreşa Kawa pêk bînin. Dibe ku ev yek li pradîgmeya ku wê bi rê ve dibe, vegere ku ew jî girêdayî astengiya rakirina sînor û mertalên manewî di navbera pêkhateyên gelê kurd de. Ji bo pêkanîna vê yekê jî gerek e her yek ji me bibe Kawayê Hesinkar, bi dilê wî bihise û bi mejiyê wî bifikire li hemberî rewşa tarî ya ku piraniya civakên kurdî wê dijîn. Nemaze ku kurd heya niha hê ber bi gurîngehên Ezdehakan ve tên birin da ku mejî, xwîn û xwêdana wan bibe enerjî û bi rêya wê zordar jiyana xwe bidomînin. Ji aliyekî din ve gerek e em mîrata medî biparêzin, ew jî bi rêya têkiliyên civakî bi cîranan re. jixwe girêbesta civakî ya Rêveberiya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyeyê, nimûneyek li ser vê babetê ye. Pêwîst e asta diplomasiya civakî di vê derbarê de bilindtir bibe, çimkî dijmin bi rêya afirandina fitne, nakokî, guhertina rastiyan û gurkirina tundrewiyê, dixwazin civakên xwecihî armanc bigirin da ku zordariya xwe bisepînin (Daiş jî yek ji wan nimûneyan e)

## Jêder û çavkanî:

### Lêkolerên ewropî û rojavayî:

1. Grnot Fîlhilm, Horî, dîrok û şaristaniya wan, wergêr: Dr. Farûq Ismaîl, çapa yekem 2000, weşanxaneya Cedel, Heleb.
2. B.Lîrx, lêkolîn der barê kurdan û pêşiyên wan ên bakur, wergêr: Dr. Ebdî Hacî, çapa yekem 1994, weşanger: pirtûkxaneya Xanî, Heleb.
3. Toma Biwa, Kurd, wergêr: Selah Irfan, weşanger: Navenda Lêkolînên Kurdî (Kurolojîk), Silêmaniyê, 2010, bê hejmara çapê.
4. Arşak Safrastiyan, kurd û Kurdistan, wergêr: Dr. Ehmed Mehmûd el-Xelîl, çapa duyem 2008, weşanxane: Serdem, Silêmaniyê/ herêma Kurdistanê.
5. Arter Kirîstinsin, Îran di serdema sasaniyan, wergêr: Yehya Xeşab, weşanxane: El-Nehde el-Erebiye a çapkirin û weşanê, Beyrût, bê hejmara çapê.
6. Spitîno Moskanî, Şaristaniyên samî yên kevin, wergêr: Dr. Yaqûb Bekir, weşanxane: El-Ruqî, Beyrût 1986, bê hejmara çapê.
7. Wêl Diyorant, çîroka şaristaniyê, Rojhilata Nêz, wergêr: Mihemed Bedran, beşa duyem a pirtûka yekem 1988, weşanxaneya El-Cîl a çapkirin û weşan û belavkirinê, Beyrût
8. Hejmarek dîroknas bi serpereştiya Morîs Kirozîye (mufetişê zansitên giştî li Fransayê) ferhenga fereh a dîroka şaristaniyên giştîn, wergêr: Yûsif Esed Dagir û Ehmed Ewêdat, pirtûja yekem, çapa duyem 1986, Weşanxaneya Weşanên Iwêdatan, Beyrût, Parîs.
9. Margirêt Roten, Dîroka Babil, Wergera Zêne Azar û Mîşal Ebî Fadil, çapa duyem 1994, weşnaxaneya Weşanên Iwêdatan, Beyrût, Parîs.
10. Mîrsiya Îliyad, dîroka bawerî û ramanên olî, beşa duyem, wergêr: Ebdilhadî Ebas, çapa yekem 1986-1987. Weşanxaneya Şamê, Şam.
11. Şarlot Sîmor-Simêt, ferhenga mirovnasiyê, têgihên neterobolojîk, wergêr: Komek mamosteyên civaknasiyê bi serpereştiya Mihemed Cewherî, çapa duyem 2009, weşanger: Navenda Neteweyî ya wergerê, Qahîre.
12. Sîgmond Firowêd, tewtem û tabût, wergêr: Bûelî Yasîn, çapa yekem 1983, weşanxameya el-Hîwar a weşan û belavkirinê, Laziqiyê.
13. Gostaf Lobon, Sîklojiya cemaweran, wergêr: Haşim Salih, çapa yekem, 1991, weşanxaneya Saqî li Beyrûtê.
14. Rolan Bart, Dersa sîmyolojîkê, wergêr: E. Binebid el-Alî. Weşanxaneya Topqal, Mexrib, çapa sêyem, 1993
15. Dîroka Hîrodot, wergêr: Ebdilîlah Melah, bê hejmara çapê, weşnger: Civaka Çandî, Ebûzebî 2001.

1. G. MASPERO; HISTORY OF EGYPT CHALDEA, SYRIA, BABYLONIA, AND ASSYRIA; THE GROLIER SOCIETY PUBLISHERS; LONDON; Release Date: December 16, 2005; Link:

https://www.gutenberg.org/files/17326/17326-h/17326-h.htm

2. Ferdinand Hennerbichler; The Origin of Kurds; Szellörózsa ut 45, Mosonmagyaróvár, Hungary; 2012; Scientific Research; Link:

https://www.researchgate.net/publication/265947486_The_Origin_of_Kurds

**Lêkolerên rojhilatî:**

*1. Dr. Xelîl Ebdilrehman, Avista, Pirûka pîroz a ola zerdeştî, çapa duyem 2008 weşnger: Rewafid a çan û hunerê, Şam.*
*2. Mihemed emîn Zekî Beg, Puxteya dîroka kurd û Kurdistanê, ji serdemên herî kevin û heya niha. Wergêr: Miehem Elî Ewnî, çapa duyem 2005, weşanxaneya el-Şiûn el Seqafiye ya giştî- Bexda.*
*3. Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, Şahsamana Mediya, çapa yekem, 2011, weşanger: Saziya Mukriyanî ya Lêkolîn û Weşanê, Erbîl.*
*4. Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, Dîroka şahsamana Mîtanî ya hûrî, çapa yekem, 2013, weşanger: Saziya Mukriyanî ya Lêkolîn û Weşanê, Erbîl.*
*5. Dr. Firist Merî, Kurdistan di sedsala heftê zayînê de, weşanger: Navenda Kurdistanê ya lêkolînên stratejîk, Silêmaniyê 2006, bê hejmara çapê.*
*6. Cemal Reşîd Ehmed, Dîdara pêşiyên kurd û lanan li welatên Bab û Şêrewan, çapa yekem 1994, weşanger: Riyad el-Reyis a pirtûk û weşanê, Lundin.*
*7. Hesen Kakî, Imiratoriya Medî ya kurdî, destpêk û dawî, bê weşanger û hejmara çapê.*
*8. Dr. Neîm Fereh, Puxteya dîroka Rojhilata Nêz a kevin, ji alıyê siyasî, civakî, aborî û çandî ve, weşanxaneya Fikir, bê hejmara çapê û dîroka weşanê.*
*9. Nebîl Zekî, Kurd/ efsaneyên şoreş û şeran, weşanxaneya Pirtûka Îro 1991, bê hejmara çapê.*
*10. Rafide Ebdela Ebdilsemed qeredaxî, Kurdistana Iraqê di dîroka kevin de, li gor jêderên mîxî ji sedsala sêyem a berî zayînê û heya 612bz, seteke derçûna doktoriyê di dîroka kevin de ji zanîngeha Silêmaniyê, fakulteya mirovnasiyê, beşa dîrokê 2008.*
*11. Dr. Hesên Qasim el-Ezîz, lêkolîn der barê hin kokên kurdan de. Weşanxaneya Aras a çapkirin û weşanê, Hewlêr, Kurdistana Iraqê, çapa yekem 2012.*
*12. Dr. Kazim Hebîb, Êzîdî, oleke kevin xwe li hember bobelatên demê radigire. Çapa yekem 2003, weşanxaneya Aras a çapkirin û weşanê, Hewlêr, Kurdistana Iraqê.*
*13. Murşid Yûsif, Domozî (Tawûsê Melek), lêkolînek der barê kokên ola kurdî ya kevin de, çapa yekem 1999 bê weşanger.*
*Dr. Usama Ednan Yehya, dîroka Rojhilata Nêz a kevin/ lêkolîn, çapa yekem 2015, weşanger: Aşûr Banîbal a Pirtûkan, Bexda.*
*Dr. Hesen Kerîm el-Caf, ferhenga Fereh a dîroka Îranê ya siyasî/ ji dîroka efsanewî heya dawiya dewleta Tahirî, pirtûka yekem 2008, weşanxaneya Erebî ya ferhengên giştî, Beyrût.*
*Hesen Bîrniya, dîroka Îranê ya kevin ji destpêkê heya dawiya serdema sasaniyan, wergêr: Mihemed Nûredîn Ebdilminim û Subaî Mihemed Subaî, çapa yekem 2013, weşanger: Navenda neteweyî ya wergerê, Qahîre.*
*Dr. Umar Ebas Mehmûd, Doza kurdî/ pirsa avakirian dewletê, çapa yekem 2016, weşanxaneya el-Erebî ya weşan û belavkirinê, Qahîre.*
*M.Dr. Sufyan Liwês, semînerk bi navê Pîvanên lêkolîna dîrokî. Zanîngeha Stêf 2/beşa dîrok û şûnwaran, Cezayîr.*
*Amir Hena Fetûhî, Keldî, Keldan ji destpêka demê ve, çapa diyem, bê hejmara çapê û weşanger.*
*Ebdela Ocelan, Manefîstoya şaristaniya demokratîk, doza kurdî û çareseriya neteweya demokratîk, pirtûka pêncem, çapa sêyem, wergêr: Zaxo Şiyar.*
*Ebdela Ocelan, ji dewleta kahinên somerî ber bi şaristaniya demokratîk ve, beşa yekem, bê weşanger û hejmara çapê.*

*Firas Sewah, muxamereya mejî ya yekem, lêkolînek di efsaneyê de (Sûriye û Mozopotamya), çapa yazdehem, 1996, weşanxaneya Elaidîn, Şam.*
*Ismaîl Beg Col (Mîrê Êzîdiyan li Şingalê), Êzîdîbûn berê û niha, weşanger: Fakulteya zanist û wêjeyan, zanîngeha Amerîkî li Beyrûtê 1934.*
*Dr. Karim Mehmûd Ebdilezîz, Efsaneyên cîhana kevin, çapa yekem 2007, weşanger: Pirtûkxaneya Nafiz, Cîze, Misir.*
*Lêkolerên sovyet:*
*Basîl Nîktîn, kurd, koka wan, dîrok û welatê wan…/redekte û lêbeger û pêşkêşkirin: Selah Berwarî, weşanger: Kovara Aso ya çandê, bê hejmara çapê û dîrok.*
*Selewat Golyamov, Arya kevin û Kurdistana mayînde (kurd ji kevintirîn gel in), wergêr: Dr. Ismaîl Hesaf, çapa yekem 2011, weşanger: Saziya Lêkolîn û Weşanê Mokiryanî, Hewlêr.*
*M.S Lazarîf û hinên din, dîroka Kudistanê, wergêr; Dr. Ebdê Hacî, Çapa duyem 2011, weşanger: Saziya Spîrêz a çap û weşanê li Dihokê.*
*K. Matfîf û M. Sazonov, Şaristaniya Mozopotamyayê ya kevnar, wergêr: Dr, Hena Adem, weşanxaneya Mecid, Şam, 1991, bê hejmara çapê.*
*F. Diyakof- S.Kofalîv, şaristaniya kevin, beşa yekem, wergêr: Nesîm Wakîm, Yazecî, çapa yekem 2000, weşanxaneya Elaidîn, Şam.*

**Ferhengên fireh ên eleketronîk:**
*Ferhenga fireh a zanista eleketronîk.*
*Wîkîpîdya, Ferhenga fireh a azad.*
*Encyclopaedia Britannica.*
*Mimir Ferhenga firehe a zimanê erebî (elektronîk) lînk:*
*https://mimirbook.com/ar/10c623910d2*

**Malperên eleketronîk:**
*Dr. Mueyid Ebdilsetar, Kurdistan dergûşa veguhestina şaristanî ya yekem, wan yekem gundê çandiniyê ava kir, weşanger: Malpera Hîwar el- Mutemedin, hejmar: 3363 12. 5. 2011. Lînk:*
*https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=258736*
*Dr. Verist Meriî, Newroz di şaristaniya islamî de, dîroka weşanê 4ê tîrmeha 2019, malpera Kovara Hîwar, Lînk:*
*http://alhiwarmagazine.blogspot.com/2019/07/blog-post_48.html*
*Mihened Sibhî Hecar, artêş û hunerên şer li ba pirsan, weşanger: Malpera berevaniya niştumanî ya libnanî, hejmar 76, nîsan 2011, lînk:*
*https://www.lebarmy.gov.lb/ar/content*
*Dr. Mihdî Kaka bî, Dirêjahiya Newrozê di kurahiya dîroka kurdî de, malpera Hîwar el-Mutemedin, hejmar 475, 16. 3. 3015. Lînk:*
*https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=459689*
*Wela Xidêr, Newroz li ba kurdan, sembola serkeftin, dilsozî û pêşwazîkirina biharê ye. Di dîroka 21ê adara 2016an de hatiye weşandin, weşanger: malpera Tirkperes, Lînk: https://www.turkpress.co/node/19845*
*Malpera hikûmeta Herêma Kurdistanê, Şkeftên di Kurdistana Iraqê de, dîroka weşanê, 12. 4. 2006, lînk:*
*http://cabinet.gov.krd/a/d.aspx?a=17728&l=14*
*Malpera brick- school, Xwedawendên sulafî yên kevin, xwedawendên sulafî, lînk: https://healthfemale.ru/ar/old-slavic-deities-slavic-gods.html*
*Malpera cîhana zanînê, Vayking kîn e? Bê dîroka weşanê. Lînk:*

*https://knowledge0world.blogspot.com/2012/12/blog-post_9.htm*
*Prof. Dr. Necati DEMİR; TÜRKLÜĞÜN EN ESKİ BAYRAMI NEVRUZ VE TARİHÎ ALT YAPISI ;بدون ناشر ورقم طبعة ; Link:*
*http://www.necatidemir.net/images/demir/bkosem/nevruz.pdf*
*Sedat Sûr; Şahidên komkujiya Nisêbînê: Ji Çemê Çax Çax xwîn diherikî; 20/3/2015; ANFnews; Link:*
*https://anfkurdi.com/kurdistan/sahiden-komkujiya-nisebine-ji-ceme-cax-cax-xwin-diheriki-37389*
*Aphrodite Ourania; Great Dragon Mother; 17/11/2015; Link:*
*http://www.abovetopsecret.com/forum/thread1092953/pg1*

**çavkaniyên wêneyan:**

*The Tomb of Cyaxares the Great; August 2, 2011; Link:*
*http://qyzqapan.blogspot.com/2011/08/tomb-of-cyaxares.html*
*Saladin Der Kurden; Cyaxares The Great Kurdish Emperor; Link: https://www.youtube.com/watch?v=aQjY9e2SE1I*
*https://tr.pinterest.com/pin/448319337884157897/*
*Horse Bit Cheekpiece, c. 700 BC Luristan, Iran, c. 700 BC*
*http://www.clevelandart.org/art/1961.33?collection_search_query=Luristan&op=search&form_build_id=form-Z08h2vCXqPrd3ZqAi7Ou_1SgMK3WqXKklQuQCqClXXI&form_id=clevelandart_collection_search_form*
*Luristan Bronzes at the LACMA*
*http://benedante.blogspot.com.tr/2013/04/luristan-bronzes-at-lacma.html*
*Rod-holder Near Eastern, Iranian, Luristan, Iron Age*
*https://collections.mfa.org/objects/244442*
*Molded plaque: bearded underworld god, Old Babylonian, ca. 2000-1600 B.C., Mesopotamia.*
*http://massarrah.tumblr.com/post/84946949647/ancient-mesopotamia-molded-plaque-bearded*
*Mesopotamian Gods & Kings; Link: http://www.mesopotamiangods.com/*
*Ninhursag is the Sumerian Goddess of fertility –*
*http://www.goddessaday.com*
*Copper statue of the Sun God Shamash, dating back to 1700-1600 BCE. Shamash, the Babylonian god of justice, is depicted on the famous Code of Hammurabi. The sun is named after him in Arabic, Hebrew and Syriac. Brooklyn Museum, Brooklyn, NY*
*http://tammuz.tumblr.com/post/90563599222/copper-statue-of-the-sun-god-shamash-dating-back*
*Yılan Sembolünün Dinlerdeki Yeri ; Linke:*
*https://bilimselateistler.blogspot.com/search?q=Y%C4%B1lan+Sembol%C3%BCn%C3%BCn+Dinlerdeki+Yeri*
*http://www.odinsvolk.ca/thorshammer.htm*
*RICHARD PERKINS; THOR THE WIND-RAISER AND THE EYRARLAND IMAGE; VIKING SOCIETY FOR NORTHERN RESEARCH- UNIVERSITY COLLEGE LONDON/2001; Link:*
*http://www.vsnrweb-publications.org.uk/Text%20Series/Thor_the_Windraiser/Thor.pdf*

# Tundirewî di navbera Şoreş û Desthilatdarîyê de

**(2 ji 2)**

## Karîgerên ku tundirewîyê hildiberînin

Dîyardeya tundirewîyê li ser têkelekê ava dibe û ew têkel jî ji van tiştan pêk tê: atîfeyên gîyanî û xerîzeya tundîyê û birînên kesayeta xweperîsî û tengijînên girêdayî dabînkirina pêdivîyên fîzyolojî û hestên qalibkirî yan hestên girêdayî hewlên mirov di rêwîtîya gera wî ya zehemt de li hêz, xwarin û pirbûnê ya ku bi xerîzeya manê tê birêvebirin. Ji ber ku rewşên cih û demê li cem hemû mirovan ne weke hev in, fûrîna vî têkelî ji mirovekî ta mirovekî din û ji komekê ta komeke din cuda dibe ku bi rêya reftar, axiftin û ramanên wî dîyar dibe. Bi giştî dîyardeya tundîyê wê demê tê afirandin, dema ku mirov komeke hevgirtî ya raman û prensîpan, di civaknasîya sîyasî de navê îdîyolojîya lê tê kirin, ji jîyana xwe re û jîyana her kesê ku dikeve bin serwerîya wî de dixe makezagon, wek bav yan wek serok yan wek kahin yan wek fermandar û hwd û dibe rêbazek ji bo komeke takekesên ku di vê makezagonê de beşdar dibin.

Dixuye ku ev mijar yek ji derbirînên têgiha çanda kerî[1] ye. Tundirewî bi redkirina ramana jidevberdana bawerîyê dest pê dike û tundirewî wê demê zêde dibe, dema ku parastina qinyatan zêde dibe û rijdbûna li ser wê yekê ku qinyat rastîyeke mutleq in zêde dibe û heke ev rastîya rêjeyî ji nav biçe, dê dinya xirab bibe yan dê bi bin bikevin. Li milekî din zehmet e bê sînorkirin ka tundirewî ji takekes dest pê dike û mezin dibe heta digihe asta komekê yan jî ji komê dest pê dike û mezin dibe heta digihe asta takekes. Wate, bandoreke alûgor di navbera takekes û komê de di mezinbûna vê dîyardeyê heye ya ku bandora wê digihe jîngeha derdorê.

Gelek karîger û amûrên hilbarandina tundirewîyê hene ku zehmet e bêne destnîşankirin yan di biwarekê de werin şîrovekirin. Bi taybet ku gelek lêkolerên rojavayî têkilîyeka xurt di navbera tundirewî û terorê da dîtine û

---

[1] Çanda kerî, têgihek e ji bo reftara kesên komekê tê bikaranîn dema ku li gor reftara koma xwe bê hizirîn û bê plankirin tev digerin…

ew mîna teşeyeka pevketina şaristanîyan û êrîşeke bi ser nirxên bîyanî de li qelemê dane. Wekî ku dixwazin ku mijar mîna bigewdekirina şerê di navbera şaristanî û hovîtîyê de xuya bibe, bê ku sîyaseta dewletên xwe li hember civakên ku “terorîst”, li gor gotina wan, ji wan dertên, di ber çavan re derbas bikin.Lewra û ji bo ku heta astekê diqeta rêjeyî di vê mijarê de pêk were, baş e ku em van karîgeran di hemû biwarên analîza derûnî, civakî, çandî, aborî û sîyasî de bigirin dest ku her biwarek bi tena serê xwe rolekê di derxistina vê dîyardeyê de dilîze. Her wiha tişta ji me re giring ew e ku li tundirewîya tije kîndarî ya ku mirov ber bi tundîyê ve diajo bikolin ku ev tundirewî bû têgiheke giştî ji terorê re ku gelek pênaseyên wê hene. Lê heke em wan pênaseyan bidin ber hev, em ê bibînin ku teror derbirîneke reftarî û razber e ji rewşeke pragmatî ya tawana sîyasî yan jî ji dest derketina xerîzeya êrîşkar e ew jî piştî ku ji bendên civakî û exlaqî hat rizgarkirin. Karên ku bi tenê ji bo tirsandina zoredest û kolegiran tên tirxandin, em dikarin wan mîna berevanîyeke rewa li qelem bidin. Her lêkoler jî, ji ku derê be bila bibe ku ewlkarîya wî û welatê wî kete bin metirsîyê, dê bi vê yekê re be.

### Karîgera derûnî

Heta ku mirov bikare bi derdora xwe re bigunce û mana xwe misoger bike, divê ev şert û merc peyda bibin: Hevsengîyeke wijdanî yan hevsengîya hest û atîfeyan. Çimkî bo nimûne tevî ku bi çavekî neyînî li xweperîsîyê tê nêrîn, lê ew giring e da ku mirov bikare qedrê xwe bigire û bi xwe bawer be. Lê heke ev rêje kêm yan jî zêde bibe, dibe ku xwedîyê wê ji rê derkeve û zîyaneke razber û şênber li derdora xwe bike; heman tişt li ser êrîşkarî, tirs, dilnizmî û tundirewîyê pêk tê. Çimkî girêdaneke xurt di navbera hebûna şênber û razber de ya xerîzeya manê li cem mirovan heye. Di vê çarçoveyê de Fîlozofê îngilîz Cêrmî Bîntinam dibêje ku çavkanîyên ku karan li nik xelkê diteqîne yan dilivîne 14 in[2]: Kêfxweşî bi giştî, dilbijîya sêksî, dewlemendî, desthilat, maytêkeririn, hevaltî, ol, terefdarî, nevîyan, kîndarî, nefrîn, berjewendîya kesayetî, êş û azarên girêdayî kar û jana laşî. Dixuye ku heke çavkenîyek xweşik neherike, dê bibe sedem ku asta êrîşkarîyê zêde bibe da ku herikîn vegere rewşa hevsengîya rêjeyî. Çimkî êrîşkarî ew wize ye ya ku dihêle ku

[2] Dr Şakir Ebdilhemîd; e-Tefsîr e-Nefsî liteteruf we il-irhab (Merasid – kurasat ilmîye 37); weşanên Pirtûkxaneya el-Iskenderîye – Misir/2017; r36.

bûnewer sax bimîne û li pêş metirsîyan[3] bisekine û teşeyê reftarî û ramanî yê ku wî dişopîne bi çavkanîyê re li hev dimîne.

Hin lêkolînên ku hewl dane li dîyardeya tundirewî û terorê bikolin, piştrast dikin ku çend karîgerên derûnî û sinirî yên çalak hene her wekî nearamî, hişkbûn, tundirewî, xweperîsî, desthilatbûn, kîndarî û meyla tolhildanê. Dema ku mirovên wekhev di komekê de dihelin, ev karîger mezin dibin û dibine hişmendîyeke komî û cewhera îdîyolojîya wê ya ku reftara komê û sîyaseta wê kontrol dike.

Ji bo dudiliyê,[4] Froyid cûdahî kiriye di navbera tirsa ku jêdera wê metirsî ye û dudiliya ku jêdera wê pêşbînîkirina metirsiyê ye. Li gor wî, dudilî berpirsê sereke yên tirsê ye. Hat diyarkirin ku têkiliyek di navbera tundrewî û asta dudiliyê de heye. Her ku dudilî zêde bibe, tundrewî zêde dibe.[5] Peydanebûna bawerî û dadweriyê, yek ji handerên herî zêde yên dudiliyê ye. Ji ber wê jî piraniya kesên ku bi dudiliyê dikevin, berê xwe didin oldariyê. Li gor derûnnas Alder[6], dema hestên kêmbûn û aloziya bikêmbûnê hisîn li ba mirov derdikevin, ev yek dihêle mirov hewil bide bê lawaziya hêza xwe qerebû bike, dudilî dihêle mirov li qerebûkirin û ewlehiyê bigere. Lê dema hêza wî têrê neke ku vê yekê bike, hartir dibe û êdî dilê wî ji bo her têgihiştineke komî yan îdyolojiyeke ku li gor hestên wî be, vedibe, çimkî tê de dudiliya wî têk diçe û ewlehiya xwe tê de dibîne û êdî dibe tundrewê wê. Dudiliya ku hin civakên sinî ji ber zêdebûna hêza şîî astengiya wê dikişînin, berdewamiya rewşa trajediya li jêr rewşa gendeliyê ya çîna desthilatdar û tunebûna bijarteyeke din, her wekî koçberiyê, hişt ku ev civaka sinî ji bo rêxistinên radîkal ên ku xwe dispêrin cîhada tund, vekirî bin. Her wekî Qaîde, Daiş û ji bilî wan. Ev kom xwe dispêrin hêviya damezirandina dewleta xîlafetê ya sinî da ku wan ji tirajedî û zotiya ku tê de ne, rizgar bike (weke ku van rêxistinan dida

---

[3] Dr Ehmed Ozî; Sîkolojîyet el-Unif/Inf el-mûesese û meuseset el-unif; weşanên Mecelet Ilûm e-terbîye/ jimar: 36-Mexrib; r14

[4] Eger hûn bixwazin li têgeha dudiliyê bêtin bigerin, ya baş ew e ku hûn li van çavkaniyan vegerin: Jêdera borî, r46
Dr. Sosen Şakir Mecîd, tevlîheviyên kesayetî, cûreyên wê û pîvanên wê, çapa duyem, 2015, weşanxaneya Sefa, Uman, r179

[5] Dr. Sosen Şakir Mecîd, tevlîheviyên kesayetî, cûreyên wê û pîvanên wê, çapa duyem, 2015, weşanxaneya Sefa, Uman, r136

[6] Alfirêd Alder, xwezaya mirov, wergêr: Adil Necîb Bişra, çapa yekem 2005, weşanger: Meclisa Bilind a çandê, Qahîre, r168

diyarkirin). Xuya ye –weke mînak- ev hêviyên wan li hin deverên Iraqê têk çûne, nexasim bi binkeftina meydanî ya her du rêxistinan li Sûriye û Iraqê. Vê yekê jî hişt rewşa dudiliyê li ba van civakan zêdetir bibe. Ev yek jî dibe sedema vebûna wan li ser tundrewiyê, çimkî zêdebûna dudiliyê, dibe sedema tunebûna ewlehiya derûnî û dihêle mirov cîhanê weke jêdera gefan bibîne.

Ji bo nijadperestiyê, gelek caran di navbera tundrewî û nijadperestiyê de şaş dibin. Nijadperestî dîmenek ango taybetmendiyeke taybet a tundrewiyê ye. Yek ji şîroveyên wê yên diyar ev e: Nijadûerestî nexweşiyeke civakî ye ku hêmana tundî û xezebê dihewîne. Ew nîqaşê napejirîne û dixwaze nerîna xwe ango baweriya xwe li ser kesên din bisepîne, bêyî ku bi yek carê lêborîn hebe.[7] Nijadperestî ji ber girêdana tundrewan, baweriya wan a bêaqil û fêlbaziya siyasî çêdibe.[8] Nijadperestî aliyekî derûnî yê bikîn û heyecankirî ye ango ew bawerî yan biryarele pêşwext a bi komekê yan mijarekê yan tiştekî din, yan dijberî wan re ye. Ev biryar xwe nasipêre belgeyeke mentiqî, an jî zanîneke têr an jî rastiyeke zansitî[9] Ji ber ku hin taybetmendiyên sereke yên kesayeta nijadperest, ew e ku ew dogmaî, nelêborîner e û ji desteseriya bi rêya tundyê hez dike û ji bo ku tev li tevgerên nijadperest bibe, amade ye (olî, neteweyî û civakî), hêviya wî jî ew e ku guhertineke jinişkan ve di jiyanê de pêk were.

Ji karîgerên sereke yên ku dihêle mirov nijadperest bibe, birîna nêrgizî ye, wate, mirov rastî pîskirineke mezin tê yan jî nikare asta jiyana xwe bi asta nêrgiziya xwe re biguncîne. Weke mînak, Bilîz Baskal, di pirtûka xwe ya bi navê ``Raman di navbera birîna nêrgizî û nijadperestiyê``[10] de dibêje: ``Mirov dixwaze ew mezin be lê xwe biçûk dibîne, dixwaze xwe bikêf bibîne, lê xwe xemgîn dibîne, dixwaze xwe tekûz û tam bibîne, lê ew tije kêmasî ye, dixwaze xwe di cihê hezkirin û rêzgirtina mirovan de bibîne, lê kêmasiyên wî dihêlin bikeve cihê heqaretê li ba mirovan de. Ev tekasiya ku xwe tê de dibîne, dihêle

---

[7] Endirêh Haynal û hinên din, sîkyolojîka nijadperestiyê, wergêr: Dr. Xelîl Ehmed Xelîl, çapa yekem, 1990, weşanxaneya Saqî, Lundun, r75

[8] Birnard Şofîîh, Nijadperest, dînbûna baweriyê, wergêr: Dr. Qasim Muqdad, çapa yekem, 2017, weşanxaneya Nînewa, Şam, r95.

[9] Dr. Sewsen Şakir Mecîd, Tevlîheviyên kesayetî, cûreyên wê û pîvanên wê, çapa duyem. 2015, weşanxaneya Sefa, Uman, r135

[10] Endirêh Haynal û hinên din, sîkyolojîka nijadperestiyê, wergêr: Dr. Xelîl Ehmed Xelîl, çapa yekem, 1990, weşanxaneya Saqî, Lundun, r69

zilm û sûcdarî li bal mirov peyda bibin. Ew gelekî ji vê rastya ku li pêşberî wî derdikeve aciz e û dihle bawer bike ku ew qas kêmasî û şaşîtiyên wî hene.``xuya ye piraniya kesên nijadperest ji ber birînên nêrgizî yên kûr astengiyan dikişînin. Her wiha ji ber trajedî û zordariya ku di jîngeha wan de heye û gotara îdyolojîk a hêzên şofînîzm û radîkal ku agirê kînê di wan de gur dike û serboriyên serkeftî yên bav û kalên wan bi bîra wan tîne… ji ber wê jî kesê nijadperest du birînên wî yên nêrgizî hene; sedema yekê ji wan statûya siyasî ya zordar e ku ew di bin desteseriya wê de ye, ya duyem jî ew e ku ev kes serkeftina şaristaniya rojavayî li ser şaristaniya wî, napejirîne. Jixwe ew şaristaniya rojavayî (weke ku hin siyasetmedarên şofînîzm û oldar didin diyarkirin) weke semboleke gawirtî û şerê dibîne, yan jî bi kêmanî ew ji çanda wî nepîroztir e. Di dema nakokiya di navbera partiya Bas û Ixwanan li Sûriyeyê, ev rewş hat jiyankirin û heya niha hê bandorên wê berdewam in. heman rewş li gelek bajarên din jî heye.Birîna nêrgizî ku ji ber hestên heqaret û kêmqîmeta di dema niha anjî ya borî de çêdibe ku sedema wê heqaretê jî binkeftina kirêt an jî çewsandin e, yek ji sedemên tundrewî û kirina karên terorîst bi hinceta tolhildanê ye da ku bi rêya birîndarkirina kesên din ên ku wan sûcdar dibînem, birîna xwe ji bîr bike. Hin lêkolîner dibînin ku[11] şêweyê cilên kesên ku karên terorîst dikin, destmal û kofiyên li serê wan, al û sembolên wan, rêbazê jiyana wan û layfên wan ên ku xwe tê de didin nasîn ku karên wan ên tund şîrove dikin, hestên wan ên nêrgizî yên eşkere û mentiqê wan ê sîkyolojîk û civakî yên taybet bi wan didin diyarkirin. Li gor derûnnasan, nijadperestî, heya astekê ewlehiya zanebûnê û bicihkirina nêrgiziyê li ba xwediyê xwe peyda dike.[12] Kombûna dijminatî û bêhêviyê, tunebûna hestên ewlehiyê û zêdebûna dudiliyê, ji ber rewşa bêhêviyê di pêkanîna kesayeta xwe de (têrkirina xweser ji pêdiviyên madî û manewî), tê. Pê re jî birîna nêrgizî, hestên nijadperestiyê xurttir dike. Bi vî awayî nijadperestiya olî yan jî ya nijadî yan jî ya taifî, rêbazek e ji bo arastekirina tundî û dijminatiyê ber bi komeke din ve ku li gor wan ev kom jêdera şer e û gerek e bi awayekî bê sînor were tunekirin. Kuştina vê komê û pêkanîna komkujiyan der heqê wê de dibe tiştekî helal. Koma êrîşker hincet dike ku

[11] Dr. Şakir Ebdilhemîd, şîrovekirina derûnî ya tundrewî û terorîstê, weşanxaneya Skenderiyê, Misir, 2017, r15.

[12] Endirêh Haynal û hinên din, sîkyolojîka nijadperestiyê, wergêr: Dr. Xelîl Ehmed Xelîl, çapa yekem, 1990, weşanxaneya Saqî, Lundun, r43

ew tu sûcî der heqê kesên din de nake, lê belê ew şerekî pîroz ji bo xweparastinê dike. Bi vî awayî kiryarên wê û binpêkirinên wê dibin karên leheng û pîroz. Em vê yekê bi awayekî diyar li ba artêşa dagirkeriya tirkî di êrîşên wê yên bi ser bakurê Sûriyeyê de dibînin, her wiha em di srûdên hander ên Daişê de dibînin. Heyecanên ku hestên kirina tiştên rast li ma mirov xurt dikin û dihêlin mirov bihise ku tişta rast û durist dike, beşek ji pêkhateya derûnî ya tundiyê ye û di encamê de ya sûckirinê (li gor lêkoler Golin Wilson).[13] Wilson tekez dike ku kîna li hember kesên biyanî (Kezînofobya) pêkhateyekî resen û beşek ji mîrata me ya xerîzî ye.[14] Her wiha ew beşekî girîng ji îdyolojîka rastgir a tundrew e li piraniya welatên cîhanê.[15] Jixwe berteka kesê qurban dê tolhildana bi awayekî tundrewtir be dema derfet jê re peyda bibe. Ev yek li gor lêkoler Mistefa Hicazî, dibe sedema rêzebûyerên tundiyê.[16] Hicazî amaje dike ku piraniya encamên çêbûna ``dîwarekî ji tirs û hayjixwehebûna her du aliyan, tirsa ji tolhildanê ye. Ev yek jî pêrewiya mirov a bi koma wî re zêdetir dike û dihêle ev mirov bêtir di nac tirs, heyecan û xwestekên seretayî de noq bibe.tirseke tam li balê peyda dibe û di ber re jî xwesteka tolhildanê ya bê sînor heye û xwesteka bêsînor a desteseriyê heye ku kesê li hemberî xwe napejirîne…``

Kesên nijadperest, ji bo ku ramanên xwe belav bikin, desthilatiya xwe bi cih bînin, xwe dispêrin terorê û kesên din ji aliyê madî û manewî ve bi rêya binpêkirina sembolên wan ên pîroz û baweriyên wan, hildiweşînin. Xwestekên wan dihêlin ku rastiyê bikin weke xeyalên xwe, mîna ku hestên ku gunehên dikin nas nakin li ba wan hebin. Weke mînak li gor lêkoler Bernard Şofêh[17]: ``Nijadperestê xiristiyanî olên din weke tiştekî efsanewî û nerast dibîne û li gor wî gerek e ev ol werin têkbirin. Li gor wî ev ol ne tenê nerast e, lê belê gerek e ji nexşeya olî were rakirin û mirov werin neçarkirin

[13] Golin Wilson, dîroka sûcdarî ya mirovan, sîkyolojîka tundiyê, wergêr: Dr. Rifet Seyid Elî, çapa yekem, 2001, weşanxaneya Koma Hor ya Çandê li Qahîreyê, r105.
[14] Heman jêdera borî, r80.
[15] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r14.
[16] Dr. Mistefa Hicazî, paşvemayîna civakî, derbasgehek bo sîkyolojiya mirovê çewisandî, çapa nehem, 2005, weşanger: Navemda Çandê ya Erebî li Darilbeyda, Mexrib, Beyrût Libinan, r180-181
[17] Birnard Şofîîh, Nijadperest, dînbûna baweriyê, wergêr: Dr. Qasim Muqdad, çapa yekem, 2017, weşanxaneya Nînewa, Şam, r143

da ku tev li baweriya rast bibin.`` ev nerîn weke ya nijadperestên misilman, cihû, hindos, êzîdî û ji bilî wan e. ji ber wê jî têkiliyeke xurt di navbera nijadperestî û hişkbûna ramanî de heye. Hişkbûn, tê wateya tunebûna nermbûna mejî û hestên rexnepejirandinê û hema hema mîna dogmaîyê ye. Hişkbûn dîmenekî din ê tundrewiyê ye.[18] nexasim di çarçoveya xwegirtina bêsînor a bi nerîn û hişkbûna mejî de û di nebexşana kesên din ên ne weke wî ji aliyê bawerî û îdyolojîkê ve. Hişkbûn di lêkolînên derûnî de wisa hatiye pênasekirin:[19] ``Nekarîna rêjeyî ya mirov e ku guhertinekê di reftar û aliyên xwe de pêk bîne, nexasim dema rewşên bêalî vê yekê bixwazin. Her wiha ew tê wateya xwegirtina mirov bi rêbazên ne guncav ên reftar û hesan.`` wate, mirov di xwepîrozkirin û ezeziya nerînên xwe de noq dibe.``

Ji bo desteseriyê, yek ji nerînên ku wê şîrove dikin ev e:[20] ``Desteserkirin, binyateke derûnî û cîvakî ye ku ji ber kêmasiyekê di hizirîna erênî de peyda dibe. Ew yek ji arîşeyan e ku dihêle xwediyê wê ber bi yek alî ve bihizire. Desteserî yek ji kiryarên sînordar e di biwarê hizirîna tekûz de…`` hestên desteseriyê, diyardeyeke tundrewiyê ye jy dube yek ji stûnên sereke di berzbûna cûreyên duyem ê tundrewiyê (weke rêbazekî xurtkirina desteseriyê). Kesên herî zêde yên ku xwe bi vê yekê ve digirin, pêşewayên siyasî yan ên olî û xwediyên armancên desteserî û malgirtina gencîneyan. Ev kes bi zanebûn, rewşên dudilî, nijadperestî û hişkbûnê bi kar tînin û wan di gumgumê îdyolojîkê de gur dikin da ku alîgiran li dor xwe kom bikin û wan bixin pêrewên xwe yên dilson û heta wan bikin kujer jî.[21] Ji aliyekî din ve, xwesteka desteseriyê li ba kesên zordar, dibe sedemeke xurt ku kesên çewisandî ber bi tundrewiyê ve herin. Lê belê zihniyeta paşvemayî ya kesên çewsandî (bindest) carinan ji ber ku çandeke siyasî ya ku rêzdariya ewlehiya mirovî bigire li ba wan tune ye, hişikbûna zihnî li ba wan peyda dibe û ew jî bi awayekî bilez ber bi girêdana bi kesê zordar ve diçe. Li şûna girêka kêmasiyê, girêka serkeftin û pozbilindiyê li ba wan tê der û li şûna bêçarbûnê,

---

[18] Dr. Şakir Ebdilhemîd, şîrovekirina derûnî ya tundrewî û terorîstê, weşanxaneya Skenderiyê, Misir, 2017, r14.
[19] Heman jêdera borî.
[20] Heman jêdera borî, r142.
[21] Ji bo agahiyên zêdetir, tu dikarî li Reşad Selam vegerî, kehnûtên di her serdemê de, tiştên nerast…li ser erdê dimeşin, çapa yekem, 2010, weşanger; Saziya Belavkirina erebî li Beyrûtê.

girêka zordariyê li ba wan peyda dibe û hestên serkeftinê li ba wan zêde dibin û diyaloga bimejî û hizirîna mentiqî li ba wan hildiweşe. Di encamê de mirov zêde bi xwe bawer dibe û kesên derdorê bêqîmet dibîne. Ev xwegewredîtin li gor hin lêkoleran:[22]``Dihêle mirov xwegewre bibîne bi tiştekî ku li balê tune ye. Ev yek jî cûreyekî xwegewredîtinê û tundrewiya bi zihniyeta kesê zordar ên kevin e. di encamê de ev mirov zordariyê dike, xwe dibîne û binpêkirinê dike… ev kêmasî di hizirîna gengeşeyî de û tevlîheviya rêbazî ya hizirînê, ne ji ber kêmasiyeke byolojîk yan binkeftineke pêşketinî ye, lê belê ew encama binyata civakî ya paşbemayî ye û encama karîgerên zordarîyê ye ku mirovê paşvemayî jiyan dike.`` ev yek di reftarên mîrên Daişê li hemberî civakên herêmê yên ku bi zorê desteser kirin de dihat dîtin. Lêkoleran di derûnnasiyê de li ser vê xwestekê tekez kirin û dîtin ku du aliyên dijber di kesayeta mirov de hane; nepejirandina desthilatiyê û bikaranîna wê.[23] Li gor lêkolînekê[24], yek ji hêmanên sereke yên avakirina kesayeta desteser, girêdana kesê hişk bi raman an baweriyekê ve ku dijberî nûjeniyê ye û dozkirina bikaranîna tundî û hêzê weke rêbazekî guherandinê û nijadperestiyê li hemberî kesên cuda di biwarê civakî yan olî de û tekezkirina li ser tiştên borî û nirxên bav û kalan û nerazîbûna ji rewşa heyî. Ji ber wê tundiya girêdayî wê dibe weke avakirina bircekî yan pîramîdekî ku niştecihên wê xwe ji her kesên din cudatir û baştir dibînin û wan ji xwe biçûktir dibînin. ev yek dihêle xwesteka pêkanîan desthilatiyê li ser kesên din li ba mirov xurt bibe; ji aliyê manewî ve bi rêya desteserkirina hes û ramanan û ji aliyê madî ve bi rêya çewsandin û kuştinê. Bi awayekî giştî bijarteya tundiyê li ba van kesan a herî guncav e ji bo belavkirina nerînên xwe û damezirandina desthilata xwe. Ev jî tê wê wateyê ku têkiliyeke xurt di navbera tundî û desteseriyê de heye. Şerê desteseriyekê tê kirin da ku yeke din were sepandin.

Mirov nikare têkiliya di navbera kîn û xwestekên tolhildanê de piştguh bike. Ev her du taybetmendiyên cuda yên diyardeya tundrewiyê ne. tundî

[22] Dr. Mistefa Hicazî, paşvemayîna civakî, derbasgehek bo sîkyolojiya mirovê çewisandî, çapa nehem, 2005, weşanger: Navemda Çandê ya Erebî li Darilbeyda, Mexrib, Beyrût Libinan, r70

[23] Golin Wilson, dîroka sûcdarî ya mirovan, sîkyolojîka tundiyê, wergêr: Dr. Rifet Seyid Elî, çapa yekem, 2001, weşanxaneya Koma Hor ya Çandê li Qahîreyê, r233.

[24] Dr. Şakir Ebdilhemîd, şîrovekirina derûnî ya tundrewî û terorîstê, weşanxaneya Skenderiyê, Misir, 2017, r143.

yek ji derbirînên taybet ên kombûna demdirêj a dijminatiya mirov e. Kîn li ba lawiran tune ye. Tolhildan jî rastiyek ji rastiyên reftarên mirov e ku girêdayî nijadperestiya hestên girêdana bi komê ve ye û ew weke bertek an jî rehetkirina birîna nêrgizî ye û weke bijarteyeke stratejîk a mirovê çewisandî ye. Em di kultûrê çandî yê gelêrî yê gelek civakan de dibînin ku ew tolhildana ji dijminan tiştekî pîroz dibînin. kîn û tolhildan jî bi hev re tên û her yek ji wan şertê hebûna yê din e. weke mînak wan bingeha zêdebûna hêza koma heşaşan pêk anî.[25] Ev taybetmendiyeke ku di hemû civakên tundrew ên siyasî û olî de heye. Îdyolojîkên tundrew û nijadperest, kesê din napejirînin û kujer û sûcdaran diagirînin ango ew kesayetên sûcdar li ser bingeha qirkirina kesên din bi rêya kîn û nehezkirin û tolhildanê ava dike. Bi awayekî giştî kîn û xwestekên wê yên tolhildanê, handerên sereke yên tundiya tundrewên misilman di dîroka hemdem de.[26] Her wiha em dibînin ku hin dewlet bi top û bumbeyan, hin welat û bajarên din topbaran dikin û bi dehan qurbanî dikevin ku weke tolhildanê ji pêvajoyên terorîst in. her kes xwe dibîne ku ew pabend e berevaniyê di ber birayên xwe yên heman baweriyê de bike û tola wan hilîne (li kû bin bila li wir bin). Li gor wan tundiya hovane li hemberî dijminên birayên wan ên çewisandî û jêkirina serê wan an jî rûxandina kolan û taxên wan tiştekî rewa ye. Tevî ku tolhildan çekekî cezakirinê ye da ku rê li ber êrîşkirin û zordariyê bigire, lê ew her di xeyalê mirovan de hazir e û çîrok û bîranîna komkujiyên ku birayên wan rastî hatine, wê tîmar dikin. Her wiha zordariya ku milet di bin desteseriya rêjîmên zordar de rastî tên, dihêle çiraya kînan di mirovan de dadayî bimîne. Du alî ji bo bikaranîna tolhildanê ji bo pêkanîna armancên xwe di bidestxistina vê çirayê de di pêşbaziyê de ne. aliyek baweriyê bi mezheba hebûnê di hişê xwe yê siyasî de tîne ku ew qîmeteke mezin dide mirov û hewil dide wî ji koletî û zordariyê rizgar bike û wê çirayê vemirîne û aliyek baweriyê bi îdyolojîka totalîtarî ya olî yan jî tyoqratiyê di hişê xwe yê siyasî de tîne û hewil dide wî agirî gur bike. Jixwe ev halê piraniya komên tundrew e yên ku tundiya hovane li xwe digirin.

[25] Birnard Şofîîh, Nijadperest, dînbûna baweriyê, wergêr: Dr. Qasim Muqdad, çapa yekem, 2017, weşanxaneya Nînewa, Şam, r80

[26] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r97.

Bi awayekî giştî, nijadperestî û hestên kîn û xezebê û dijminatî û reftarên tund û xwestekên tolhildanê û ji bilî wan, enerjiya tundrewiyê pêk tînin; çi weke rêbazekî xweparastinê be çi jî rêbazekî xurtkirina desthilatê be.

**Karîgera civakî û jîngehî:**

Civak komek mirov e ku xwedî hestên taybet in, bi hev re li ser devereke xaknîgarî dijîn û ji aliyê dîmen û ramanan ve bi hev re diguncin û li hemberî kesên biyanî baldar in. Ev kom çalakiyên aborî û siyasî û adetên hevbeş dikin ku ev çalakî li gor peymaneke civakî ya li ser lihevkirî tên birêxistinkirin. Ev peyman di aliyê xwe yê sereke de li ser xurtkirina girêdana mirov bi welat û civaka wî ve tekez dike û tundiya li ba mirovan bi rêxistin dike û bi rê ve dibe. Ev yek ji biçûkanî ve di mirovan de tê çandin û hin pîvan tên danîn da ku werin kontrolkirin û dem û çawaniya gurkirina wan were diyarkirin. Dibe ku ev yek dihêle mirov bigihêje wê baweriyê ku şaristanî tenê bersiveke hestî, ramanî, siyasî, aborî û leşkerî ye li hember rewşa dem û cihê jîngeha ku ew civak tê de dijî. Ev zanista bidestxistî û reftarên civakî bi domana demê re dibe çandek ku bi pêşketina dem û cih re bi pêş dikeve. Ji ber wê jî her hişmendiyeke ku rûxandin û kuştinê li şûna hemahengî û hevgirtina bi kesên din re dipejirîne, şaristanî yan jî çandeke resen nanimîne.

Civak û jîngeha ku mirov tê de dijî, bi roleke girîng di diyardeya tundrewiyê de dilîzin, çimkî ew bandorê li mirovê ku di wan de dijî dikin. Weke qerebûkirina neçariya xwe, mirov xwe bi kom û jîngeha xwe diparêze. Bi zêdebûna metirsiya li ser mirov û zêdebûna hestên gefan, mirov bêtir dixwaze di nav civaka xwe de bihele. Ev zagon yek ji zagonên xwezaya mirov e. jîngeh (şêwe û rewşa wê çawa be) bandorê li hest û ramanên mirov dike. Ji bo ku mirov xwe bide diyarkirin û kesayeta xwe pêk bîne, tenê du bijarte li balê hene; yan dê xwe ji bendên manewî  yên ku jîngeh li ser disepîne rizgar bike yan jî di nav de bihele. Ji ber wê jî ev bandor du rêyan digire; rêya yek, raperîna mirov li hemberî civaka wî nîgar dike ku ev mirov rêbazê jiyana xwe û çanda xwe napejirîne çimkî ew berovajî bawerî û îdyolojiya wî ne ku bi qalibên exlaqî yan olî yan jî felsefî dinixumînin, rêya duyem jî bi rêya çewsandina ku civak bi giştî rastî tê ji hêla desthilatên zordar, tê nîgarkirin. Di encamê de tundiya selefî bi wateya xwe ya çandî ya giştî derdikeve bêyî ku di biwarê olî de weke karîgereke hevgirtina civakî û enerjiya baweriya şer çarçovekirî bimîne. Ew rêbazekî berevaniyê bo civaka çewisandî ye. Hin

lêkolîn amaje dikin ku her çewsandin li ser mirovê ku nikare li hember serdestan raweste zêde dibe, tundiya selefîbûnê jî zêdetir dibe. Ji ber wê berê xwe dide demên borî û xwe bi kevneşopiyên wan ve girê dide û hewil dide bi lehengên berê re bihele li şûna ku li hember dema niha raweste û li pêşerojê bigere. Ev tundrewî li gor zihniyeta rêveberan şêweyên cûr bi cûr li xwe digire. Xwesteka rizgariyê her du aliyan diyar dike û taybetmendiyên xêr û şer li gor her du aliyan rêjeyî ne. xwestekeke hevbeş li ba wan heye ku civakê hilweşînin û yeke din li şûnê ava bikin. Raperîna mirov li hember civaka wî, dibe ku xizmeteke mezin jê re pêşkêş bike, her wekî pêxember û şoreşgeran, dibe ku jê re hilewşîn û jevketinê jî bîne her wekî nakokiyên nijadî û tîreyî di hundirê neteweyan de.

Nijadperestiya êlî û ya îdyolojîk (olî, mezhebî û neteweyî) a ku bi dijminatiyên dîrokî hatiye çarçovekirin û bi zilm û zoriya di civakekê de hatiye diyarkirin, bi rolekê di derxistina karîgera civakî weke bandorker di çêbûna diyardeya tundrewiyê de dilîze û ew weke pîvanderekê ji pileya ku karîgera derûnî di çêkirina vê diyardeyê de radibe. Ev yek bi awayekî zelal di kêşeyên siyasî de yên ku di civakên Rojhilata Navîn de hene, tê diyarkirin. Temenê wan kêşeyan sedên salan in. em di wan civakan de cûreyên cihêreng ên tundrewiyê dibînin; tundrewiya girêdayî nakojiyên tîreyî, ya girêdayî nakokiyên olî, neteweyî û partîtî. Rewşên siyasî yên her komekê, bandorê li biratiya baweriyan di civakên welatên cîran jî dike. Ev yek di nakokiya dîrokî ya di navbera sine û şîe de tê xuyakirin. Hin lêkolînên ku ji Navenda RAND[27] derketine didin diyarkirin ku girêdanên etnîkî di civakên Libnan, Sûriye, Iraq û Ordunê de pir bihêz û xurt in. her rêkareke ku li dijî komekê li Sûriyeyê tê standin, bandoreke yekser li tîreya pê ve girêdayî ya li van welatên din dike. Lêkolîn didin diyarkirin ku piştgiriya leşkerî û lojistîkî ya ku êlên iraqî yên sinî pêşkêşî siniyên sûrî kirin, ji ber pabendiya wan a êlî û tîreyî ye. Heman mijar ji bo şîa jî derbasdar e. nakokî gihaşt alavên ragihandinê jî. Ya ku mijarê aloztir dike, kampên koçberiyê ne. di wan de, bêhêvîbûn û tirajediya û jiyankirin zehmettir dibe û nerazîbûn, tirs û tevlîhevî gelektir dibe. Ew jî ji ber

[27] Ji bo çavkaniyên zêdetir, Wîlyêm Yong û hinên din, dirêjbûna şer ber bi Sûriyeyê ve, nirxandina karîgerên ku alîkariyê di belavbşna tundiyê de dikin û rê li ber digirin, weşanger: RAND 2014, lînk: https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/research_reports/RR600/RR609/RAND_RR609z1.arabic.pdf

ku biratiya baweriyê rastî binpêkirin, kuştin û pîskirinê tên û rêjîmên desthilatdar zordariyê der heqê wan de dike. Ev tişt tev, xakeke berhemdar ji bo zêdebûna tundrewiyê peyda dikin. Ev yek şerên herêmê bi serbaz û perepêdana pêwîst tîmar dikin û dê herikîna koçber û penaberên îdyolojîk û hestên kînê yên ku tundrewiyê xurt dikin, zêde bike, nexasim di refên ciwanan û niştecihên ku heman bawerî wan li hev kom dike de. Ev yek jî rewşeke ewlehî ya lawaz peyda dike ku li ser tundiya xwînî vekirî ye.

Bi awayekî giştî, tundrewî komên girtî diafirîne. Ev yek jî weke bertekekê li hember hestên gefên derveyîn e. ev kom sînorên manewî weke çaçoveyekê ji nasnaeya xwe ya baweriyê re datîne û hestên erênî di hundirê komê de dimînin û her kesê derveyî wê weke jêdera şer û metirsiyê tê hesibandin, loma gerek e were hilweşandin an jê were dûrxitin. Her wiha cîhad pêwîst e da ku rûbera cih a vê baweriyê were firehkirin. Rûbera cih a taybet karîgereke sereke di diyarkirina asta dijminatiyê ya her komeke tundrew de dilîze. Zêdebûna mirovan di rûbereke teng de, mirovan ber bi sûcdariyê ve dibe. Ew jî bi rêya xwespartina li tundiya ku di bajarên sûrdarkirî de tê kirin û di taxên tevlîhev ên xizan û têrniştecih de. Mirov dikare vê yekê di biwarê îdyolojîkên cûr bi cûr de derbas bike ku di welatekî sînordar de yan di civakeke nehemaheng de dijîn. Di vê rewşê de, dijminatî di nav wan de zêde dibe û her aliyek dixwaze baweriya xwe belav bike. Tecrubeya derûnnas Existus Kinzel di sala 1969an de li ser hin girtiyan vê yekê tekez dike. Wî dît ku kesên tundrew di tundî û êrîşan de, li ser rûberên kesayetî yên berferehtir ji kesên ku tundiya wan kêmtir e, bêtir rijd in. lê belê tevî wê jî dibe ku ne gelekî rast be dema nirxên manewî yên olê weke sedemeke sereke ya tundrewiyê were hesibandin. Çimkî ol bersivek e ji bo xwesteka giyanî ya resen di mirov û civakê de. Di vê der barê de derûnnas Îrêk From dibêje[28]: ``Ez olê fêm dikin ku ew handerê raman û kar e ku komek tê de hevbeş e. ol çarçoveyekê ji bo birêvebirinê û mijarekê ji bo perestinê pêk tîne.`` Şaristaniyek ne berê û xuya ye ne di pêşerojê de tune ye ku ola wê tune ye…pêwîstiya ku mezhebekî hevbeş hebe ji bo mirovan bi rê ve bibe û mijara perestinê, pêwîstiyeke ku rayên xwe di hebûna mirovan de kûr birine``. Lê li hmberî desthilatê zordar ê ku her tiştî bin pê dike, ol di sepandina nerînên

[28] Îrêk From, ol û analîza derûnî, wergêr Fuad Kamil, weşanger: Pirtûkxaneya Xerîb, Skenderiyê, bê hejmara çapê, r25

xwe yên gewre û payebilind de ji bo parastina kesên bindest bi ser neket. Wate, ol li gor nerîna me ya hemdem, di bin destê siyasetmedaran de ye. Ev yek jî çûna tundrewiya olî ber bi rêbazekî bragmatî ji bo xurtkirina desthilat û desteseriyê şîrove dike. Tundrewiya ku weke berevaniya di ber kevneşopiyan de, dihêle pêvajoya pêşketinê sar bibe û dibe alavek di xizmeta berjewendiyên kesê serdest de. Lê li gor Ebdilrehman el-Kewakibî, ev yek dom nake: ``Her neteweyek, malbatek an jî kesekî ku di olê de tund bûye, sîstema jiyana xwe ji dest daye û di dunya û axretê de bi bin ketiye.`` palpiştên vê yekê gelek in. ya ku vê yekê tekez dike, ew e ku diyardeya tundrewiya di olê de nikariye di avahîsaziya desthilata yek sîstema siyasî de bidome. Dibe ku sedema vê yekê xwesteka desteseriyê ya hin komên olî yên tunrew be. Lê ji bo rêjîmên ku hê lidar in û di wan de tundrewiya serdestiyê heye, bê guman heye di her kêliyê de rastî şoreşeke gelêrî werin. Ev rêjîm hevpeymanên leşkerî û aborî girê didin û terora hundirîn pêk tînin da ku şoreşên li dijî xwe rawestînin, lê di dawiyê de her dê şoreş were lidarxistin.

Qutkirina girêdana hestî bi yên din re (çi kesek be, çi civakek be û çi jî desthilatek be) dihêle kîn li ba mirov zêdetir bibe û reftarekî hilweşîner li balê peyda dike ku girêdanên niştumanî û wijdanî yên ku rêza jiyana kesên din digire, diqetîne. Êdî danûstandin dibe bi rêya ihtîqarkirin, çewsandin û kuştinê. Dibe ku ev yek jî hovê di hundirê mirov de veşartî, derxîne.

Civakên tundrew, rêbazekî civakî û sîkyolojîk yê taybet bi xwe dadimezirînin. Nekarîna mirov a pêkanîna xwesteka xwe ya girêdana civakî ya xweş û pêwîstiya wî bi hêz, germahiya hestî û pêkanîna kesayeta xwe, windabûna semiyanên malê yan jî nakokiya bi  wan re, bandora hevalên xwedî hestên tundrew, asta xwendinê û ya pîşeyê ya nebirêkûpêk, girêdana şeref û sincan bi kolekirina jinê ve, xurbeta civakî, hestên zorlêhatinê û tunebûna dadmeniyê li derdora wî, ev hemû dihêlin mirov di çînên civakî û astên ramanî yên cuda de, ber bi tundrewiyê ve herin û tev li komên tundrew bibin. Nasnameya kesayetî di hundirê civakê de dihele û nasnameyeke komî ya nû tê afirandin ku hestên girêdana bi civakê ve desteser dike. Tundrewiya ku dibe sedema kuştina mirovên heman civakê di rûbereke erdê ya diyar de, ji ber nakokiyeke ramanî, sûcek e; her wekî reftarê dijberî civakê. Ew kuştinek an jî binpêkirineke bêsedem e; çimkî ew gefan li hebûna madî ya kesê tundrew yê ku bi hestên xwe yên tund tev digere naxwe. Ev berovajî

tundrewiya ku ji bo berxwedana li hemberî dijminekî ye ku ew dijmin dixwaze wî qir bike yan jî zordariya xwe li ser bisepîne.

**Karîgera siyasî û byolojîk:**

Derûnnas Îrîk Form dibîne ku  tu palpişt tune ne ku tekez bikin ku pêşiyên me şerxwaz û hezkerên kuştinê bûn.[29] Mirovê seretayî bi awayekî aştiyane bi derdor û cîranên xwe re jiyaye. Heya neçû jiyana bajaran, ew ziriz nebû. Dibe ku gelên êlî çanda çer di heman demê de bi navenda dewletê re bi pêş xistibe.[30] Bi vê guhertinê re, ew hişiktir û hilweşînertir bû. mirovê herî zêde seretayî, yê herî kêmşer e bi mirovan re. xuya ye pêşketineke hevrêz di navbera asta şaristanîbûn û hestên şer û kuştinê de heye. Li gor ku dîroknas tekez dikin, siyaset bi wateya xwe ya bragmatî dest pê kir, dema bajar ber bi sîstema dewletî ve çûn. Şer bû rêbazek ji bo pêkanîna armancên siyasî û weke rêbazekî sereke ye ji bo dabînkirina desthilat û gencîneyan.[31] wate, dewletê bikaranîna tundiyê li xwe girt û hewil da wê bi rê ve bibe û dema ku bixwaze bi kar bîne, wate şer ragihîne.[32] êdî çewsandin û teror bûn rêbazek ji bo her desthilateke ku dixwaze civakekê bindest bike û wê biçewisîne. Vê yekê jî tundî û teror di hundirê kesên tên çewsandin de kom kir û dibe ku di her kêliyê de biteqe dema derfet jê re peyda bibe. Ev yek jî weke bertekeke tolhildanê ye. Ji ber wê jî karîgera siyasî, stûna geşbûna komên tundrew yên ku tundiyê bi kar tînin.

Li gor armancên ku dixwaze pêk bîne, her mirovek zagonên xwe dadirêje[33] Zagonê heyî yên ku berovajî armancên wî, pûç dibin û êdî nema dikare bi wan re bigunce. Meylên wî yên derûnî ber bi wê armancê ve diçin û baweriyên wî di vê derbarê de tundrew dibin. Ji ber dijberiya zagonên her aliyekî, nakokî di navbera civak û mirov de yan jî di navbera desthilat û komek

[29] Golon Wilson, dîroka sûcdar a mirovan, sîkyolojîka tundiyê, wergêr: Dr. Rifet seyid Elî, çapa yekem 2001, weşanger: Koma Hûr a Çandî, Qahîre, r74.
[30] R. BRIAN FERGUSON; War Before History; Philip de Souza, ed. Thames and Hudson, 2008; pag 27.
[31] Ji bo agahiyê zêdetir, Evdela Ocelan Manefîstoya şaristaniya demokratîk, pirtûka pêncem, wergêr: Zaxo Şiyar, çapa duyem, 2014. PDF bê weşanger.
[32] Dr. Mistefa Hicazî, paşvemayîna civakî, derbasgehek bo sîkyolojiya mirovê çewisandî, çapa nehem, 2005, weşanger: Navemda Çandê ya Erebî li Darilbeyda, Mexrib, Beyrût Libinan, r182
[33] Alfirêd Alder, xwezaya mirov, wergêr: Adil Necîb Bişra, çapa yekem 2005, weşanger: Meclisa Bilind a çandê, Qahîre, r33

welatiyan de derdive û hêz tê bikaranîn da ku her aliyek nerînên xwe bisepîne. Ev yek jî wê rastiyê tekez dike ku hêz ne zagon, cîhanê kontrol dike[34] Piraniya armancên ku tundrewiyê pêk tînin, armancên siyasî ne; bêyî ku em zanibin ka ev armanc rast in an na. Ev armanc qalibê îdyolojîk yê ku wê dinimîne, diyar dikin. Hin armanc xwedî hestekî darîkalî-desteserî ne ku li dor desthilat û desteseriyê dizivirin an jî dixwazin xwe ji desteseriyeke ku li ser wan hatiye sepandin rizgar bikin; her wekî rêxistinên ku dixwazin sîstemên hukm ên tyokratîk an tolîtarî yan jî faşîzm ava bikin an jî bi rêya şoreşa li hermber zordariyê xwe rizgar bikin da ku sîstemeke siyasî ava bikin ku rêza mafên mirovan digire û hewil dide ewlehiya mirovî ji bo hemû gelên heman welatî peyda bikin. Hema ku komek mirovên tundrew tên birêxistinkirin û rêveberek ji wan re were danîn, karîgera siyasî tê der û dijminatî û şerxwazî ber bi derve ve tê birêxistinkirin. Li gor nerîna lêkolerekî sîkyolojîk ê ereb:[35] ``…Tovê tundrewî û faşîzmê her tim di civaka bindest û çewisandî de heye. Ew ji enerjiya gewre ya di hundirê mirovê çewisandî de ku dixwaze bi hêz bibe, desteser bibe û tolê hilîne, tê… gelê bindest û çewisandî, tiyê hêzê ye û ew amade ye ku bide pey pêşewayekî ku berê wî ber bi hêzê ve bibe. Jixwe ev pêşewayê wisa, pêşewayê faşîzm e. gel dide pey wî û xwe radestî wî dike…tundî bê bend û destpilîn bi ser aliyê din de tê rijandin û di encamê de ew aliyê din ji hêla wî ve tê wêrankirin. Li gor wan ev aliyê din jêdera şer û neqenciyê ye û gerek e ji kokê ve were qirkirin. Dergehên komkujiyên xwînî li pêşberî wan vedibe…``

Siyasetmedar tundrewiyê li ba hin mezhevan xurt dikin da ku di bin desteseriya xwe de bi kar bînin. Weke mînak, li gor bîranînên sultan Evdilhemîd:[36] ``li gor urfa osmanî, bi rêya dezgeha desthilatê dadwer û waliyên xwe ji aliyekî ve û ji aliyekî din ve bi rêya tekiyên ku li welat belav in û tê de derwîş û şêx hene, sultan raman û gazinên gelê xwe dinase. Sultan van nûçeyan kom dike û li gor wê welat bi rê ve dibe. Bapîrê min Mehmûdê

---

[34] Naûm Tişomiskî, desteserkirina ragihandinê, werger: Umeyme Ebdiletîf, çapa duyem, 2005, weşanger: Pirtûkxaneya Şerq a navneteweyî, Qahire, r53

[35] Dr. Mistefa Hicazî, paşvemayîna civakî, derbasgehek bo sîkyolojiya mirovê çewisandî, çapa nehem, 2005, weşanger: Navemda Çandê ya Erebî li Darilbeyda, Mexrib, Beyrût Libinan, r179

[36] Bîranînên sultan Evdilhemîd, wergêr: Dr. Mihemed Herib, weşanxaneya Darilqelem, Şam, çapa sêyem 1991, r158.

duyem, bi rêya zêdekirina derwîşên rêwî, saloxgerên xwe zêdetir kirin…``vê zilamî hewil da ku xwesteka ingilîzan a desteserkirina misilmanên sune li Asyayê têk bibe, ew jî bi rêya şandina seyid, şêxên rêyên sofî û derwîşan bo wan û girêdana wan a manewî bi dewletê ve û di heman demê de parastina dijminatiya wan a bi ingilîzan re û di heman demê de parastina berdewamiya dewleta wî.[37] Heman tişt li ser rêxistin û sîstemên tyokratîk ên di dema me ya niha de derbasdar e. vê yekî jî xakeke berhemdar ji bo tundrewî û şerxwaziyê afirand ku heya niha hê bandorên wê li ser Hindistan, Pakistan û Avganistanê berdewam in. komplû ji bo parastina desthilatê hebû û tu xizmet neda pêşketina gelan û nehişt ku ew çanda gelên din ên pêşketî binasin. Di heman demê de, sultan pêrewên xwe yên dilsoz dişandin da ku di akademiyên ewropî yên siyaset, zagon û leşkerî de bixwînin. Karîgera siyasî ji her du karîgerên borî metirsîdartir e, çimkî ew tundrewiya birêvebirî bi awayekî birêxistinkirî geşpêdan dike da ku armancên wan werin pêkanîn. Di heman demê de, karîgera siyasî bi rolekê di avakirina tevgera wehabî de lîst û hişt ku bi dehan di sedsala 18em de tev lê bibin. Ev tevger gelekî tundrew bû û weke berteka erebên çewisandî li hember zordariya saziyên dewleta osmanî bû. Ev tevger ewqasî tundrew bû ku her kesê di hundirê tevgerê de xwediyê maf didîtin û her kesê derveyî wê xwîn, mal û namûsa wî ji wan re helal bû. di encamê de binpêkirinên mezin der heqê gelek kesên bêsûc de pêk hatin. Tevger bi rêya hêzê hewil da xwe ji desthilatekê rizgar bike da ku yeke din ava bike. Jixwe ev rewş li ser piraniya tevgerên islamî yên tundrew ên ku di pey re hatin derbasdar e.

Ji tiştên borî tê diyarkirin ku karîgera siyasî û îdyolojîk, sedema sereke ya teqîna enerjiya tundiyê ku berî wê bi rêya karîgerên derûnî û civakî di nava mirov de hatiye peydakirin. Di her halî de avakirina sîstemeke siyasî ya tyokratîk an tolîtarî yan jî faşîzm, armanca sereke ya her rêxistineke tundrew e. ew jî piştî ku pêşewayên tundrew ên siyasîm zansitperes, olperest an jî neteweperest agirê vê tundrewiyê dadin. Ev kes bi hişan dilîzin da ku berê mirovên radîkal ji pirsgirêkên wan biguherin û berê wan bidin çareseriyên pêkan û birina enerjiya wan ber bi armancine derw û sexte ve da ku armancê xwe yên siyasî û madî pêk bînin. Ew jî bi rêya noqkirina wan di çirava cîhaneke derew û efsanewî de ku berê dijminatiya wan ji kesê desteser

[37] Heman jêdera borî, r148

diguhêre.[38] Ew xwe dispêrin rêkara razandina bi rêya hêza hişî da ku pêrew werin kontrolkirin.[39] Pêşewayê tevgera heşaşînan ``Hesen Sebah`` ev rêbaz dimeşand. Bêhîvîbûna ku kesên bindest û çewisandî û piştguhkirî dijîn, enerjiya wan a derûnî û hiştî kêm dike û dihêle ew di navbera xew û şiyarbûnê de bin ûbi vî awayî çarçoveya hiştî teng dibe. Kesên çewisandî, bê hest in û ne li ser hiştê xwe ne (li gor Firowid)[40] di encamê de bandorkirina li wan hêsan dibe û bi hêsanî dibin kesine tundrew. Kesê tundrew ango nijadperest, kesekî têrbawerî ye, çimkî pêşewayên wî mejiyê wî pûç kirine û vîna xwe guhestinê da ku dijminê diyarkirî bikuje û wî hilweşîne.[41] weke mînak, komkujî û pêvajoyên kuştinê yên hovane ya ku Daişê û çeteyên Ixwanan ên girêdayî dewleta Tirk an jî rêjîma Sûriyeyê li herêmên dagirkirî der heqê zarok, jin, ixtiyar û birîndaran de dikirin, bêyî ku tu hestên mirovane li ba wan hebin ev komkujî dikirin. Nerîna wan a der barê qurbaniyên wan de, nerîneke hovane bû ku di bin bandora ferman û rênimayên serwerên xwe de bûn. Sûcdarî, encama helwestên hişmendî yên neyînî ye. Helwestên neyînî jî li bijarteyên di mekanîzmeya têgihiştinê de vedigerin[42] ku ew jî xwe dispêrin çawaniya fêmkirina peyv, hevok, mezhebên hizirî û reftarên girêdayî wê. Li gor lêkolerekî, ew mekanîzmeyeke metirsîdar e, çimkî ew bi hêsanî dibe desthilateke ku tê perestin.[43] Kesên bindest nimûnetiya giştî ya peyvên dijberî jiyana heyî wan dikişîne. Ev yek jî bersiva wê yekê dide ka çima mucahidekî cezairî yan jî avganî ji wan qas deveran tê da ku şerê kurdan bike, tevî ku piraniya kurdan misilman in û sinî ne. lê pêşewayên olî yên van mucahidan yên ku bi tundrewiya AKPê û Ixwan û Daişê bandor bûne dane diyarkirin ku ev kurd gawir in û gerek e werin qirkirin. Hin ji wan piştî ku rastî

[38] Dr. Mistefa Hicazî, paşvemayîna civakî, derbasgehek bo sîkyolojiya mirovê çewisandî, çapa nehem, 2005, weşanger: Navemda Çandê ya Erebî li Darilbeyda, Mexrib, Beyrût Libinan, r111
[39] Golon Wilson, dîroka sûcdar a mirovan, sîkyolojîka tundiyê, wergêr: Dr. Rifet seyid Elî, çapa yekem 2001, weşanger: Koma Hûr a Çandî, Qahîre, r44.
[40] Sîgmond Firowid, Mûsa û Tewhîd, wergêr: Corc Terabîşî, çapa çarem, 1986, weşanxaneya Telîe, Beyrût, r133.
[41] Birnard Şofîîh, Nijadperest, dînbûna baweriyê, wergêr: Dr. Qasim Muqdad, çapa yekem, 2017, weşanxaneya Nînewa, Şam, r91.
[42] Golon Wilson, dîroka sûcdar a mirovan, sîkyolojîka tundiyê, wergêr: Dr. Rifet seyid Elî, çapa yekem 2001, weşanger: Koma Hûr a Çandî, Qahîre, r147
[43] [43] Îrêk From, ol û analîza derûnî, wergêr Fuad Kamil, weşanger: Pirtûkxaneya Xerîb, Skenderiyê, bê hejmara çapê, r41

nas kirin, matmayî man û ji herêmê vekişiyan. Mirov bi guhertina helwestên xwe yên mejî, dikarin jiyana xwe biguhêrin. Nexasim ên ku hatine çewisandin. Yek ji analîzên derûnî ya civaka bindest dibîne ku[44]``kesên desteser berê xwe didin olê da ku urfên ku xizmeta berjewendiyên wan dikin werin rûniştin. Ew desteseriya kevneşopiyan bi rêya ayet û hedîsan bi cih dikin da ku şik û guman nemînin. Eger ne wisa be, baweriya mirovên bindest ê ku hêviya wî di axiretê de heye, dê ji hev biketa… ew ji olê tenê aliyên ku desteseriya wan tekez dike û urfên heyî û sîstema çînî jî xurt dikin, diyar dikin... lê aliyên şoreşgerî, rizgarî, azadî, afirandin, ghertin, dadmendî, lehengî û cîhada rasteqîn a di ber Xwedê û rûmeta mirovan de di olê de, ew perdeyekê bi ser de berdidin da ku di tarîtyê de bimînin. Bi vî awayî her tişta nûjen ku alîkariya mirov di rizgariyê de dike û çarenûsa xwe kontrol dike, dibe tiştekî derveyî olê ku nayê pejirandin. Her wiha her tekezkirineke li ser maf, dadmendî û rûmetê dibe jirêderketin… ev sarbûn, xizmeta komeke biçûk dike ku piraniya desthilatan di destê wê de ye…``

Dema komek di kesayeta serwerê xwe yê desthilatdar de bihele. Taybetmendiyên madî yên vî kesî çawa bin, ew bi hest, reftar û rêbazê xwe de bi kesayeta serwerê xwe re dihele. Di heman demê de em gelek komên ku ne girêdayî serwerekî desteser in ango girêdayî serwerekî ne tundrew in, bi komeke din a ku ji aliyê axlaqî ve weke wê ye re, bi hêsanî dijî. Weke mînak, neteweya ku ji gelek etnîkan pêk tê, bi domana demê re nasnameya xwe ya siyasî dadimezirîne û êdî bi hatina serwerekî tundrew re, ji bo tundrewiyê amade dibe. Ev yek jî têkiliya byolojîk a di navbera kesayeta serwer û karîgera siyasî di çêbûna diyardeya tundrewiyê de tekez dike. Ji aliyekî din ve, bandora siyasî bi rola xwe di çêbûna tundrewiyê de dilîze. Dema welatek nikaribe nifşekî li ser esasê hestên welatîbûnê ava bike û desthilat li ser çewsandina siyasî û tengkirina azadiya nerînan tekez bike û tê de dadmendiya civakî û aborî di siyaseta hundirîn de tune be, hestên biyanîbûnê di welat de zêde dibin. Ji ber ku piraniya xelkê naxwazin bi karên kuştin û êşkenceyê rabin, tên haderkirin. Ji bo pêkanîna vê yekê jî gerek e tirs di dilê wan de were çandin, ew jî bi rêya lîstina bi hişê wan bi rêya derewên

[44] Dr. Mistefa Hicazî, paşvemayîna civakî, derbasgehek bo sîkyolojiya mirovê çewisandî, çapa nehem, 2005, weşanger: Navemda Çandê ya Erebî li Darilbeyda, Mexrib, Beyrût Libinan, r105

ragihandin û propogendayê û avakirina mirovan a siyasî bi awayekî ku xizmeta siyaseta pêşewayan bike. Ya ku vê rastiyê tekez dike, weke mînak, buhaneyên berevaniya di ber ewlekariya neteweyî ya tirkî de ku pê re komên tundrew ên girêdayî desthilata tikrî ji hêla rêjîma tirkî ve tên kirin, da ku operasyonên qirkirina der heqê kuran de û êrîşên xwe yên bi ser tevgerên erebî û tirkî yên demokratîk de rewa bike û li hemberî geşbûna hişê siyasî yê şîa raweste. Xuya ye piştî domandian desthilata wî zêdeyî 20 salan, ew heya astekê di vê armanca xwe de bi ser ket. Her wiha karîgereke siyasî ya ku di diyardeya nakokiya di navbera şîa û sine û di navbera tîreyên her du mezheban de tê dîtin. Ev vê yekê bi awayekî zelal di rewşa siyasî ya libnanî û iraqî de dibînin. Tundrewiya neteweyî (şofînîzm) li ser heman rêyê dimeşe. Li vir bisûd e ku mirov helwesta şofînîzm a ku ji dewleta tirk tê der were diyarkirin ku ev yek di demekê de tê ku pilana çeksaziya rojhilat (weke ku tê binavkirin) pêk tê ku bi rêya vê projeyê zêdeyî du melyon kurdên bakurê Kurdistanê ber bi deverên dûr li rojavayî çemê Firatê tên dûrxistin. Ev yek piştî çewsandina şoreşa Ş. Seîd û îdamkirina wî li gel hevalên wî piştî sala 1925an pêk hat. Di gotareke ku ji hêla Rojnameya Hakimiyetî Milî ya tirkî ve hat weşandin, ev gotar di dehê hezîranê 1930î de hat weşandin.[45] ev gotar nimûneyeke zindî ya rêbazê şofînîzm e, tê de wisa hatiye gotin: Bê guman em vê daxwazê (daxwaza kurdan a serxwebûnê) weke pêkenokekê dibînin. Gelê ku zimanê wîji 200 peyvî tenê pêk tê, tenê qunçikek li nîvê Aferîkayê yan jî çolistaneke wê zêdeyî wî ye, lê ji bo Asyayê ku dergûşa kevintirîn şaristaniyan e, ew nikare daxwazeke wisa bipejirîne.`` ev nerîn nimûneyeke guncav a asta hovîtî û derewkirinê ya ku tundrewî bi aliyê xwe yê neteweyî gur dike, dinimîne. Ev nerîna tundrew, nerîneke ihtîqarkirin û pîskirinê der heqê yekê ji çandên resen û kevnar ên herênê dinimîne û mafê wan ê jiyankirina di welatê xwe de ji wan didize. Ev yek pêvajoyên komkujiyê yên ku dewleta tirk der heqê kurdan de pêk tîne, şîrove dike. Ew destdirêjiyê li şaristaniyê dikin û xwe dikin nûner û xwediyê şaristaniya Asyayê. Xuya ye nerîna vê gotarê xwe dispêre gotina şofînîzm a tirkî ya navdar ku dibêje: ``Kurdê baş, kurdê mirî ye.`` em heman helwestên şofînîzm di nakokiya filestînî-israîlî de dibînin.

[45] Dr. Ehmed Kemal Mezher, raperîna 1925 li Kurdistana Tiriiyeyê, çapa yekem 2001, Beyrût bê weşan, r42.

Ji aliyekî din ve û li gor teoriya şûna pinpinîkê[46] dibe ku hin komên tundrew berê xwe bidin tundiyê di dem û cihekî diyar de, weke stratejiyekê be da ku bandorê li guhertina siyaseteke pêşerojê di sîstemên herêmî de bikin û rewşekê biafirînin ku alîkariyê bi birayên wan ên baweriyê bike û di encamê de rewşeke baştir ji bo damezirandina rêxistinên xwe û pêkanîna armancên xwe biafirînin. Afirandina rêxistina Daiş, piştî çend salan ji encamên bûyerên îlonê 2001 pêk hat ku ev bûyer jî piştî çend salan ji bûna Avganistanê weke kiwara cîhada cîhanî li dijî Sovyetê pêk hatin ku berî wê jî bi çen salan koma Ixwanan hat damezirandin ku ew jî piştî damezirandina tevgera Wehabî ya ku şerê zordariya osmanî dikir, ava bû…heman tişt ji bo geşbûna hêzdariya rêxistinên şîî piştî desteserkirian koma xumeynî ji desthilata îranî re derbasdar e. Heman tişt ji bo tevgerên berxwedana 1979an a gelêrî ya ku rêjîma şah hilweşand derbasdar e. Mînakên vê yekê pir in ku nayên jimartin. Yek ji mînkên wê yên din, tevgerên berxwesana gelêrî yên tundrew li hemberî rêjîmên zordar û berxwedana li hemberî çewsandina siyasî. Berxwedana li hember êrîşa fransî ji hêla artêşa ala reş a çînî-vêtnamî ve di sala 1857 ku ji cotkaran pêk dihat, rê li pêşiay şoreşa vêtnamî ya navdar li dijî êrîşa fransî û amerîkî ji sala 1955 heya 1975 vekir. Her wiha damezirandina PKKê di sala 1978an de û têkoşîna wê ya bi dehên salan li dijî zirdariya dewleta neteweyî ya tirkî, rewşên guncav li pêşberî kurdan vekirin da ku karibe li hemberî qirêjtirîn pêvajoyên qirkirina komî ji hêla rêjîmên zordar û neteweperest û islamî û herêmê û çeteyên wan ên tundrew ve pêk dihat li ber xwe bidin. Gelek mînakên din jî hene…

Karîgera siyasî bandorê li karên terorîst ên girêdayî tundrewiyê dikin. Terorîst yek ji cûreyên tundiyê de ku dibe kesê lawaz xwe bispêriyê da ku li hemberî kesê ji xwe bihêztir raweste. Xuya ye terorîst bi wateya xwe ya ziman, xwedî girêdaneke byolojîk bi xwezayê re ye. Çimkî gelek jîndar û riwek şêwe, reng û qebarene cuda cuda li xwe digirin da ku nêçîra xwe bitirsînin. Dema jîndar rastî êrîşan tên, çekên xwe yên xwezayî li hemberî wan êrîşan bi kar tînin.tundiya bêsedem, hovîtiyê dinimîne. Tundrewiya di tundiyê de dema bêsedem be, ew şer û sûcdarî bi xwe ye. Terorîsta ku di navbera mirovan de pêk tê weke karekî yan jî reftarekî ye ku tirsê li dijî mirovan pêk

[46] Wikipedia, the free encyclopedia; Black Flag Army; Link: https://en.wikipedia.org/wiki/Black_Flag_Army
Mimir :الرابط؛ موسوعة اللغة العربية؛ قوات العلم الأسود /https://mimirbook.com/ar/e4d772249b7

tîne da ku armancên siyasî pêk bînin. Ev yek jî rola karîgera siyasî di derketina tundrewiyê de diyar dike. Wisa lê hatiye ku têgeha tundrewiyê bûye cêwiya têgeha terorê.

Xuya ye hestên şerxwaziyê yên rêxistinekê, enerjiyeke kêşwer ku kesên çewisandî û bindest bi ser xwe de dikişîne, peyda dike. Çimkî ev kes astengiyan ji ber kîn nerazîbûnê dikişînin û li derfetên tolhildanê bi awayekî kor digerin. Bi têgeha terorê hatiye lîstin, ji bo jirêderxistinê. Bi taybet ji hêla rêxistin û sîstemên ku dixwazin desteseriya xwe li ser welatine din bisepînin. Ew her berxwedaneke li dijî hêzdarî û desteseriya wan, weke terorê bi nav dikin, da ku rewatiya berxwedanê pûç bikin û terora xwe ya li dijî gel rewa bikin. Di heman demê de, hêzên siyasî yên ku rêza mafên mirovan dikin û hewil didin ewlehiya mirovan misoger bikin, ji mafê bikaranîna gotina ji bo karên hovane yên ku ew rêjîm û rêxistin pê radibin, mehrûm dikin. Em vê yekê di helwesta dijminane ya dewleta tirk bi serkêşiya Erdogan li hember Rêveberiya Xweser a demokratîk a li bakur û rojhilatê Sûriyeyê dibînin. Rêveberiya Xweser şerê milîsên terorîs û çeteyên mîna Daiş, Cebhetinesre û Ixwan û ji bilî wan dike. Lê tevî wê jî dewleta Tirk, Rêveberiyê bi terorê bi nav dike û hewil dide hemû têkiliyên wê yên siyasî bi civaka navneteweyî re pûç bike. Di heman demê de, hewil dide êrîşî herêmên bakurê Sûriyeyê bike. Dewleta Tirk Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî dagir kirin û pêvajoyên paqijkirina nijadî li wan pêk anîn da ku asta tirsê bixe dilê piraniya niştecihan ji bo pêkanîna mebestên faşîzm, siyasî û aborî. Ev rêbazê Daiş û hêzên siyasî û leşkerî yên sûrî yên girêdayî Ixwanan jî bû. jixwe tê zanîn ku paqijkirina nijdadî yek ji wan reftaran e ku mejiyê terorîstan ê ku di nav tundî û hovîtiyê de noq bûye, dinimîne.[47]

Xumeynî di semînereke xwe de wisa dibêje:[48]``…heya niha leşkergehên rojhilatî û rojavayî di biwarê peydakirina kêfxweşiyê bo mirovan, di nakokiyan de ne. her wiha ew di weşandina qenciyên sincî û dîtina pêşketineke derûnî û giyanî weke pêşketina madî de di nava nakokiyan de ne. ew heya niha nikarin çareseriyekê ji arîşeyên xwe yên civakî re bibînin,

[47] Dr. Şakir Ebdilhemîd, şîrovekirina derûnî ya tundrewî û terorîstê, weşanxaneya Skenderiyê, Misir, 2017, r110.

[48] Îmam Rohulah el-Xumeynî, hikûmeta islamî, dersên fiqhî ku ji bo xwendekarên olzanînê li Necefê di bin navê Wîlatiyulfeqîh hatiye pêşkêşkirin. 1389K, bê weşanger û hejmara çapê, r18

çimkî çareserkirina wan kêşeyan û tunekirina êş û dijwariyê, hewcedarî giyanekî bawermend û sincî ye…jixwe em tenê xwedî van bawerî, sinc û zagonan in…`` ev yek nerîna serwerekî ku beşdarî şoreşeke gelêrî bû dinimîne ku bi rêya wê şoreşê rêjîma şah a zordar hilweşand û paşê wî desthilatî bi xwe û koma xwe ve girêdan û her kesê ji vê desthilatê nerazî bû, kuşt an sirgûn kir. Her wiha wî dest bi şerekî îdyolojîk bi rêjîm û rêxistinên erebî yên selefî û neteweyî re kir. Ji aliyekî din ve şer bi Israîl û Amerîkayê re kir û ew weke şeytanê herî gewre bi nav kir û Yekîtiya Sovyetê bi navê şeytanê biçûk bi nav kir. Gelek caran tundrewiya komekê weke bertekê ye li hemberî tundrewiya komeke din e. her komek misogeriya mayîna xwe bi qirbûna koma din ve girê dide. Fobyek û nakokiyeke mayînde di navbera baweriyan de heye û her yek ji wan navinan li yên din dike ku wateyên nijadî û olî yên dagirtî kîn dihewîne û hestên ku ew ji aliyê din ji aliyê exlaqî û nijadî ve payatir e di nava xwe de dihewîne. Aliyê din weke şeytan tê hesibandin. Jixwe şeytan hemû cûreyên şer, bêexlaqî û nebaşiyê dihewîne. Ew mesxek e ku kesê din ên ku ji aliyê ol, netewe, mezheb û girêdana xwe ya nijadî û niştumanî ve ne weke wî ye, pê tê binavkirin. Ev wêne li ba hemû xwediyên baweriyên cihêreng heye. Ne tenê wisa lê belê di nava heman baweriyê de bi rêya tîreyan heye.[49] Aliyek dixwaze bi rêya kêmkirina qedrê aliyê din wî ji aliyê manewî ve bikuje. Mirov dikare ji bê yekê re , propogendaya tundrew bibêje ku bi rêya wê kesên cuda weke hovan tên dîtin û gerek e mirov jê bitirese. Ev yek jî dihêle mirov bibin dijminên wî da ku xwe jê biparêzin. Jixwe propogendaya dîmagojî di astên xwe yên jorîn de vê yekê dike. Tundiya li hemberî hev, bijarteya tekane ya tundrewan pêk tîne, da ku kesê dijber kontrol bike, heta ku ev tundî berovajî nirxên wê komê bin. Tundî, dihêle tundrewiya komê zêdetir bibe da ku bertekên tolhildanê yên aliyê din raweste. Ji aliyekî din ve, şîretkarî û şîrovekirina şerîet û deqên pîroz li gor xwe , dihêle nerînên kesên tundrew û kirinên wî tundtir bibin. Weke mînak, şerîetkarên Daişê hin şîrove derxistin da ku kesên din ên ku ne weke wan in gawir derxînin, da ku mal û mulkê xelkê bidizin. Jixwe wan di vê yekê de xwe spart destûra fiqhê ya ku dibêje: ``ji malê gawiran dabara xwe bikin.`` hat dîtin ku piraniya kesên malê wan hat dizîn misilman in û pabendî rênimayên islamê dibin. Xwediyê baweriyên tundrew nikarin cudahiyê bixin di navbera

---

[49] Heman jêdera borî

ol/îdyolojîkê û desteserî û tundiyê de. Ew sêwirandinên xwe û pirsgirêkan diafirînin û xwe weke dadmend û hakiman dipejirînin û cezayan li ser xelkê disepînin. Ji aliyekî din ve, hin kes dibînin ku kêmbawerî ango jihevtirsîn, sedemeke sereke ya tundrewiyê ye. Tirsa ji mirinê ya ku gefan li kesekî ya kesekî li ber dilê wî şêrîn dixwe, dibe ku bihîle mirov kuştin û êşkenceyê bike. Weke mînak, dibe ku mirovek bi navê parastina zarok û hevjîna xwe, kuştinê bike yan ziyanê bigihîne gelek mêr, jin, zarok û pîran. Tirsa ji kesên berberî, dibe ku mirov bike berberî.

Ji aliyekî din ve, gelek caran girêdan di navbera tundrewî û terorê û xwequrbankirinê de heye. Alieyk bi navê şehadetê wê pîroz dibîne û aliyek bi navê terorê jê nefret digire. Bi rêya şopandina gelek çandan, tê dîtin ku xwequrbankirin, rêbazek ji bo pêkanîna payebilindiyeke kesayetî ye. Ol û çand,kesên şehîd pîroz dikin û wan weke lehengên efsanewî dibînin. Çimkî ji adetên mirovan e ku kesên ji mirinê ditirsin, pîs bibînin. Îcar pîrozdîtineke mirovî û exlaqî ya şehîdan heye. Xuya ye ew weke xerîzeyekê ye ku bi rêya wê mirov berevaniyê di ber koma ku mirov wê pîroz dibîne de ye. Em vê yekê di dawiya Şerê Cîhanê yê Duyemê de li ba tîmên kamîkazî yên japonî dibînin. Reftarê bêpilan ê hin siwarên balafira çarem a ku teroran dixwest bi rêya wê di 11ê îlona 2001ê de êrîşekê bi ser Newyorkê de pêk bînin, ku van siwareyan karîbû zora kesên balafir revandine bir. Em heman reftarê li ba hin şervanên kurd ên YPG û YPJê dibînin ku ew bi pêvajoyên xwekuştinê rabûn. Her wiha em nikarin kesên xwequrbakirî yên vêtnamî, filestînî, kurd û ji bilî wan ji bîr bikin.  Kesên ku xwe qurban dike, digihêje wê baweriyê ku di encama mirina wî de dê xêreke giştî pêk were. Bi awayekî giştî karê xwequrbankirinê karekî berevaniyê ye, lê êrîşa xwekuştinê ya ku tu cudahiyê naxe di navbera dijmin û kesên bêguneh de, ew sûcek tê hesibandin. Her wekî êrîşa  xwekuştinê ya ku li bajarê Qamişlo di havîna 2016an de ji hêla Daişê ve pêk hat. Gelek caran komên ku bi êrîşên komkujiyê radibin, xwe dispêrin van hestan da ku kesên xwekujer ji rê bibin û wan di pêkanîna karên tund de ku xizmeta siyasetên wan dikin, bi kar bînin. Jixwe ev halê piraniya komên tundrew ên olî û neteweperest e. ev kom kesên dîtir gawir dibînin û wan pîs dibînin. Ji ber wê jî cûreyê tundrewqiyê çabe jî, karê xwequrbankirinê ji bo berevaniya di ber civaka xwe de, weke karekî rewa tê hesibandin lê êrîşa xwekuştinê ji ob pêkanîna armancên siyasî yên desteserî, ew weke êrîşeke nerewa tê hesibandin.

**Karîgera aborî:**

Gelek lêkolînên enterbolojîk ên ku xwe dispêrin qerqodeyên mirovan ku li herêmên cihêreng ên cîhanê hatine dîtin, amajeyê bi rola karîgera aborî di rûdana şeran di navbera mirovan de berî 12000 sal dikin.[50] Dema mirov, piraniya komên tundrew dişopîne, dibîne ku armanca hevbeş a piraniya wan , pêkanîna ewlehiya aborî ya ku bi îdyolojîka wlê hatiye zagonkirin. Her wiha tê dîtin ku piraniya kesên girêdayî wê, ji jîngehên xizan û dewletên ku qeyranên aborî û dorpêçî li wan heye, tên. ji aliyekî din ve, komên tundrew, jêdereke aborî ye ji bo gelek kesên ku nikarin çalakiyên aborî yên giştî bikin da ku dabara jiyana xwe bikin. Ev kes sozan didin ku eger ew gihaştin, desthilatê, ew ê rewşa aborî ya pêrewên xwe baş bike. Li hemberî dilsoziya endamên xwe, kom fonekî mehane dide wan, an jî rê li ber xenîmeyan bi rêya dizî û şelandinê vedike, yan jî rê dide endamên xwe yên dewlemend da ku berjewendiyên xwe yên aborî pêk bînin. Her wiha kesên rewşa wan a aborî baş e jî, ber bi tundiyê ve diçin, weke mînak, baweriyeke wisa heye ku pereyên kendava ereban ên zêde hiştiye ku diyaredeya rêxistinên radîkal û tundrew ên ku xwe dispêrin cîhada tund di hemû aliyên cîhanê de, derkeve pêş. Ya ku ji bo kesê dewlemed ê tundrew girîng e, ew e ku perestgehan ava bike û karên xêrê bi awayekî bike ku xizmeta baweriya wî bikin, çimkî bi vî awayî ew berjewendiyên xwe yên aborî di pêşerojê de diparêze. Ew jî dema birayên ên baweriyê bigihêjin desthilatê.

Hêjayî bibîranînê ye ku qasiya binpêkirinên ku mirov dikin, her ku bêtir ev kes bi komekê ve tê girêdan ku bi rêya wê dixwaze tolhildanê ji qurbaniyê bihilîne, zêde dibe. Heke mirov ne tundrew be jî, lê danûstandina wî ya domdar bi kesên tundrew re, dê wî ber bi tundrewiyê ve bibe, jixwe ev yek di rêxistinên tundrew ên desthilatdar de heye, lê rêxistinên tundrew ên şoreşger, karîgera aborî ji bo wan xwedî bandoreke mezin e di handana wan de. Desteseriya olîgarişiya û rêjîmên zordar li ser aboriyê û jiyana xizanî, paşvemayîn û tirajedî ya ku niştecih tê de dijîn, dihêle şoreş were ragihandin. Babet girêdayî berevaniya di ber rûmet û hebûnê de ye, çimkî bêyî ewlehiya aborî, rûmet û hebûna mirov tune ye. Her ku qasiya gefan li vê ewlehiya aborî zêde dibe, ewqasî tundrewiya şoreşgerî zêde dibe. Ji ber wê jî karîgera aborî,

[50] For more see: R. BRIAN FERGUSON; War Before History; Philip de Souza, ed. Thames and Hudson, 2008.

dihêle nakokî di naskirina kesê tundrew û çete ji kesê şoreşger, derdikeve. Ev babet nakokiya di navbera komên tundrew de derbas dike û digihêje asta nakokiya di navbera dewletên tundrewê îdyolojîka xwe de. Her wekî nakokiya aborî di navbera cemserên sosyalîzm û sermayedarî de di dema şerê sar de. Her wiha ev yek tê diyarkirin di nakokiya di navbera rojhilat û rojava de (weke ku nav li wan hatiye kirin).[51] Di navbera pirs û ixrîqan û sasanî û romanan de û di navbera ereb û rûman de û di navbera misilman, xaçperest û pirsan de û di navbera tirk û sefewiyan de…hwd. Xuya ye karîgera aborî xwedî bandoreke mezin e di diyarkirina karîgerên derûnî, civakî û siyasî de û di derketina diyardeya tundrewiyê de. Karîgera aborî mîna enerjiyekê yan girêdanekê ye ku bandora van her sê karîgeran li hev diyar dike. Tundrewî weke rêbazekî berevaniyê, ji hêla hestên tirsa ji metirsiyên ku gefan li ewlehiya aborî ya mirov dixwin ve tê livandin. Çimkî ev karîgereke sereke ya xerîzeya meyînê li kêleka zayîn û hêzê pêk tîne. Her wiha tundrewî weke rêbazekî xurtkirina desthilatê, ji bo desteseriya li ser gencîneyan û têrkirina xwestekên xwe yên bidestxistina tiştan, tê bikaranîn. Ewlehiya aborî weke bingeheke sereke ya têgeha ewlehiya mirovî pêk tîne, lê rêbazê ku ev ewlehî bi rêya wê pêk tê, xwe dispêre, berferehiya çarçoveya hişmendiyê û baweriyê tê de û xwe dispêre rewşên dem û cih û raman û sêwirandinan. Ji bo kesên dewlemend jî , dibe ku karîgera aborî ji wan re bibe handerek ku wan ber bi rêbazekî tundrewiyê ve bibe, ew jî bi rêya livandina hestên berpirsiyariyê der heqê birayên baweriyê de ku li ser fez dike ku alîkariya aborî pêşkêşî wan bike yan jî rewşa komê ya aborî ya baş bi kar bîne da ku gencîneyên xwe zêdetir bike.

**Karîgera bandora derveyîn:**

Bi çêbûna sîstemên dewletî re ku bi handana mîtyolojyayê û paşê ol, zansitperestî û lîbraliyê, ji sedema somer û heya dema me ya niha û geşbûna parvebûna rêjeyî ya civakê di navbera çînên serwer û koleyan de, xwesteka imiryalîzmê li ba çîna serweran geş bû[52] û hewil da serweriya xwe bi rêya

[51] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r94.

[52] Impiryalîzm bi wateya xwe ya berfereh ku hemû şêweyên berferehbûn û desteseriyê dihewîne. Ev yek bi taybet li ser neteweyên ku dixwazin bibin impratorî pêk tê, Samî Zibyan û hinên din, ferhenga têgehên siyasî û civakî û aborî, çapa yekem, 1990, weşanxaneya Riyad el-Reyis , Lundin.

hêzê li ser hemû civakên din bi cih bîne û rûberên xaknîgarî yên berferehtir desteser bikin. Serwerî dixwaze çend aliyên jîndetî desteser bike. Ew jî weke stratejiyekê da ku mayîna xwe mirosger bike. Her wekî beşa aborî, rêyên çûn û hatinê yên bejahî û deryayî û ji bilî wan. Her wiha aliyê çandî bi rêya sepandina çanda desteseriyê li ser kesê têkçûyî (çi ev çand olî, ziman, îdyolojiyek be). Ji aliyekî din ve pêkanîna kesayeta nêrgizî ya statûya siyasî ya kesên desteser bi rêya veguherandina serkeftin û komkujiyan ber bi lehengiyan ve ku bi vî awayî serkeftina xwe ya nijadî, çandî û şaristanî xurt dikin.[53] Ji bo rawestîna li hemberî vê xwesteka han, gelek dewletan hewil daye berevaniya xwe heya astekê xurt bikin ku êdî karibin siyaseta xwe ya impiryalîzm li hemberî welatên din pêk bînin.[54] Her wekî Çîn, Rûsya, Îran û Tirkiye. Ji ber wê jî ev xwestek, xwesteka mirov a ku di koka hestên wî de dinimîne.

Koçberiyên mirovan, ji berbanga dîrokê ve û şerên ku ji hezarên salan ve hatine kirin û zêdebûna hejmara mirovan bêyî hemahemgiyeke dîmografîk di xaknîgariya cîhanê de û sînorên siyasî yên ku sedsala 20em hatin dîrin, hiştin ku bi dehan etnî û bawerî bi rêjeyên neweke hev di rûberên sînordar de çarçove bibin. Vê yekê jî atmosfereke guncav ji bo pêşbaziya avakirina dewletên neteweyî, olî û zanistperestî, peyda kir. Vê yekê hiştiye ku şerên dijwar di navbera kesên dijber û newekhev de pêk werin. Di heman demê de hin welatan karîbû selametiya xwe ya navxweyî biparêzin, ew jî bi rêya xwespartina li demokratîka lîbralî ya rêjeyê û hin din xwe di vê yekê de spart hêz û zordariyê. Lê vê yekê çareseriyeke domdar ji bo wan welatan peyda nekir. Ew jî ji ber rikberiya îdyolojîk di navbera komên siyasî yên tê de ku bi rêya karîgerên derûnî, siyasî, civakî, aborî û çandî han dibin.[55] Xwesteja impiryalîzm a li ba dewletanm ew heya astekê heman xwesteka li ba êl, partî û mezhebên olî ye. Hin dewlet vê xwestekê bi kar tînin da ku tevlîheviyê li welatên ku lawazî di rewşa wan a siyasî û civakî de heye, pêk bînin. Nexasim

---

[53] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r19 û 48.

[54] Ji bo agahiyên zêdetir, Somaîl Hintijton, pevketina şaristaniyan, jinûve avakirina sîstema cîhanî, wergêr, Telet Şayîb, çapa duyem, 1999, bê weşanger.

[55] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r19 û 72.

dewletên faşîzm, tolîtarî û olî. Bi rêya hêzê, komeke biçûk piraniya mirovan desteser dikin. Ev piraniya mirovan jî ji aliyê îdyolojîk ve veqetiyayî ye û hinên din karînên leşkerî di dest wan de hene. Ev yek jî hêza wan dewletan lawaz dike, çimkî ew nikare hevsengiyê di nakokiya xwe ya navxweyî bi nakokiyên derveyîn re pêk bîne. Ev yek jî xizmeta wê stratejiyê dike ku dibêje gerek e keleh ji hundir ve were hilweşandin. Ji ber wê jî dewletên ku dixwazin desteseriya siyasî pêk bînin, siyaseta mîkafîlî bi kar tînin da ku nakokiyê di navbera gel û desthilatê de pêk bînin û wê nakokiyê bi rêya gurkirina her aliyekî li ser ê din kûr bike. Di encamê de ew dixwaze tevlîheviyeke kontrolkirî di hundirê welatê armancgirtî de pêk bîne da ku paşê li gor berjewendî û ewlehiya xwe ya neteweyî wî welatî ji nû ve ava bike. Ji vê yekê re stratejiye ``ji hev dûr bixe tu yê bimînî`` tê gotin.[56] Hema hema piraniya dewletên cîhanê ji ber vê xala lawaziyê astengiyan dikişînin, heta di dewletên ku bihêz tên binavkirin. Weke mînak, li Almanyayê, naziyên nû hene û li Amerîkayê rêxistinên tundrew hene ku tenê çermspiyan dipejirînin û ji bilî wan.[57] Di navbera salên 1990 û 2000an de tenê nêzî 54 êrîşên hundirîn ji hêla dijberên hikûmeta amerîkî, terorên jîngehî û ji bilî wan ve hatin tomarkirin.58mirov dikare vê rewşê bi rêya gotina dîroknasê amarîkî Rêtşard Hovistard rave bike:``Qedera me weke netewe, ew e ku îdyolojîk li ba me tune bin. Lê belê em bi xwe îdyolojîk bin.[59] Li Rûsyayê rêxistinên neteweyî û islamî hene, her wekî Şîşan, Daxistan û ji bilî wan. Li Îran û Tirkiye û piraniya welatên rojhilatî yên zordar heman tişt dubare dibe.``

Komên tundrew a olî bêtir bala hêzên xwedî hestên impiryalîzm dikişînin da ku  xizmeta stratejiyên wan bikin, çimkî bandorkirina li wan û leşkerkirina endamên wan bi awayekî neyekeser, hêsan e. welatên ku nakokî û pêşbaziyeke navneteweyî li ser wan heye û bi dehan baregehên leşkerî  û saloxgerî yên dewletên bihêz  li ser xaka wê wan hene, tê dîtin ku çalakiya rêxistinên tundrew di wan de zêde ye; her wekî Avganistan, Iraq, Sûriye,

---

[56] Ji bo agahiyêb zêdetir, Robert Girîn, 33 stratejiyên şer,wergêr; Samir Ebû hewaşm çapa yekem, 2009, weşanger, Ebîgan, Siûdiyê, desteya Ebû Zebî ya Çand û Kultûrê, Îmarat, r337.
[57] Somaîl Hintijton, pevketina şaristaniyan, jinûve avakirina sîstema cîhanî, wergêr, Telet Şayîb, çapa duyem, 1999, bê weşanger, r494
[58] Kîm Kerajîn û hinên din, karîgerên ku dihêlin ciwan tundrewiyê nepejirînin çi ne? weşanger, saziya RAND 2015, r3.
[59] Somaîl Hintijton, pevketina şaristaniyan, jinûve avakirina sîstema cîhanî, wergêr, Telet Şayîb, çapa duyem, 1999, bê weşanger. R495

Yemen û ji bilî wan. Ev kom dikarin binkeftina rêjîma desthilatdar û îdyolojiyan ji bo çareserkirina arîşeyên aborî, civakî û siyasî bi kar bînin lê ew di pêkanîna geşepêdanê di her alî de bi bin dikevin. Ev vê yekê di gotarên xwe yên olî de bi kar tînin da ku pêrewên bindest bi ser xwe de bikişînin û pêrewîtiya wan a kor bi dest bixin. Baweriyek li ba hin rêberên birîtanî heye ku ``…mirov dikare bi rêya kurîna rêberên olî û xapandina wan dikare bi islamê bilîze yan jî wê bi kar bîne. Li gor wan kesê ku xelîfeyê desteser bike, ew islama sinî desteser dike…`` dibe ku ev nerîn ji tecrubeyên ku bûn sedema şerê olî li Ewropayê di sedsala 16em de û heya lidarxistina peymana Westvaliya 1648 hatibe. Di wê demê de Birîtanyayê ji Vatîkanê cihê bû û dêrên xwe yên taybet bi xwe ava kirin (Incîlîkaniye). Siyaseta ingilîzan di damezirandina koma Ixwan û tevgera sehyûnî û birayên masûnî yên rojhilatî bi ser ket[60] ku armanca wê rawestandina têgihiştina neteweyî ya zanistî ya erebî, israîlî, tirkî û parisî. Her wiha wê desteseriya xswe ya li ser parzemîna hindî jî misoger kir ku tê de bi melyonan kes ji hezarên salan ve, baweriyê bi ol û baweriyên cûr bi cûr tînin, her wekî hindosî, sîxî, bûzî, islamî û ji bilî wan

Xuya ye ku rêberên tevgera sehyûnî jî heman rêbaz der heqê oldarên cihû de bi kar aniye û osmaniyan jî ji bo leşkerkirina rêçên sofî ev siyaset meşandiye û fetwe derxistine ku di wan de kuştina êzîdî, xiristiyanî, elewî, ismaîlî û misilmanên şîî helal kirin. Heman rêbaz ji hêla rêjîma Tirikieyê ya niha ve bi serkêşiya Erdogan der heqê tevgerên islamî yên siyasî yên hemdem de tê meşandin. Dema tundrewî li hin herêman lawaz be, saloxgerên hinan ji wan dewletan, tundrewiyê xurt dikin, ew jî bi rêya lîstina bi hiş bi rêya bandorkirina li binyata mirov da ku nerîn û armancên wî ber bi xwesteka desthilatê ve herin. Ji vê yekê re şerê derûnî (şerê taybet) tê gotin.[61] Mirov dikare weke mînak, şerê sar di navbera sovyet û dewletên rojavayî de bi bîr bîne.[62] Her alieykî hewil da aliyê din ji aliyê siyayseta impiryalîzm ve lawaz bike, ew jî bi rêya geşkirina tundiya zansitperestî, yan jî

[60] ji bo agahiyên zêdetir, Yekîneya Lêkolîn û Raporan 2, Ixwan li Brîtanyayê…weşanger: Navenda Ewropî ya Lêkolînên Qirkirina tero û saloxgeran, Almanya/Holenda, 2021, lînk https://www.europarabct.com

[61] Sêrcîh Qeremoza, lîstina bi hiş, wergêr: Îyad Îd, Desteya giştî ya sûrî ya pirtûkan/ desteya Çandê, Şam 2012, bê hejmara çapê, r66

[62] Ji bo agahiyên zêdetir Dr. Şakir Ebdilhemîd, şîrovekirina derûnî ya tundrewî û terorîstê, weşanxaneya Skenderiyê, Misir, 2017, r107.

olperestî bi behaneya çoreşa li dij zordariyê li welarên cîhanê. Bi hilweşîna Sovyetê, vê stratejîkê berdewam kir û hema hema ji hêla piraniya rêjîmên dewletî ve di çarçoveya tevlîheviya birêxistinkirî dihat bikaranîn da ku desthilata xwe xurt bikin. Mirov dikare vê yekê baş di şerê rûsî-ukraynî de bibîne. Di vî şerî de, hêzên tundrew di rêxistinan de tên komkirin û bi awayekî nerasterast, çek û perepêdan ji wan re tên peydakirin. Mînakên vê yekê gelek in. her wekî siyaseta hin dewletên ewropî yên ku bi awayekî nerasterast alîkariyê di damezirandina rêxistina Qaîdeyê de dikin[63] da ku rê li ber zêdebûna şuiyan û geşbûna hestên erênî li ba misilmanên Asyaya Navîn bo rêgezên demokrasî û zanistî ve bigirin. Ji aliyekî din ve encamên şerên ku Daişê kirine veber anîn da ku tevlîheviyeke afirandî li Rojhilata Navîn, peyda bikin. Her wiha siyaseta şîakirinê li gor îdyolojîka Xumeynî heye.[64] Her wiha siyaseta islamkirina tundrew a civakê da ku desteserkirina wê ji hêla rêjîma Iraqê ya berê hêsan bibe. Vê rêjîmê piştî binkeftina wî di şerê Kendavê yê Duyem de 1991, dest bi pêvajoya baweriyê kir. Piraniya serwerên rêjîmên giştgir ên ku desthilata welarên erebî û islamî dikin, vê siyasetê dimeşînin. Jixwe dewleta Tirk a bi serkêşiya AKPê heman siyasetê dimeşîne.[65]

Dibe ku karîgera derveyîn bi rola xwe di geşkirina diyardeya tundrewiyê de li welatekî bike.[66] Ew jî dema birayên baweriyê yên li welatên din rastî zordarî û çewsandinê bi alîkariya hêzên derveyîn werin. Gotarên ku piştgiriya doza filestînî digirin, palopişta vê yekê ye. Piraniya reklamên tundrewiyê li ser pîrozbûna doza filestînî tekez dikin. Her wiha stratejîka şerê li dijî terorê ku bû sedema êrîşkirina leşkerî bi ser hejmarek welatan de. Vê yekê jî hişt ku bi dehan qurabî ji kesên bêguneh bikevin, pê re jî dîmenên binpêkirinê di girtîgehên Giwantnamo û Ebûxirêb , hişt ku gelek misilman bi kêmbûnekê bihisin. Vê yekê jî hestên kîn û tolhildanê li ba wan gur kirin. Jixwe ev her du

[63] Mark Kortîs, dîrojka veşartî ya komploya Brîtaniya bi radîkalan re. , wergêr: Kemal Seyid, çapa duyem, 2014, weşanger: Navenda Neteweyî ya werger, Qahîre, r272

[64] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r105.

[65] Ji bo agahiyên zêdetir hûn dikarin li vî lêkolerî vegerin: Mark Kortîs, dîrojka veşartî ya komploya Brîtaniya bi radîkalan re. , wergêr: Kemal Seyid, çapa duyem, 2014, weşanger: Navenda Neteweyî ya werger, Qahîre

[66] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r97.

hest ji handerên sereke yên çûna mirov ber bi tundrewiyê ve ne. hin dewlet xwedî berjewendî ne di çêbûna kiwarên tundrewiyê de, da ku xwe ji tundrewên li gel xwe xelas bike, ew jî bi rêya şandina wan ber bi herêmên rageşiyê ve da ku xwe ji wan xelas bike yan jî weke çeteyan di şerên wekaletê de bi kar bîne; her wekî çekdarên biyanî yên di nav refên Daişê de. Ev yek encama dutuxmkirina îdyolojîk a ramanên Partiya Bas û Rêxistina Qaîdeyê ye. Operasyona baweriyê ya ku rêjîma iraqî ya borî dest pê kir û dagirkirina Iraqê di sala 2000an de, xakeke berhemdar ji bo van kesan peyda kir. Di vê çarçoveyê de, hin dewletên rojavayî yên hevpeymanên dewleta Tirk hewil didin PKKê lawaz bikin, ew jî bi rêya piştgiriya êrîşên dewleta Tirk ên hovane bi ser cihên leşkerî û çandî de ku ev yek bi rêya hevrêziya bi rêxistinên tundrew ên alîgirên wê li Sûriye û Tirkiye pêk tê. Heta dema ev dewlet çavên xwe li ser bikaranîna dewleta Tirk ji çakên kîmawî re li dijî şervanên kurd li çiyayên Kurdistanê, digirin ku ew binpêkirina rêkeftinên qedexekirina bikaranîa çekên kîmawî ye.[67] Ev yek berovajî helwesta wan a li hemberî bikaranîna rêjîma sûrî ji çekên kîmawî re li dijî opozisyonê ye. Dibe ku armaca veşartî ji vê yekê, parastina fobyaya kurdî be ku hin îdyolojîk û rêjîmên herêmê astegiyan ji ber dikişînin. Di heman demê de hewlidanek e ku tevgea azadiyê kontrol bike û hezkirina gel jê re di nav civakên kurdistanî de kêm bike, da ku rê li ber ajbûna radîkaliya kudî ya olî bi piştgiriya Erdogan û pêrewên wî yên hin partiyên kurdî veke. Jixwe armancên vê yekê stratejîk in , her wekî peydakirina alavên pêwîst ji bo kontrolkirina dewleta Îranê, misogerkirina desteseriya li ser dewleta Tirk, nexasim dema hikûmeteke niştumanî bigihêje desthilatê û afirandina rewşekê ku bi rêya karibin tevlîheviyeke birêxistinkirî li jêr kontrola wê were pêkanîn. Xuya ye ev stratejîk heya astekê di aloziya Sûriyeyê de jî hatiye meşandin. Rêjîma Sûriyeyê karîbû nakokiya xwe ya bi raperîna gel re ji rê derxîne ku vî gelî doza projeya xwe ya demokratîk û dadmen dikir û hişt ku ev nakokî ber bi radîkaliya islamî ya tundrew ve here ku doza avakrina rêjîmeke tyokratîk dike. Ji bo pêkanîna vê yekê bi sedan kesên tundrew ji girtîgan berdan; dibe ku hin ji kesên herî navdarên ku hatin berdan, Ebû Mihemedê Colanî û Ebû Misebê Sûrî bin. Bi vê yekê rêjîmê karîbû bihêle şerê rojavayî li hember xwe rawestîne, û heya demekê rê li ber ketina xwe bigire û bihêle piraniya

[67] Bi rêya vê lînkê tu dikarî li vê rêkeftinê binihêrî: https://www.opcw.org/sites/default/files/documents/CWC/CWC_ar.pdf

çekdarên opozisyonê bibin komên tundrew û çete û bi dijminên welatê xwe yên agirker re bibin hevpeyman. Ev yek jî pêvajoya qirkirina wan hêsan dike bêyî tu kes hesabdaryê jê bixwaze. Her wiha bi vê yekê xwe ji bo gelê sûrî weke alieyê ji opozisyonê baştir da diyarkirin.

Civakên çewisandî yên xwedî jîngehên xizan û paşvemayî ku ji aliyê nijdarî, olî û tîreyî ve parçekirî ne, komên tundrew di wan de zêde dibin. Nekarîna kesê çewisandî ku ew li hember serwerên zordar rawestin dihêke ku ew berê xwe bide hêzekeke giyanî ku jiyana wî hinekî xweştir bike û jê re penagekehe hestî peyda bike ku wî ji hestên wî yên neyînî yên ku gefan li jiyana wî dixwin rizgar bike. Jixwe îdyolojîkên olî û tîreyî ku wisa dixuye ku ew dibin îdyolojîkên şer, vê yekê peyda dikin. Her wiha bikaranîan bizanebûn a karîgera aborî bi rêya dorpêçî, seza û malgirtinê, ji hêla hêzên ku desteseriyê dixwazin ve, bingeha alîgir a karîgera derveyîn peyda dike. Ev yek, astengiyên li pêşberî wî radike û dihêle karibe karîgera derûnî, civakî û siyasî bi kar bîne da ku rewşa tundrewiya birêxistinkirî peyda bike. Bi rêya tîmarkirina nakokî û arîşeyan û guerkirina wan, rageşiyê zêdetir dike. Ev yek jî dihêle em bi sîkyolojîka mirovê bindest û çewisandî bihizirin. Em dikarin bersiva vê yekê li ba lêkoler Mistefa Hîcazî bibînin ku wisa amaje dike:[68] ``…civakên parçebûyî, bi awayekî diyar, parçebûnên hundirîn ên hema hema tekez dide diyarkirin. Di her yekê ji wan de niştecih li ser kom û tîreyên ku pêrewîtiya wan, nijadm netewe û ola wan cuda ne û dijberî hev in, tên parvekirin…jixwe kesê desteser ê derveyîn dixwaze desteseriya xwe li ser civakê bisepîne, van nakokiyan bi kar tîne. Ew wan diteqîne yan jî gefan dixwe ku ew ê wan biteqîne da ku xwetekên xwe li ser wan bisepîne. Kesê desteser van nakokiyan tîmar dike û agirê wan gur dike. Ev yek jî dihêle welatên cîhanê paşvemayî bimînin û her tim di bin metirsiya teqîna tundrewiyê bi awayê şerên navxweyî derkeve pêş ku di van şeran de komkujiyên xwînî yên ku ranawestin, derdikevin holê…bê guman pêşewayên navxweyî bi desteserê derveyîn re dikevin peymandariyê de da ku desteseriya xwe li ser komê bisepînin û wê bi xwe ve girê bidin. Ev yek jî derfetê dide wan ku ew hêzdariya xwe biparêzin, di bin navê berevaniya di

[68] Dr. Mistefa Hicazî, paşvemayîna civakî, derbasgehek bo sîkyolojiya mirovê çewisandî, çapa nehem, 2005, weşanger: Navemda Çandê ya Erebî li Darilbeyda, Mexrib, Beyrût Libinan, r179

ber hebûna komê û berjewendiyên wê yên jîndetî li hemberî gefên derveyîn…``Ji ber wê jî, ya herî zêde alîgiriya bandora derveyîn dike, pêşewayên xwedî xwestekên desteseriya olî yan şofînîzm in ku hestên niştumanî yên lawaz li hember civakên wan li ba wan hene. Ev kes tu rêbazî (derew, çewsandin) bernadin da ku desthilata xwe xurt bikin û gencîneyên xwe zêde bikin û xwe wisa pîroz bidin diyarkirin (her wekî faşîzm û yên weke wan). Bi rêya komploya bi dijminên derveyîn re dixwazin binkeftina xwe ya pêkanîna geşepêdaneke derveyîn rewa bikin. Ji bo ku nehêlin tu hêzên derveyîn alîgiriya hêzên opozisyonê di hundirê welat de bikin, girêbestan bi awayê hevpeyman û rêkeftinên bi welatên bihêz re li dar dixin. Ew jî li hember alîkariyeke hevpar di navbera olîgarşiya xwecihî û wan dewletan de. Ev yek jî rewşweyekê pêk tînda da ku levkirinek were pêkanîn ku berdewamiya xwe ji berdewamiya rewşên ku hebûna wê diparêzin, werdigire. Têkiliya şêxên Qeterê bi hin dewletên rojavayî re û pêşwazîkirina baregehên wan ên leşkerî li ser xaka xwe, nimûneya vê yekê ye. Lê gelên ku bi çanda xwe serbilind in û li hember desthilateke giştgir radiwestin, ew bi hêsanî nakevin bin desteseriya hêzên mezin de. Ev hêz berî ku rêjîma gendel bikeve, hewil didin desthilatê bi ser xwe de bikişînin û wê santaj bikin. Çimkî desteseriya wê li ser desthilatê, desteseriya wê li ser gencîne û siyasetên welat misoger dike. Heman rêbaz ji hêla desthilatan ve tê meşandin da ku desteseriya xwe li ser pêşewayên xwecihî, rûsipî, şêx, serokên partiyan, yekîtî, bazirganên mezin û ji bilî wan misoger bike. Ev atmosfera zordar, dihêle hestên tundiyê li ba gel zêde bibin ku ew jî di encama di xwe de hiştina hestên bêewlehî, pîsbûn û kînê de peyda dibin. Ev jî dihêle ku tundrewî bibe weke rêyekê ku mirov hestên xwe yên neyînî bi rêya wê derxîne û dihêle mirov û kom berê xwe bidin tundiyê weke stratejiyekê ji bo çareserkirina nakokiyê.[69] Ev yek jî gotara gelî ya tundrew dinimîne. Li vir gotara reklamî ya olî jî tê dîtin ku bi rêya wê baweriya şer tê xurtkirin. Ew jî piştî k baweriyê li ba hin kesên tundrew xurt bike ku jiyana heyî zulm tê de heye. Ev yek dihêle ku dilê wan bi niştecihên nêzî wan bişewite ku ev niştecih, ji ber zordariya çînên desthilat jiyaneke tratejîk dijîn. Ji ber wê jî berî ajbûna hestên olî yên tundrew tê. Wisa dixuye ku hestên olî tenê tên da ku karên tundrew rewa bikin. Ev yek jî derfetê dide hinên din ku xwedî xwestekên siyasî yên tundrew

[69] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r96.

in da ku xwe weke rigarkeran bidin diyarkirin. Ev kes dirûşma ``misogeriya pevketina şartistaniyan``[70] ji xwe re dikin jêdera xurtkirina îdyolojîka xwe. Ew jî bi rêya têkelkirina hestên kînê bi deqên pîroz re ku ew deq, tundiyê hin rewşan de pîroz dikin. Ev yek jî çirûska dadana şerê navxweyî di bin navê şerê pîroz de pêk tîne. Tundrewiya hemû aliyên di şer de (dewlet, kom, pêşewa û mirov) dihêle agirê wê gurtir bibe. Bi kurtasî, ev rêbazê tundrewiyê, kînê ji ramanan ber bi xwediyên wan ramanan ve dibe. Hemû alî jî teoriya komployê bi kar tînin da ku binkeftina xwe ya pêkanîna aştî û hevgirtina mirovî û ji bo ku tundiya xwînî gur bikin, rewa bikin.

**Dawî jî,**

Bi awayekî giştî mirov dikare tekez bike ku pirsgirêk di destnişankirina karîgerên ku tudrewî û terorê çêdikin de heye. Her lêkoler û xwediyê nerînekê li gor pisporiya xwe lê dinihêre; çarinan bi zihniyeteke xweser û carinên din bi awayekî bêalî, lê bi awayekî rêjeyî. Hin jê ji aliyê sîkyolojîk ve û hinên din ji aliyê sincî ve û hinên din jî ji aliyê siyasî û hin ji aliyê aborî, çandî û ji bilî wan ve lê dinihêrin. Kesê derûnnas li teror û tundrewiyê dinihêre ku ew derbirîna hestekî ye ku ji derveyî kontrola mejî, tiştên asa û rewşa heyî ye. Hin caran ew şêweyê tundî û êrîşkirinê li xwe digire. Ew yek ji cûreyên reftar e ji ber rewşa bêhêvîbûn, tirs, rageşî û nehedariya sinirî pêk tê. Dibe ku di encamê de ziyanê bigihîne kesên din. Ew reftarekî tije heyejan ku tê de xezeb û dijminatî heye. Bi vî awayî hestên hilweşandin û rûxandinê li şûna hestên parastina jiyanê li hemberî dijmin tê de gur dibin. Jixwe dijmin jî bi heman rêbazî bi aliyê din re dide û distîne (li gor analîza derûnî). Lê nerîna felsefê, sincî û zagonî, dibîne ku ew reftarek e ku bi rêya wê aliyek destwerdanê di azadî û mafên kesên din de dike û wan bin pê dike. Kesê siyasî û civakî dibînin ku ew rêbazek e ku tê de hêz û tundî tê bikaranîn da ku desthilat were rûxandin da ku ew wê bi dest bixin da ku berjewendîne diyar û armancine rewa yan nerewa pêk bînin. Civaknas tundrewiyê bi rewşa civakî ve girê dide ku tê de nakokî di navbera çînên civakê yên xwedî berjewendiyên dijber de çêdibin. Her wiha gelek nerînên din jî hene.

Di vê çarçoveyê de tê dîtin ku tundrewî û şer heya astekê, du tiştên rastinhev in û bi hev re tên; ya ku şer dilivîne, xwesteka aliyekî ku gencîneyên

[70] Heman jêdera borî, r95

aliyê din desteser bike û desthilata xwe bimeşîne û xwe ji gefên rast an ên sêwirandî biparêze. Bi kurtasî, sedemên wê yên siyasî, civakî, aborî û ewlehî-dîmografîk hene.[71] Hin lêkolînên giştî yên radîkaliyê hene ku amajeyê bi pênc karîgerên hander dikin[72] ew jî ev in: tundiya weke bertek li hember tundiyeke din, zordariya kesayetî, armancên şoreşgerane, berjewendiyên kesayetî û wateya pîroziyê. Bêhêvîbûn bi rolekê di handana wan de dilîze.

Li gor tiştên borî û hin agahiyan ku bi rêya hevdîtinên ku bi kesên tundrew re di dema borî ya nêz de bi wan re hatine çêkirin, em dikarin bibêjin ku tundrewî, mejî û hestên mirov di atmosfereke ku tê de ewlehiyên madî û manewenî tên tunekirin, destewer dike. Pêwîstiya wî bi hêzeke manewî heye ku piştgiriya baweriya wî ya şer dike da ku ewlehiya xwe ya mirovî li gor ku ew rast dibîne, pêk bîne. Ev nerîna wî jî li gor şêweyê aktîvbûna wî bi rewşên jîngeha wî re tê avakirin. Ya ku vê jîngeha wî jî destnîşan dike, çarçoveya wî ya xwezayî û mirovî ku tê de heval û hogirên wî û dijmin, rikber û desteserên wî tê de ne. her wiha ya ku vê jîngehê dide diyarkirin, çanda wî ya bidestxistî yan ya ku li ser xwedî bûye. Di encamê de helwesta erdênî û neyînî ya tundrewiyê rêjeyî dimîne. Hestên pîrozdîtina tundrewiyekê û şeytankirina yeke din didome heya ku xwestekên dijminatî, kîn, desteserkirin û kolekirinê di navbera mirovan de pûç bibin. Hin ramangerên ku gelekî bi xeyalên zansitî bandor bûne, dibînin ku dema robot jiyanê desteser bikin an jî em rastî êrîşeke fezayî werin, wê hingê ev hestên kîn û dijminatiyê wê ji nav mirovan werin rakirin. Hin kesên oldar jî dixwazin ku Roja Qiyametê zû were û hin kesên zanistperest hene ku dixwazin neteweyeke demokratîk a cîhanî were avakirin…xuya ye ev xwestek dikevin bin sîwana hêviyan de, lê dawî jî ew aliyekî mirovî didin diyarkirin ku ew alî dixwaze xwe ji vê girêka metirsîdar a ku gefan li hebûna mirovî dixwe, xelas bike

[71] Tezvîtan Todorov, tirsa ji berberan di pey dijberiya şaristaniyan de, wergêr: Dr. Can Macid Cibûr, çapa yekem 2009, weşanger: Desteay Ebûzebî ya Çan û Mîratê, Ebûzebî, r102.

[72] Kîm Kerajîn û hinên din, karîgerên ku dihêlin ciwan tundrewiyê nepejirînin çi ne? weşanger, saziya RAND 2015, r5

# Têkilîyên Bîrdozî û Sîyasî Yên Di Navbera Partîya AKP û Komên Radîkal De

**(Ixwanûluslimî - Daiş – Elqaîde – Elnusra)**

**(2 ji 2)**

**Dr. Celal Zênatî**

**Beşa sêyem- Erdogan (xelîfê osmanî) çeka wî Daiş û rêxistinên mîna wê ne:**

Serokê tirkî Erdogan, rêxistinên terorîst ên mîna Ixwan, Daiş û Qaide ji bo pêkanîna projeya dewleta osmanî ya nû, bi kar tîne da ku bibe xelîfeta osmanî ya serdemê. Ji ber wê jî alîkariya Tirkî ji bo rêxistinên terorîst ranaweste. Mînak, têkiliyên Erdogan û daişê hemû sînor derbas kirin, çimkî piştî têkçûna daişê l Sûriye û Îraqê karîbû melyonên dolaran qaçax bike (li girî rojnameya Zey Îkonomîst a birîtanî). Rojnameyê got ku endamên daişê karîbûn gelek pereyan derbasî Tirkî yê bikin da ku piştgiriya şaneyên veşartî li wir bikin û di pêşerojê de careke din çalak bibin.

Her wiha serokê Partiya Gel a tirkî Kemal Kilîtişdaroxlo tekez kir ku sultanê osmanî rêxistinên Daiş û Nusre û hemû rêxistinên terorîst hembêz kirine û alkariyê bi her awayî ji wan re pêşkêş dike. Kilîtişdaroxlo got ku Hikûmeta AKPê û hemû dezgehên ewlekarî û saloxgeriyê bi rêya biryarên Erdogan têkiliyên xurt bi Daişê re pêk anîne û Daiş pêdiviyên xwe ji Tirkî yê werdigire. Her wiha wî da zanîn ku bi sedên şaneyên razayî yên Daişê û bi zanîna dezgehên ewlekariyê li Tirkî yê hene.

Têkiliya rêjîma tirkî bi daişê re ne tenê girdayî Erdogan e, lê belê gihaştiye malbata wî jî ku girêbestên kirîna pitrolê pê re li dar xistine û bi rêya beşgehên Bilal Erdogan hatiye hinartin. Navê wzîrê betrolê yê rasteqîn di rêxistina Daişê de, lê hatiye kirin.

Gelek çavdêran tekez kir ku Daiş destê Tirkî yê bi çek e li Rojhilata navîn û Eneqere bi pêşkêşkirina alîkariyê bo Daiş tewanbar dikin. Heya berî ragihandina Daişê jî Tirkî alîkarî pêşkêşî çekdarên wê dikir, loma jî Daiş perewa Tirkî yê ye. Ev şopîner didin diyarkirin ku saloxgerên Tirkiyê berê Daişê dan ku xwe ji Qaîde cihê bikin di 2014an de û cihê xwe li Sûriye û Îraqê xurt bikin.

Hin raporên saloxgerî yên rojavayî eşkere kirin ku hin leşkergehên tirkî li ser sînorê wê yê bi Sûriye û Îraqê re, ji bo pêşwazîkirina çekdaran û şandina wan bo rêxistina Daişê hatine terxandin. Her wiha Enqere hin rêyên biewleh ji bo derbasbûna Daiş di hundirê Sûriyeyê de vekirine. Alîkariya Tirkî ji Daişê re ji gelek aliyan ve ye, her wekî pêşkêşkirina çekên pêşketî bo wan, perwerdekirina endamên Daişê û hevrêziya bi wê re. Ya ku balê dikişîne eww e ku tevî ku sînorê Sûriye û Tirkî bi hev ve ye, Daiş heya niha tu pêvajoyekeke terorîst di nav axa Tirkî yê de pêk nehaniye. Her wiha Tirkî ku dibêje ew şerê Daişa terorîst dike, heya niha tu pêvajoyeke leşkerî li dijî Daişê pêk nehaniye, lê belê piraniya topên wê deverên kurdî armanc digirtin. Peymangeha Lêkolînên mafê Mirovan di zanîngeha Kolombyayê de eşkere kir ku Tirkî alîkariya Daiş û Nusrayê dike û Daiş di berhemeke xwe ya di bin sernavê Rastiyên veşartî beşa yekem de mukir hat ku di dema şerê wê bi hêzên kurdî li Kobanê re, têkiliyeke wê ya xurt bi Tirkî yê re hebû.

**Erdogan, zavayê wî û Daiş:**

Raporeke analîzî der barê encamên hilbijartinên şaredariyan li Tirkî yê, ku di rojnameya Mîdya Part a ferensî de berî çend rojan hat weşandin, eşkere kir ku AKPê rastî binkeftineke mezin di hilbijartinan de hat, nemaze piştî ku bajarên mezin ên mîna Enqere û Stenbol ji dest dan. Raporê bal kişand li ser nepejirandina Erdogan ji binkeftinê re. Tevî serkeftina Ekrem Îmam Oxlo (Hilbijêrê Partiya Gel a Komarî) bi şaredariya Stenbolê jî, Erdogan tu peyvê ji wê yekê bawer nake. Rapor dibîne ku qehra Erdogan li ser Stenbolê tê fêmkirin çimkî ew bajarê herî girîng e li Tirkî û ew bajarê ku jiyana xwe ya siyasî jê dest pê kiriye. Her wiha rapor dibîne ku zehmet e li ser islamiyan ku bajarên xwe yê ku ev 25 sal e tê de hatine parastin, ji dest bidin. Ji aliyê dijberên Erdogan jî, ew dibînin ku binkeftina Erdogan destpêka AKPê di Tirkî yê de ye. Tevî wê binkeftinê jî, lê rojnameya ferensî dibîne ku dijberî û şer li pêşiya dijberên Erdogan baş dirêj e.

Di dema rêfrandoma 16ê nîsana 2017an de destûr hat sererastkirin û li gorî wê sîstema serokatiyê bi pêş ket û li gorî wê desthilata Erdogan zêdetir bû û bêtir pêşveçûna jiyana siyasî destser kir. Li gorî rapora ferensî, vê sererastkirina destûrî derfet da Erdogan ku tîma xwe ya hikûmî bê dijber bi cih bike. Li gorî wê jî zavayê xwe Bîrat Beyreq kire wezîrê darayî ku ev yek bû sedema rewşa aborî ya ne baş li Tirkî . Lîreya tirkî di 2018an de bi qasî %30 daket. Her wiha zavayê Erdogan (hevjînê keça wî ya mezin) di sala 2015an de bû wezîrê Enerjî û dahatên xwezayî li Tirkî . Li gorî rapora ferensî ev şerimtirîn rêbazê xalûxwarzêtiyê ye. Lê tevî wê jî raporê da zanîn ku ne ev tenê ne tiştên ku Erdogan li ser tê şermezarkirin lê belê û li gorî malpera Wîkîlîks hin aliyên din ên metirsîdartir li ser asta xwecihî û Navneteweyî hene. Ev alî girêdayî beşgeha betrolê ya bi navê Powertrans in.

**Zavayê Erdogan û petrola Daişê:**

Rapora ferensî bi rêya belgeyên Wîkîlîksê da diyarkirin ku betrola ku daiş ji Sûriyeyê derdixistbi rêya 8500 siwareya betrolê ku girêdayî beşgeha Powertrans bûn derbasî Tirkî dibûn. Ji bo ku şûnwara wê were windakirin jî, destpêkê beşgeh li Sengafora bû û girêdayî beşgeha Grand Fortune Ventures bû û paşê ber bi Kayman ve hat veguhestin.

Rojnameya gardiyan a birîtanî di 2015an de gotareke endamê Partiya Gel a Komarî (Arîn Irdim) weşand ku tê de hat eşkerekirin ku têkilî di navbera zavayê Erdoganû bazirganiya betrolê bi daiş re heye. Lê xwediyê gotarê piştî vê gotarê tûşî êrîşeke tund ji hêla ragihandina girêdayî Erdogan ve hat (li gorî raporeke Midya Part). Tevî va qas nîşaneyên ku eşkere dikin ku têkiliya Tirkî bi daişê re heye jî,hêj Erdogan –li gorî ku rapora ferensî dibêje- tu derfetê bernade bêyî ku bibêje ez şerê daişê dikim, lê rastî berovajî vê yekê ye û Erdogan karê daişê hêsan dikir.

Li kêleka zavayê wî, ronameya ferensî diyar kir ku kurê Erdogan (Bilal) jî têkildarî Daişê bû û wî jî beşgeheke enerjiyê li Tirkî bi rê ve dibir. Wîkîlîksê diyar kir ku karekî din ê Bîrad Beyreq hebû, ew jî desteseriya rojnamegeriyê û bikaranîna wê ji AKPê bû. Li gorî peyameke elektronîk a ku hat eşkerekirin, Birad Beyreq fişar dikir da ku sêyem mezintirîn koma ragihandinê li Tirkî (Ipek) bikeve di bin desteseriya hikûmetê yan jî ji bo beşgeheke nêzî hikûmetê were firotin. Li gorî raporê rewşa ragihandnê di dema rewşa

erwarte de li Tirkî  pir xerab bû û nêzî 150 ji wan alavên ragihandinê hatin qepatkirin û 100 rojnameger hat girtin. Ji ber wê jî di sala 2017an de cihê Tirkî  bû 155 di nav 180 dewletî de ji aliyê azadiya rojnamegeriyê ve.

**Çawa Erdogan Daiş bi rê ve dibir?**

Li gorî mukurhatina Ebû Mensûrê Mexribî ku ew jî endezyarekî mexribî bû û di sala 2013an de tev li daişê bûbû, ew şandeyê daişê li Tirkî  bû û wî hevdîtin bi gelek berpirsiyarên tirk û dezgehên ewlekariyê yên Tirkî  re çêkirine.Ebû Mensûr dibêje karê min ew bû ku ez pêşwazya çekdarên biyanî li Tirkî  bikim û komek kesan di vê yekê de pê re alîkar bûn. Bi vî awayî bi hêsanî çekdarên biyanî ji Stenbolê derbasî Sûriyeyê dibûn. Piraniya kesên ku bi karê veguhestina çekdaran radibûn, pere ji daiş werdigirtingelek kesên ku baweriyê bi Daişê tînin û gelek zilamên Daişê li Tirkî yê hene. Lê komên çekdar li Tirkî  nînin (ev gotina Ebû Mensûr bû). Dema me jê pirsî kî di hikûmeta Tirkî yê de dîdar bi Daişê re çêdikir, got: Tîmin hebû hevdîtin bi daişê re dikirin, hin ji wan ji saloxgerên Tirkî yê bû û hinên din ji artêşê bûn.

Her wiha wî got: Piraniya civînan li deverên leşkerî bû û li gorî dozê civîn pêk dihat; loma carinan her heftî em diciviyan. Her wiha diyar kir ku piraniya civînan li nêzê sînor bûn, lê hin jê li Enqere û hinên din li gazî Entabê bûn. Ebû Mensûr got hindek mabû ez Erdogan jî bibînin lê ew hevdîtin pêk nehat. Çimkî serkirdeyekî saloxgerî gote min Erdogan dixwaze te bibîne, lê ev yek pêk nehat.

Wî diyar kir ku di sala 2014an de Tirkî  dixweset bi lîstikeke dualî bilîze,; hem çekdarên biyanî derbasî Sûriyeyê bike, hem jî ji dewletên ewropî re bide diyarkirin ku ew rê li ber derbasbûna çekdaran digire. her wiha Tirkî  di 2014an de hin dergehên zagonî di bin çavdêriya saloxgerên tirk de vekirin da ku endamên Daiş wan ji bo çûn û hatinê bi kar bînin. Lê li gorî ku ew dibêje, derbasbûna li Sûriyeyê ji derketina jê hêsantir bû, çimkî sînor dibin destê Tirkî yê de bû. Her wiha Ebû Mensûr behsa danûstandinên 2014an der barê berdana diplomasî û karkerên tirk de dike ku piştî desteseriya Daişê li ser Mûsilê hatin girtin. Ebû Mensûr dibêje: danûstandin li Sûriyeyêpêş hatin. Derbasbûna daişê li Mûsilê ne hema ji nişkan ve bbû, lê dibêjim dibe ku Tirkî nehiştibe qunsilê wê li wir koç bike û gelek şufêrên tir jî li wir bûn lê ne di bin metirsiyê de bûn.lê hin danûstandin ji bo berdana wan hebûn û Daiş jî hin

xwestekên xwe nîşan dan û mijarê hin dem xwar û li gorî berpirsiyarekî Daişê beramberî qunsilê Tirkî yê, nêzî 500 endamên Daişê ji girtîgehên Tirkî yê hatin berdan.

**Bşgeha Sadat a tirkî ji bo perwerdekirina terorîstan;**

Yekîtiya Ewropî dît ku beşgeheke ewlekariyê bi navê Sadat bi çalakiyeke terorîst radibe, loma ew kire di bin çavdêriyê ji bo ku rê li ber gihaştina endamên terorîst di bin navê penaberan de bo Ewropa were girtin. Ev demekê de pêk hat ku dijberan careke din doza vê beşgeha ku di 2012an de hatiye avakirin, vekir ku ev beşgeh destê Erdogan ê alîkariya terorê ye û di warê ewlekariyê de kar dike. Rojnameyê tirkî yên dijber ew wisa bi nav kirin: Parêzvana şoreşgerî ya Erdogan e û ji hêla pêşewayekî mafya ve ku nêzî Erdogan e û jê re dibêjin Sadat Bekir tê birêvebirin.  Vî kesî siware bo Daiş şandin. Ev beşgeh endamên girêdayî Daiş û komên radîkal dihewîne. Ev beşgeh weke artêşa Erdogan a nehênî tê hesibandin. Piştî derbeya 2016an, vê beşgehê teşeyê xwe guhert û ji hêla Ednan Ferdî ve tê birêvebirin û bi perwerdekirina mîlîsiyên çekdar bi dizî radibe û paşê wan kesan li deverên şer bi taybet Lîbiya belav dike da ku armancên Erdogan pêk bînin. Hin sînatorên berlemana tirkî metirsiya wê anî ser ziman çimkî bi dizî û dûrî çavdêriyê kar dike û di bin parastina Erdogan de ye. Wan sînatoran diyar kir ku wan xwestiye ev beşgeh were şopandin lê hikûmetê nehiştiye û diyar kirin ku karê vê beşgehê ew e ku çekdarên dewletên ewropî û Rojhilata Navîn perwerde bike.

Beşgeha Sadat bi awayekî sereke di 2012an de li Sûriyeyê xebitî, ew jî bi rêya şandina endamên perwerdekirî bo Sûriye. Ev endam weke mîlîsiyên taybet bi Erdogan in û karê wan pêkanîna armancên Erdogan in. Kesê yekem ê ku ev beşgeh bi rê ve bir, piştîvanê leşkerî yên malnişîn Ednan Tanrî Firdî bû ku di sala 1997an de karê wî yê leşkerî bi dawî bû. Pê re jî 23 serkirdeyên leşkerî yên malnişîn hebûn. Berê jî Ednan diyar kiribû ku beşgeh xizmetên di warê perwerdekirin û şêwirmendiyê de pêşkêşî 22 dewletên islamî dike, lê di warê berevaniyê de alîkariya 60 dewletên misilman dike.

**Rola beşgeha tundrew di perwerdekirina Daişê de:**

Berlemanekî misrî qala rola beşgeha Sadat di perwerdekirina Daişê de dike. Ev beşgeh bi rêya hevrêziya bi AKPê û komeleya Xuref a osmanî re, Daiş

perwerde dike. Di tîrmeha vê salê de, serokê wezîrên tirkî Bin Elî Yldirim rastî hin pirs ji hêla sînatirê partiya gel a komarî li Tirkî yê ve hatibû. Pirsên Fikrî Saclar der barê beşgeha Sadat û rola wê di perwerdekirina endamên Daişê de û rola AKPê de bûn. Saclar ji Yeldirim xwest ku daxuyaniyeke nivîskî der barê pirsên wî de binivîse û got: Ev beşgeha Sadat bûye cihê nakokiyê bi taybet piştî ku Fuad Ewnî li ser tuwîtirê belav kir ku hin nakoî der barê karê vê beşgehê de hene. Ev beşgeh ji hêla hejmarek serkirdeyên leşkerî yên malnişîn ve hat damezirandin. Van kesan di 2000an de jî komeleya berevanên dadweriyê ava kiribû.

**Têkiliya "Sadat" bi partîya AKP`ê re**

Di heman dema ku AKP gihişte desthilatê de hin angaşt derketin holê, der barê veguherîna komeleya parêzvanên edaletê li destê desthilatê; ji bo bidestxistina agahiyan di milê leşkerî de û derxistina agahî û belgeyan bi riya hevalên wan di hundirê refên artêşa tirk da. Sacilar bi ser ve zêde kir û got ku "kopmaniya Sadat ku li Stenbolê ye, rahênanan li ser şerê nefermî pêşkêş dike, li gor tiştê ku di malpera wê ya fermî li ser internetê hat. Her wiha kompaniya navbirî rahênanên binyadî ji bo şerê nefermî dike û endaman ji bo karê dafvedanan perwerde dike, bisergirtin, girtina riyan, rahênan, wêrankirin û çalakiyên rizgarkirin û revandinê". Damezirînerê kompaniyê generalê malniş, Ednan Tinrî Ferdî, sedema têketina xwe di vê biwarê de li wê yekê vegerand ku "hêzên çekdar yên tirk rajeyan di milê fêrkirin, rawêjkarî û amadekirinê ji 22 dewletên misilman re raber dike, lê nikarin hemû pêdiviyên biwara parastinê li 60 dewletên misilman pêk bînin, lewre me biryar da em van pêdiviyan bi piştvaniya 64 efserî pêşkêş bikin; efserên ku rêzê li rêgezên islamî yên li dewletên islamî tên şopandin, digirin.

Her wiha Saclar amaje bi wan angaştan kir, yên der barê tevlêbûna komeke efseran û efserên hêzên taybet li vê kompaniyê bi mûçene bilind, ji bo perwerdekirina endamên rêxistina Daişê ya terorîst û rêxistinên wekî wê li ser şerê nefermî di hundirê kampan de. Gotina xwe berdewam kir, hin angaştên din jî hene ku piştî istixbaratên rojavayî agahiyên girêdayî dîtina endamên rêxistina Daişê ji perwerdeyê re li ser destê van efseran, perwerde hat rawestandin. Lê saziyên leşkerî yên veşartî, perwerde di hundirê kampan de berdewam kir. Her wiha angaşt dike ku hin ciwanên ku tev li kampan bûne, endamên milên rêxistinên ciwanan yên AKPê û Komeleya El-Xuref El-

Usmaniye ne yên nêzîkî partiya desthilatdar. Saclar amaje bi wê yekê kir ku angaşt li vê derê nesekinin, çimkî raya giştî ya tirkî, van çalakiyan gengeşe dike; çalakiyên ku weke hîmên şerekî navxweyî yê pêkan li welat in. Ev kes dereng namînin ji bo têketina çalakiyên kuştin û wêrankirinê û heta bi êrîşa li dij qehwexaneyan li hundir û derveyî welat; ji bo pêkanîna armancên xwe. Di çarçoveya van angaştan de gelo tu wezaret yan saziyeke hikûmetê destûr yan rêdanek ji bo karkirina Sadat di milê perwerde û rawêjkariya leşkerî de derxistiye? Gelo bi rastî hikûmetê rêdana kar daye kompaniya Sadat ji bo ku bibe berdêl ji hêzên çekdar yê tirk re?.Gelo saziyek ji saziyên dewletê bi erkê şopandina cureyêm rahênan û çekên ku Sadat pêşkêş dike û nasnameya kesê perwerdegir, radibe? Û heke bi rastî tên şopandin, cureyê van rahênan çi ye û endamên ku ew rahênan dîtine kî ne û kengî û li ku derê ev rahênan dîtine? Û kampên perwerdeyê yên Sadat li ku dikevin? Kî wan dişopîne? Gelo rastiya wan angaştan çi ye, yên ku dibêjin ku Tirkî yê rêxistina Daişê ya terorîst û perwerdekirina wê li kampên Sadat girtiye xwe? Heke Sadat nayê şopandin, ya ku şerê îsabatan perwerde dike, gelo arîşeyên ku hûn texmîn dikin di paşerojê de rastî wan werin çi ne?. Lê dixuye ku hewldana darbeya tirkî ya têkçûyî, rê li ber axiftina li ser kompaniya tirkî girt ya ku prosesên perwerdekirina endaminan li ser şerê mîlîsan bi rê ve dibe, da ku pirsa rola wê di rûbirûbûna endamên artêşê de yên ku dixwstin darbeyê li dij hikûmeta Erdogan were kirin.

Bi vê yekê, ixwan û Erdogan û komikên radîkal nikarin jev bêne veqetandin, çimkî ew hemû amûrên mêtingeriyê ne, lê bi teşeyeke ku xwe bi qalikekî olî nixumandine.

Peywendiyên bazirganî yên berdewam di navbera Daiş û rêjîma tirk de:

Li gor rojnameya "Telegraph"ê ya brîtanî, rêjîma sûrî –ya rastir ya tirkî- ne tenê petrolê ji Daişê dikire, lê belê alîkariya wê di pêxistin û birêvebirina hin navendên petrol û gazê de dike. Ku petrol jêdera herî mezin e ya ku rêxistina Daişê xwe dispêriyê, ji aliyê xwebesiyê di milê fînansekirinê de. Ev yek jî ji dema ku rêxistinê zeviyên petrolê yên li rojhilatê Sûriyeyê kontrol kirin. Li gor amareke "Foreign Policy"yê, Daiş 44 000 bermîlî rojane li Sûriyeyê hildiberîne û 4 000 bermîlî li Iraqê; lewre rojane derdora milyon heta du milyon dolarî ji firotina petrolê derdixe. Telegraph amajeyê bi wê yekê dike ku rêjîma sûrî ji mezintirîn bikirên rêxistinê ye ku petrol bi riya bazirganên

navbeynkar piraniya caran jê re tê firotin, da ku li deverên di bin kontrola xwe de bi bihayekî kêmtir bifroşe; ji bo bidestxistina alîgiriya nişteciyan û sepandina kontrola xwe. Hin caran, rêjîma sûrî bajarên di bin kontrola Daişê de bi kehrebe dike, li hember bidestxistina sotemeniyê.

Her wiha tê gotin ku zevîyên petrol û gazê yên din bi riya karmenan tên birêvebirin ku hê mûçeyên xwe ji wezareta petrolê ya girêdayî rêjîmê werdigirtin. Di vê çarçoveyê de tê gotin ku biryara Yekîtiya Ewropayê ya ku di meha adara bihûrî da hat girtin, der barê birêzkirina navê karsazê sûrî Corc Heswanî, xwediyê kompaniya "Hîsko" ya hendesî di lîsteya sizayên ewropî de; ev yek jî ji ber karê wî weke navbeynkarekî di navbera rêjîma Esed û rêxistina Daişê da. Kompaniya "Hîsko" navendeke gazê li bajarê Tebqeyê bi rê ve dibe. Ev bajar jî ji tebaxa çûyî ve di destê Daişê de ye, li gor hin berpirsan ji wê demê ve ev navend bi hevkariya Daişê û hin kesayetan ji wezareta wezeyê ya sûrî tê birêvebirin. Her wiha bi berdewamî ji bo deverên di destê Esed de dihate hinartin.





**Deverên ku di destê *Daişê de bûn li Sûriye û Iraqê, jêder: Der Spiegel***

*Analîza ku navenda JTIC derxist, diyar dike ku % 64 êrîşên ku Daişê li Sûriyeyê pêk anîn, komikên rikberî rêjîma Esed û QSDê armanc digiritin û bi tenê % 13 ji van êrîşan hêzên rêjîma sûrî sala bihûrî armanc girtin.*

*Her wiha daneyên JTIC aşkere kir ku operasiyonên Esed –sêyeka wan topbaranên asîmanî bûn- ne Daiş lê komikên din armanc girtin. Çimkî ji 982 opersiyonên dijterorê ji destpêka 2017an û heta 21ê cotmehê, bi tenê % 6 ji operasiyonan yekser li bi ser Daişê de bûn. Li gor rojnameya* ***Der Spiegel*** *ya*

*almanî tu arîşeyên serkêşên Dewleta Îslamî nînin der barê wergirtina alîkariyê ji çekên asîmanî yên Esed. Dema şerê di navbera Dewleta Îslamî û şoreşgeran de di rêbendana 2014an de, firokeyên Esed cihên şoreşgeran bi tenê topbaran dikirin, di heman demê de emîrê Dewleta Îslamî ferman da leşkerên xwe ku Artêşa Sûrî gulebaran nekin, da ku Dewleta Îslamî hemû çekên xwe li dij şoreşgeran bi kar bîne; xwekuj bi ser wan de şandin da ku êrîşan li dij wan pêk bînin di heyama hindek hefteyan de bêhtir ji xwekujên ku Dewleta Îslamî di heyama sala çûyî de li dij Artêşa Sûrî bi kar anîn. Bi saya topbaranên asîmanî yên zêde, Daişê karîbû erdên ku demeke baş ji destê wê derketibûn, dîsa vegerîne.*




*Nexşeya belavbûna leşkerî ya komikên çekdar li Sûriyeyê, jêder: Business Insider*

Vepirsîna dawîn ya rojnameya Der Spiegel ya almanî derxist, ya ku behsa têkilyên Daiş û Rêjîma Sûrî dike û ya ku belgeyên ku Artêşa Sûrî ya Azad li mala Hecî Bekirî, kesê duyem di Daişê de, dîtin bi wê vepirsînê re bûn; vepirsîn nêrînên ku digotin ku binpêkirinên mezin hene û nîv hemahengiyek di navbera Rêjîma Sûrî û endamine Daişê de heye piştrat dike. Hecî Bekirî bi xwe berê efserekî besî istxbaratên asîmanî yên girêdayî Sedam Hisên li Iraqê bû. Dema rûdanên tundûtûj li Iraqê rûdan, Şamê pêşwaziya wî kir û peywendiyeke xurt bi istxbaratên Esed re çêkir, da ku dawî bibe yek ji giringtirîn berpirsên Daişê yêk ku bi awayekî veşartî kar dikin. Belge diyar dikin ka çawa Hecî Bekirî sûd ji têkliyên xwe yên berê ji bo pitvaniya projeya xwe girt.

**Beşa çarem: Nêrînên der barê Daişê de**

Keysa xwe ji nakokiya sinî-şîî anî û rêjîmên erebî piştvaniya wê kir...

"Daiş"... çêkereke îranî ye gefan bi parçekirina Iraqê dixwe, girtiyên "Esed" wê bi rê ve dibin

Bi pêşkêşkirina nêrînên nivîskar û analîzeran li gel rojnameyên Rojhilata Navîn, em dikarin dîmenekî saz bikin ku rehendên siyasî û leşkerî ji bipêşketina rola "Daişê" ya ku vê dawiyê zêde bûye, zelal bike.

Li gor nêrîna nivîskarê siûdî Xalid el-Mitrifî, Daiş çêkereke istxbaratî ya îranî ye. Armanca wê ragirtina helwesta el-Malikî ye û misogerkirina piştgiriya rêjîma Beşar e; bi riya bikaranîna vê karta tîreyî ji bo tevrakirina qerebalixê û pêkanîna destkeftiyan ji pey bihaneya şerê li dij terora "Daişê" li Iraq û Sûriyeyê. Di nivîsarekê de bi sernavê "Rastiya Daişê" li ser malpera "el-Erebiye Net" got ku Daiş li Iraqê hate çandin û striyên wê gihaştin Sûriyeyê. Kesê ku çavdêriya rûdanan bike, dê bizane kî gelekî sûd ji vê rêxistina terorîst digirt. Her wiha amaje pê kir ku berî çûna Daişê bo Sûriyeyê, rêjîma Beşar li ber ketinê bû. Daiş derbas bû û ketina rêjîmê dereng ma. Piştre şoreşger bi hev ketin û hê jî çîrok li Sûriyeyê komplêkis û ne zelal e. Her wiha bal kişande ser wê yekê ku Îran dixwaz  ji pey Daişê berjewendiyên xwe li deverê pêk bîne û destê xwe di Iraq, Sûriye û Libnanê cihê Hizbulah de bihêle. Di nivîsara xwe de bi ser ve zêde kir ku "piştî rûdanên dawîn li Iraqê, helwesta el-Malikî di nêrîna civaka navdewletî û civaka îraqî de xurtitr bû. Civaka ku niha hêviya rizgarkirina wê ji mertisiyên Daişê û paşrojeke nenas jê dike." Nivîskar berdewam kir: "Hemû destkeftiyên siyasî û leşkerî dê di berjewendiya Îranê de bin. Kesê ku li rewşa Sûriyeyê pêştî derbasbûna Daişê binêre û destkeftiyên Îranê û nêzîkbûna ber bi Rojava û Amerîkayê ra, dê vê yekê nas bike." Ji bo babetê teşeyên gefan yên ku Daiş li hemû devera erebî dixwe, Etailah Mihaciranî di nivîsarekê di "Rojhilata Navîn" ya Lundinî de bi sernavê "***Xwe ji gelacîyekê ku tenê ji we rastî stemkaran nayê biparêzin***" dîyar kir ku gefên Daişê bi sê aliyên giring kurt dibin:

Aliyê yekem: "Daiş" şîroveyeke seyr û radîkal ji îslamê re bi xwe digire. Çimkî ew xelkê bi hêsanî dikujin ku wêneyên ku wan vê dawiyê ji Mûsilê weşandin, vê gavê diyar dikin. Heke li Mûsilê yan le beşeke din ji Iraqê ma, dê serdema terorê dirêj bibe.

Aliyê duyem: "Daiş" ne tenê welat wêran dike, lê belê neteweyê hemûyî wêran dike. Çimkî parçekirina welat û neteweyê di heman demê de pêk tê, ev bandora sereke ji tiştên ku niha li Iraqê rûdidin re ye.

Aliyê dawîn: "Daiş" qîma xwe naîne ku fiteneya wê tenê di sînorê Iraq û Sûriyeyê de bimîne, lê belê weke agirê tu berdî pûş, dê bi lez li hemû aliyên deverê belav bibe; dibe ku dewletên cîran yên Iraqî û dewletine din tev bigire. Di heman çarçoveyê de, destpêka "Rojhilata Navîn" ya Lundinî bal kişande ser wê yekê ku metirsiya parçekirin û jinavçûna Iraqê, metirsiya herî giring e.  Amaje pê kir ku jinûvexêzkirina nexşeya deverê ne ji xêra nişteciyên wê re ye, çimkî dê ev yek bê şer û penberbûn û hwd pêk neye.

Ji aliyekî din ve, hin nivîskaran bal kêşande ser wê yekê ku nakokeiya sinî şîî, yek ji girîngtirîn nîşaneyên hebûna van rêxistinên terorîst e. Çimkî di bin sernavê "el-Hîlal we Teqtî el-Ewsal" de, "Heyat"a Lundinî di pêşgotina xwe de amaje pê kir ku Iraq halê hazir ne di bin metirsiya parçebûnê de ye, lê belê parçekirî ye, her wiha pêşveçûna "Daişê" ya bilez weke piştrastkirinekê li  ser xirabbûna têkiliyên sinî-şîî ye. Amaje pê kir ku krîza cihê sine ne tenê li Iraqê heye, lê belê li hemû devera ku niha çapemenî carinan navê el-Hîlal el-Şîî yan Hîlal el-Mumane –Iraq, Sûriye, Libnan- lê dike. Ew devera ku Îranê dikarî guhetinên mezin di dewletên wê de çêke". Her wiha tekez kir ku "bijarede yan vegera li rêzgirtina hevsengiyan û sazkirina levkirinên rasteqîn e yan jî şerekî dûvdirêj e ji bo standina cihên zêrîn ji Hîlalê. Şerek e ku rê ji "Daiş" û hevalên wê re vedike ku xwe li vir yan li wir bi cih bikin yan bi pêş bikevin û bermayên binyadên dewlatan bi dawî bikin li gel parçekirina pêkvejiyanê û nexşeyan. Amaje pê kir ku rûdana herî tirsnak ku dibe pêk were, ew e ku Îran serederiyê bi tiştên ku li Iraqê çidibin, tenê weke kompleyekê ji bo parçekirina Hîlalê û tişta ku li Sûriyeyê kir, bibîne."

Di rojnameya "el-Xelîc" ya îmaratî de Ebdîlah Belqzîz di bin sernavê "Daişa bi şaşîtiyên me mezin e " de got ku yên ku -bi diravan yan bi biryara sîyasî- ji belavbûna tevliheviyê li Sûriyeyê bûne alîkar û piştevaniya "rikberiyê" û komikên çekdar di şerê li dij rêjîm û artêşê de kir, mebesta wan têkçûna wan her duyan bû. Bûne alîkar -dibe ku bê qesda wan be- di mezinbûna komikên şerker yên weke "Daiş" û "Cebhetulinesre"yê û yên weke wan û ji wan re jîngeheke dewlemend ji bo mezinbûn û belavbûnê amade kirin. Der barê dewleta angaştkirî de Basim el-Şêx di "Destûr"a iraqî de got ku "Kesê ku li

pey êrişên Daişê li dij bajarên Iraqê disekine ji ber sedem û daneyên cihêreng, dizanin ku nikarin wan bajaran di destê xwe de bihêlin; her çiqas hêvîyên wan ji ber vekişîna artêşê ji wan deveran ava bûbin. Û di bin sernavê "Daiş û Hevbendên wê Vegera bi paş de nîne" tekez kirk u "Daiş û hevbendên xwe nikarin dewleta xwe ava bikin, ya ku siloganên nerast jê re didanin, çawa ku Beis venagere desthilata Iraqê bi heman awayê berê û dîktatoriya xwe vegirîne. Lê deriyên Iraqê li pêşiya hemû zarên wî yên dilsoz vekirî ne, yên ku danpêdanê bi rêjîma wî dîmokratî ya nû dikin; çi tiştên ji bilî wê dê li hember têk biçe. Li aliyekî din, pêşeka rojnameya "el-Weten" ya siûdî, di bin sernavê "Iraq û vegera li dama sifir" amaje bi serkêşên rêxistina terrorist kir ku "hin çavdêr rola "Izet Edûrî" zilamê duyem di rêjîma Sedam Hisên de di bê derbarê de aşkera kir; yê ku serkêşiya rêxistina bi navê "Artêşa Neqşebenî" dikir. Weke ku tê gotin ew artêşa rasteqîn e ya ku piştî têketina Amerîka li Iraqê sala 2003yan hate jevxistin. Li gor jêderan "Izet Edûrî serkêşiya nîv şoreşekê li dij Malikî û rêjîma wî dike". Bi xwendineke din, rojname dibêje "Daiş hin êlên sinî di bin sîwana Izet Edûrî de ne, li kêleka efserên artêşê yên kevn. Li vir êdî pirsnîşanên li ser derketina artêşa Malikî ji cihên xwe ji hole radibin. Ew jî heke em bizanin ku bawa artêşa Malikî "tîreyî" ye, piştî ku tevlêbûna li artêşê bû dilxwazî, karekî peywirî kir."

Li milekî din, nivîskarê sûrî Elî el-Aid di gotareke ku rojnameya "el-Heyat" ya londonî ew weşandbû de tekez kirk u hejmara islamiyên ku Rêjîma Sûrî di nîvê yekem yê sala 2011an de berdan, gihaşte nêzîkî 900 girtîyî, piraniya wan têkildarî şerê li Iraqê bûn, çi bi riya rêxistina "Dewleta Islamî li Bîlad el-Rafîdeyin" yan jî bi riya rêxistina "Fetih el-Islam". Di bin sernavê "Daiş yan Rêjîm.. lê belê Daiş û Rêjîm" de got ku kesê herî xuyayî ji nav wan Ebû Mihemde el-Colanî bû serokê "Cebhet Nisret Ehil el-Şam", yê ku li Firiê (navend) Filestîn li nik îstixbaratên leşkerî ji 2008an ve li Dîmeşqê girtî bû û di sala 2011an de hate berdan. Kesên ku serbest hatin berdan tovê pêşîn û şaneyên bingehîn bûn ji komikên radîkal yên bingehîn yên ku nihja şerê Rêjîmê dikin. Bi ser ve zêde dike û dibêje ku "Rêjîma Sûrî ne ehmeq e, çimkî ew serbestberdan da ku tişta ku îro dikin, bikin. Ji ber ku Ebû Mihemed el-Colanî , Ebû Taha û Cemîl Zên yê ku bi Ebî el-Husên tê naskirin serbest hatin berdan da ku "Cebhetilnesre" ava bikin. Ebû Hefîze tev li rêxistina Daişê bû, her du komik girêdayî el-Qayde ne û bakurê Sûriyeyê kontrol dikin. Ehmed Îsa el-Şêx serkêşiya Lîwa Siqûr el-Şam dike, Hesen Ebûd serkêşiya Lîwa Ehrar

el-Şam dike û Zehran Elûş serokê Ceyiş el-Islam e, piştrast kir ku ev hemû gitîyên zindanên Rêjîma Sûrî bûn.

Der barê helwesta rojavayî ji gefên terorîstan de, nivîskarê siûdî Tariq el-Hemîd di rojnameya "Rojhilata Navîn" ya londonî de di bin sernavê "Iraq… Belê Berevaniyek di ber Obama de" pesinê helwesta serokê amerîkî da yê ku şandina hêzên di dema niha de ji bo Iraqê yan jî bikaranîna hêza leşkerî li wir red kir. Amaje pê kir ku Washington mercek ji bo alîkariya Iraqê danî, ew jî ku iraqî bi xwe bikarin li hember parçebûnên kûr yên di navbera xwe da bi ser bikevin "û şêwazekî bi rêk û pêk û aktîv ji bo avakirina yekîtiya niştimanî ya ji bo bipêşketina welat û rûbirûbûna gefên rêxistina Daişê pêwîst pêk bînin." Dawî "wan bi xwe got".. Daişê bi rastî askere dike: "Deynekî giran yê "el-Qayde" di stûyê  Îranê de ye." Her wiha têkilya di navbera her du aliyan de piştrast kir û bi vî awayî dawî li derewên rêxistina terrorist û Komara Îslamî anî yên ku bi hemû hêz xwe dixwstin vê têkiliyê bi guman bikin yan jî wê rad bikin. Ev rastî piştî nakokiya di navbera Daiş û el-Qayde de diyar bû û berdevkê kesên ku xwe bi navê Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê Ebû Mihemed el-Ednanî di tomareke deng de ev yek got; li gor rojnameya "el-Weten" û tê de bersiva daxuyaniya serkêşê rêxistinê Eymen el-Zewahirî da.

Tomara bi navê "Bibore Mîrê el-Qayde", peywendiya el-Qayde bi Îranê re aşkere kir ku Tehran alîkariya el-Qayde di hêsankirina gihiştina cebxaneyê ji bo şervanên wê de dikir. Her wiha "Daiş" li xwe mukir hat ku li gor arasteyên el-Qayde wê çavên xwe ji Îranê girtin û "Daişê" bi daxuyaniyekê peyrewbûna ji el-Qayde re red kir. Berdevkê "Daişê" got: Gelek kesan daxuyaniya dawîn ya mîrê "Rêxistina el-Qayde", Eymen el-Zewahirî li gor xwe  şîrove û analîz kir. Çimkî el-Zewahirî tişt bi navên wan bi nav nekirin, ji bilî dijberiya di navbera agahiyên di vê daxuyaniyê de hatin û daxuyaniyên kevin de. Bi taybet babetê girêdayî peyrewiya "Dewleta Îslamî" ji Rêxitina el-Qayde re ku el-Edinanî mubayekirina Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê (Daiş) ji el-Qayde re red kir û bi gotina xwe: "Me tu rojê rêxistina el-Qayde mubaye nekiriye" ev yek piştrast kir.

El-Edinanî bi ser axiftina xwe ve zêde kir û got ku şervanên Dewletê dema ku daxuyaniyên dawîn ên el-Zewahirî bihîstin, wan got: "Şêx xuriftiye." El-Edinanî daxwaz ji el-Zewahirî kir ku ji daxuyaniyên xwe vegere û daxuyaniyeke zelal bi vê yekê derxew, heke weha nekir, divê tu lome ji

Dewleta Îslamî nebin li ser tiştên ku di rojên bê de bike. Her wiha el-Edinanî di tomara xwe de aşkere kir ku "Daiş"ê li ser daxwaza el-Qayde û ji bo parastina berjewendiyên xwe û riyên biçekirinê, şerê Îranê nekir. Û got: "Dîrok dê tomar bike ku deynekî mezin yê el-Qayde di stûyê Îranê de heye." Û "Dewleta Îslamî", li gor arasteyên serkêşên el-Qayde, çavên xwe ji Îranê girtin û leşkerên xwe yên xwîngerm hedinandin, tevî ku wê dikarî Îranê li birmeke xwînê veguherîne.

El-Edinanî bi navê mîrê xwe Ebû Bekir el-Bexdadî -yê ku cara dawîn destpêka 2019an de xuya bû- el-Zewahirî tawanbar kir ku wî bi şehdebûna xwe ya  dawîn xelk tevlihev kir û "Xwe ji bo piştrastkirina mijareke nepiştras westand", mebesta wî jê mubayea "Daişê" ji el-Qayde re, ji bo leşkerên "Dewletê" wekî kesên xayin bide xuyakirin. Berê axiftina xwe da wî û got: "Heke Xweda ji were kire nesîb ku hûn bikevin erda Dewleta Îslamî de, hûn ê wê mubayea bikin û ji mîrê wê yê qureşî niviyê el-Huseyin re bibin leşker. Îro hûn di bin destê Mela Umer de leşker in. Nabe ku mîrnişînek yan dewletek mubayea rêxistinekê bike". Bi bîr anî ku el-Qayde Mela Umer û Tevgera Talîban mubayea kiriye. Di dawiyê tomarê de el-Edinanî daxwaz ji serkêşên din yên el-Qayde kir ku helwesta xwe ya zelal der barê Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê bi daxuyaniyeke fermî ragihînin. Amaje pê kir ku bêdengiya wan mîna erêkirinê ye ji daxuyaniyên el-Zewahrî re û ev bêdengî weke şerê Dewletê tê dîtin. Li gor wê dewlet bêdeng namîne û dê rêbaza xwe bi hemû hêza xwe biparêze. Li milekî din, miftiyê Cebel Libnan, Şêx Mihemef Elî el-Cozo êrîşî Hizbilah kir û ew tenê weke amûrekê ji bo pêkanîna ajandayên Îranê bi nav kir ku hewl died Îranê weke hêzekek tekane li Rojhilata Navîn bi cih bike. Her wiha daxwaz kir ku serkêşên Hizbilahê werin darizanin; yên ku fermana kuştina Refîq el-Herîrî ji bo razîkirina Beşar el-Esed dan.

Li gor tiştên ku der barê piştrastkirina têkiliya Daişê bi Îranê re, bi sernavê "Deh biyang piştrast dikin … Daiş çêkereke îranî ye"; gotineke dadmend e ku mirov bibêje ku hemûyan ev çêker li gor berjewendiyên xwe bi kar anî, piştî ku biserkeftina xwe tekez kir. Lewre bi hinek mentiq û analîzê mirov digihe gelek xalan li gel biyang û piştrastkirinê. Her deh biyang ev in:

1. Di 24.4.2014 de rojnameya Times ya londunî raporek weşand. Rapor amaje dike ku hin berpirsên sûrî û libnanî yên peyebilind "Lîwa Elî Memlûk,

Eqîd Heyder Heyder" ji bi sedan şervanên şîîyên îraqî yên ku li Sûryeyê dimînin, bi teybet li Helebê, rê xweş kir ku bi belgeyên îraqî yên sexte tev li Daişê bibin.

2. Di 14.12.2014 de ajansên nûçeyan yên biyanî hin rapor weşandin, rapor tevlêbûna Rêjîma Îranê li hewldanên Rûsya û Rêjîma Sûryeyê der barê astengkirina damezrandina her hevpeymaneke navdewletî ji bo şerê rêxistina Daişê ya terrorist.

3. Biryarên Daişê ji kok ve guherîn. Ji geflêxwarina ku êrîşî Bexdayê bike, te bi geflêxwarina ku êrîşî Kurdistanê bike, armanc ji vê gavê jî zelal bû; yek rewatiyekê li derbasbûna hêzên Îranê li Iraqê bar bike, di bin sîwana bihaneya parastina pîroziyên şîî, her weku berî hingê li Sûriyeyê kirin û destê xwe danîn li ser dewlemendiyên wir. Ya duyem ku ev ya tirsnaktir e, kurdan ku dijminên hikûmeta şîî ne di navbera du agiran de bihêlin; agirê xwe û agirê Daişê. Têketina dewletên rojavayî di şer de û rijdbûna wan li ser rûbirûbûna Daişê li Kobanê, ji bo baweriyê li kurdan vagerînin bû, ev yek û ya duyan ji bo ku ragihînin ku Kurdistana Îraqê ji her kesî re xeta sor e û ya sêyan ji bo ku berê Daişê bidin aliyê ku ew dixwazin, madem her kes sûdê jê dike

4. Daiş berdewam êrîşî bajar û parêzgehên sinî û kurd dikir û karên şewat û wêraniyê dikirin. Herweha bi dehan ku ne bi sedan be xelkên wê kuştin û şewtandin. Ev çend biyangeke din e li ser arasteya şîî yah in baskên Daişê, da ku sineyên Îraqê li pêş du bijardeyan bihêlen; Yn serê xwe ji Daişê re daxin yan jî serê xwe ji hikûmeta şîî re daxin. Di her du rewşan de jî yên dibine qurban ew in. Tê zanîn ku bi sedan leşkerên ku li bingehê Spayker li Tikrîtê hatin kuştin, bi destê beisîyan, ne bi destê Daişê hatin kuştin.

5. Sûriye, Rûsya û Îran li hember bikaranîna hêza leşkerî li dij Daişê rawestiyan; bi taybet li Sûriyeyê.

6. Çima Daiş şerê artêşa Esed nake ji dêlî ku şerê Artêşa Sûrî ya Azad û komikên din yên islamî bike.

7. Çima Rêjîma Esed Daiş li Heleb, Reqa, Dêrezorê û hwd topbaran nake, ji dêlî ku sivîlan topbaran bike.

8. Çima Bexdadiyê Xelîfe fermanê nade leşkerên xwe ku berê xwe bidin Şamê, ji bo ku Rêjîma Esed ya xwînrêj bînin xwarê ku piştgiriya şoreşa sûrî bike û sînorên dewleta xwe berfireh bike.û piştre baskên Îran û Hizbelah û mîlîsên wan bi taybet li Sûriyeyê  jê bike; ji dêlî ku berê xwe bidin gund û bajarên kurdî û sinî?

9. Çima Daiş aşkera gefan li Îranê naxwe, herî kêm bi çend çalakiyan li derve, heke li hundir nebû, herweha çima heman gavê bi Rêjîma Sûriyeyê re nake?

10. Dawî …? Ji min bipirse kê petrola Daişê dikirî û difirot … ez ê ji te re bibêjim kesên ku ew bi kar dianîn û diparastin. Tu yê sûdeke îranî û beisî bibînî. Çimkî zanyariyên piştrast û bibelgekirî amajeyê dikin ku Waliyê Reqayê, kesê bi navê Ebî Luqman, ew e yê ku têkiliya di navbera Daiş û Rêjîma Sûriyeyê de saz dike. Birêvebirina çalakiyên şandina ptrol û gazê rojane ji bo Rêjîmê jê dihat xwestin. Dais parastina wan zevî û parzûnan dikir li hember ku Rêjîm alav û andezyaran jê re peyda bike. Rêje jî %60 ji Rêjîmê re û %40 ji Daişê re, bêyî ku bela xwe li hev bixin.

Dîsa hin biyang û piştrastkirin:

**1.** Hebûna el-Qayde li Îranê? Çimkî hin rojanmeyên rojavayî zanyarî ji hin aliyên istixbaratan yên navdewletî girtin û weşandin ku bi dehan ji serkêşên rêxistina el-Qayde li Îranê hene. Navên hin serkêşan:

a. Izedîn Ebdilezîz Xelîl, xwediyê nasnavê Yasîn el-Sûrî, serkêşekî rêxistina el-Qayde, azad li Îranê digire û karê xwe dike; ev çend jî li gor rêkeftinekê di navbera el-Qayde û hikûmeta Îranê de.

b. Mihsin el-Fedîlî, bi regeza xwe kiwêtî ye, yek ji serkêşên rêxistina el-Qayde li Îranê weke cînişekî ji Yasîn el-Sûrî re.

c. Adil Radî Seqir el-Herbî, alîkarê Mishsin el-Fedîlî ye. Yek ji karkerên herî xuya ye di milê fînansekirin û karkirina rêxistina el-Qayde li Îranê.

ç. Mihemed Silahedîn Zêdan, bi nasnavê "Seyfuledil" tê nasîn. Ji Mirsê ye. Ji Efxanistanê reviya Îranê û li wir bû koçber li hemebr hevkariya wî bi istxbarata Îranê re.

d. Silîman Ebû Xeys, zavayê Bin Ladin e. Peyvdarê el-Qayde ye. Demeke dirêj li cihekî ewledar li Îranê me.

e. Macid el-Macid. Bi regeza xwe siûdî ye. Emîrê tabûrên Ebdele Ezam e yên girêdayî el-Qayde. Berî ku wî li Libnanê bigirin destpêka sala 2014an, dirav, piştgirî û perwrede ji Îranê digirtin. Hin alakvanên din jî yên el-Qayde li Îranê "Cefer, Yasîn Cefer el-Uzbekî yan Elmizûn Ehmed û Fîtş Sadqîf" birpirsekî mezin yê el-Qayde ye, ji çend salan ve li bajarê Meşhedê li Îranê dimîne û endamê Yekîtiya el-Cîhad el-Islamî el-Alemî ye.

**2.** Pirsên Vacî:

Çawa rêxistineke wiha bi hêz û hişk û xwedîderfet dikare çalakiyên terrorist li cîhanê tevî pêk bîne her wekî li New York, London, Madrîd, Mosko, Parîs, Indonsya, Tenzaniya, Pakistan, Siûdiye û Iraqê, lê nikare çalakiyeke tenê jî li Îranê bike.

**3.** Danezanên hin birpirsên sûrî:
Çimkî her kes Ebdilhelîm Xedam, Cîgirê Serokê Komara Sûriye yê kevin dinase û gotinên wî ji bo çapemeniya cîhanî di hezîrana 2014an de: "Îranê Daiş anî Sûriyeyê, ji bo ku pela şoreşa sûrî reş bike; piştî ku Rêjîma Sûrî û şebîhên xwe nekarîn wê bişkînin. Herweha daku Esed weke parêzvanê kêmaran bide diyarkirn ku ew şerê terorê li deverê dike". Bi ser ve zêde kir ku ew xweş dizane ka çi dibêje "ku Îran beşek e ji şer û pevçûna ku li Sûriyeyê digire", ji ber ku hêzên Rêjîmê, deverên ku Daiş lê topbaran nake. Dêmek ketina Rêjîma Sûrê, dê derbeke biêş be ji Rêjîma Îranê re.
**4.** Belgene Bêguman:

Hin belgeyên istxbaratên rojavayî aşkera kir ku alîne îranî yên ku destê wan li Îran, Îraq û Sûriyeyê dirêj e, rêya veguhastina çek û leşkeran ji bo rêxistina el-Qayde ya niha bi navê Daişê ye hesan dikin, ji bo ku rikberiya sûrî parçe bikin û wê bi şerekî din mijûl bikin; herweha heman gav li Îraqê pêk anîn. Çimkî çend belgeyên îranî li nik Daişê hatin dîtin, li navenda fermandariya wan li gundewarên Helebê yên rojavayî. Her wekî pasportine îranî yên hin leşkerên biyanî yên Şîşan û Kazexistanê, herweha sîm kardên telefonê; dêmek ev çende piştrast dike ku hemahengî di navber wan û Îranê de heye.

**5.** Rûxandina dêr û meqaman, wekî mînak Daişê li Reqayê dêr û meqamên sofî wêran kirin û dest neda meqam û cihên şîî yên pîroz.
**6.** Analîzkirina êrîşan, çimkî wekî mînak li başûrê Helebê, Daişê hin dever vala kirin ku di destên wan de bûn û radestî Artêşa Rêjîmê kir û beşin ji deverên rojhilatî û bakurî û rojavayî yên bajêr dagir kirin. Herweha tevî girîngiya wan ya stratejîk, wan bela xwe di du gundên şîî "Nubl û Zehra" neda.
**7.** Gotina Amerîkayê

Dadgeheke amerîkî li Waşintonê sala 2011an, hukm da. Hukm tekez dike ku Îran piştevaniyeke madî daye el-Qayde, ji bo ku teqînên Dareselam sala 1998an pêk bîne. Herweha têkilî di navbera Îran û el-Qayde de, piştî rûdanên

11ê îlûna 2001ê, bi pêş ketiye. Îranê ew li Îraqê jî li dij hêzên amerîkî bi kar anî, da ku Amerîka ji wir derxe û bi tenê bimîne. Peyre têkilî di navbera wan de bi pêş ket û Daiş jê afirand. Şanoya ketina Mûsilê di destê 400 endamên Daişê de, komployek bû der heqê siniyan de da ku wan biherişînin û hejar bikin û bajarên wan bi destên wan birûxînin. Dawî Daiş dimîne kêka şeytanê mezin û diyariya ezmanan ji bo pêkanîna împeratoriya farisî, ya ku li pişt rastiya niyazên melaliyan; dijminên azadî û demokratiyê. Herweha ji wan re bû bihane da ku derbasî dewletên deverê bibe "Îraq, Sûriye, Yemen û sibe Mesir û Siûdiye" bi saya nezaniya el-Ezher û melikên wehabî.

Hûsî û Daiş … dijminatiyeke aşkera û hevbendiyeke veşartî bi serperiştiya Îranê. Raporin hene wê çendê piştrast dikin ku têkil di navbera Rêjîma Îranê û Daişê heye û belge û pasportên îranî ku li baregehên rêxistinê hatine dîtin, vê yekê piştrast dikin. Çimkî dema rêxistina Daişê li bajarê Edinê derket, destpêka vê mehê, gelek pirs li ser têkliya vê rêxistina radîkal bi hûsîyan re derketin pêş   ku Îran wan bi dirav û çekan bar dike.

Hin raporên erebî û navdewletî amajeyê bi hin lêkolînên bibelgekirî dikin ku têkiliya Rêjîma Îranê bi Daişê re piştrast dikin. Ev yek jî bi rêya hin belgeyên fermî û pasportên îranî yên ku li baregehên Daişê hatin dîtin, piştî ku şer di navbera wê û komikên din li Îraqê û Sûriyeyê rûda. Li gor raporan "endamên Daşê pasportên îranî bi kar anîn da ku di navbera Îran û Sûriye û Îraqê de herin û werin. Li kêleka vê çendê jî gelek sîm kardên îranî hebûn ku hebûna hevpeywendiyê di navbera serkêşên Daişê û istixbaratên Îranê de piştrast dikin." Komikên çekdar yên radîkal sûd ji nebûna ewlehiyê û çekên têrbelav li bajarê Edinê kir, da ku hebûna xwe biçesipîne û çalakiyên xwe li bajar pêk bîne, li gel operasiyoneke çapemenî ya mezin ji hêla navgînên ragihandinê yên ixwanî. Her wekî derbasbûna li fakulteyan bi bihaneya cudakirina keçan ji xortan û derbasbûna li navendên bazirganiyê da ku karmendên jin neçar bikin ku hîcabê li xwe bikin. Gelek siyasî, nivîskar û rojnamevan lê mukir tên ku komikên çekdar li Edinê hene, lê kontrolkirina wan ji bajêr re red dikin ku amajeyê pê dikin ku hêzên Hevpeymana Erebî û Berxwedana Başûrî û hêzên asayîşê li bajar hene.

Nivîskarê yemenî, Basim Mihemd el-Şiêbî, bi ser van biyang û piştrastkirinan ve zêde dike ku "kes nikar hebûna el-Qayde û komikên din ên çekdar li Ednê mandele bike. Lê gotina ku el-Qayde bajar kontol kiriye, ne

zêde di cihê xwe de ye. Rast e el-Qayde û Daişl sûd û nebûna ewlehiyê û nemana saziyên leşkerî yên dewletê girt, lê kotrolkirina bajar, li gel hebûna çekan li rex komikên li dij wan, karekî zor û zehmet e". Lê el-Şiêbî di axiftina xwe de ji bo Tora "Irm"ê ya Nûçayan hişyariyê dide û dibêje ku "heke desthilatên Yemenê yên rewa berxwedan bi yek nekin û yekîneyên artêş û asayîşê li başûr ji xelkê wan ava nekin, ne dûr e ku Edin bikeve destê el-Qayde û Daişê.

Gelek berpirsên leşkerî û çalakvanên siyasî hebûna komikên radîkal li Ednê ne weê asta tersnakiyê de dibînin, ji ber ku endamên wan kêm in. Birêveberê asayîşa Edinê, Mihemed Misaid el-Emîr, di danezanekê de got ku "hin kesên çekdar û radîkal li Edinê hene, lê ne komik in; weku ragihandin wan bi wêne dike". herweha hebûna leşkergeh yan hêzên rasteqîn yên van komikan li bajêr red kir.

**Beşa Pêncem: Têkiliya Tirkî û Daişê û kuştarên li Şengal û Kobanê**

Weke ku me dît, tirk bi her awayî piştevaniya rêxistina Daişê ya terrorist kiriye, her wekî biçekkirina şervanan bi çekên herî nû û cebilxaneyê û avakirina leşkergehên perwerdeyê li hundirê Sûriyeyê û hemahengiya hevbeş di navbera Daiş û Tirkî yê de. Her wiha tê têbînîkirin ku rêxistina Daişê ya terrorist, çalakyeke tenê jî li dij Tirkî yê encamp nedaye; tevî ku li sînorekî hevbeş di navbera wan de ye li Sûriyeyê û endamên rêxistinê li hundirê bajarên Tirkî yê digerin. Tişta seyr ew e Tirkî ya ku angaşta dike ku ew şerê "Daişê" dike, tu çalakiyên leşkerî li dij endamên rêxistina radîkal pêk neanîne. Lê piraniya bombebarana firokeyên wê, bi ser cihên hêzên kurdî tenê de ye; bêyî ku careke tenê jî ji dil baregehên rêxistina Daişê li Sûriyeyê bombebaran bike. Li gor jêderine leşkerî yên îraqî, Tirkiya ware herî biewle ye ji bo endamên Daişê yên ku ji Sûriye û Îraqê direvin. Herweha amaje dikin ku istixbarata îraqî, alîkarê yekem yê fermandarê Daişê Ebû Bekir el-Bexdadî, li hundirê Tirkî yê girt. Hikûmeta Sûriyeyê, rêjîma Tirkî yê bi perwerdekirin û biçekkirina komikên terrorist li Sûriyeyê tewanbar dike. Ku sînorê xwe ji terorîstan re vedike û rê dide ku heyberên teqîner û mûşek derbasî Sûriyeyê bibin û cihekî ewledar ji radîkalên ku ji Îraqê direvin, peyda dike û nasnameyên sexte ji wan re çêdike, da ku wan ber bi Ewropayê ve bişîne ji bo ku çalkiyên terrorist pêk bînin ku rajeya ajandayên Tirkî yê dikin ya ku li

endamtiya Yekîtiya Ewropayê digier û peilka koçberên sûrî ji bicihkirina ajandayên xwe bi kat tine.

Çimkî li Şingala Kurdistana Îraqê, terorîstên Daişê di tebaxa 2014an de komkujî der heqê kêmara êzdî û xiristiyan pêk anî. Di encamê de nêzî 5 000 kesên bêsûc bi destên endamên terorîst bûn Qurbana vê komkujiyê û zêdeyî 100 hezar kesên sivîl derbider bûn; berî ku Şingal ji terora Daişê di mijdara 2015an de, bi saya hêzên Pêşmerge were rizgarkirin û hevpeymana bi hêzên Partiya Karekerên Kurdistanê re û hêzên din li Kobanê bakurê Sûriyeyê ya li ser sînorên Tirkî yê , Daişê 340 gund û bajarokên kurdan yên girêdayî bajêr control kirin û %80 ji wan di her du mehên îlon û cotmeha 2014an wêran kir û sivîlên bêçek kuştin û serjê kirin. Herweha 300 hezar hemwelatî neçar kirin ku ber bi sînor ve penaber bibin. Tirkî yê rê ji radîkalên Daişê re xweş kiribû ku tev li çek û ceblixaneya xwe sînorê wê derbas bikin. Piştî çar mehan, di rêbendana 2015an lehengên hêza QSDê yak urd û hêzên Pêşmerge, bajar rizgarkirin; di encamê de 14 hezar terorîst jiyana xwe ji dest da.

Em têbînî dikin ku Tirkî yê piştgiriya Daişê li Şingal û Kobanê kir. Piştevanî jî bi gelek awayan bû, her wekî ji hêla zanyariyan ve ku agahî der barê gundan de yan li ser belvbûna hêzên li dij Daişê yan jî pişrgiriyeke lojistî ku derfeta çek û siwareyan vekir, bi teyabet bi rêya kompaniya Sadat, Sadat Bekir. Herweha derbasbûna endamên terorîst bi rêya dergehê tirkî li Şingal û Kobanê, heta wê astê ku rêya revîna wan ji Şingal û Kobanê peyda dikir; piştî ku ji terora Daişê hatin rizgarkirin û dermankirina birîndarên terorîstên Daişê li hindirê Titkiyeyê û perwerdekirina wan li leşkergehinan ku AKPê bi xwe, pariya Erdogan, serperiştiya wan dikir.

Bi rêya vê pêşkêşkirinê, ji me re piştrast dibe û bê guman ku Daiş û terora wê, çêkerek e ku gelek xwediyên wê gelek in; Tirkî û Îsraîl, Îran in. Van her sê dewletan û heta bi Rûsyayê jî dît ku hemahengiya bi van komikan re rajeya berjewendiyên wan dike. Yan jî afirandina hin komikên mîna wan li deverên xwe yên erdnîgarî, da ku heman karî bikin. Ne ji piştevaniya amerîkî, brîtanî, îsraîlî, îranî û tirkî bûya, Daişê ev qas destkeftiyên siyasî û leşkerî bi dest nedixistin û ew qas parêzgeh control nedikirin. Dêmek destê hemû aliyên navdewletî û herêmî di nav Daişê de heye ku ew xistine hêzeke pir xurt û parêzgehên pêkhateya ereb ya sinî yek ji qurbaniyên vê reêxistinê bû.

Em dikarin biyangan kom bikin; biyangên li ser Daişê ku rajeya berjewendiyên çend hêzên herêmî dike. Tirkî wê bi xwe digire ku 26 baregehên leşkerî yên girêdayî Natoyê dihewîne. Baregehên Natoyê û baregehên xwe ji bo rajeya vê rêxistinê bi kar anên, her wekî Kompaniya Sadat. Em dikarin buyangan bi vî awayî rê bikin:

1. Kurtkirin "Abriviation" adeteke latînî û ibrî ye jî. Em dibînin ku pergalên ewlekariyê wan kurtkirinana bi kar tînin û em piştrast dikin ku Daiş rêxistineke terorîst e, sê baskên wê hene û her yek ji wan di destê dewletekê de ye. Û ev kurtkirin "ISIS" Daişê tê wateya Dewleta Îslamî li Îraqê û Sûriyeyê "Islamic State in Iraq & Syria", lê ew bi xwe baskê tirkî ye jê û kurtkirina wê ev e "International Sadat Intelegentt Service" ango Îstixbaratên Sadat yên Navdewletî yên veşartî; artêşa Ardogan ya veşartî ye li dij kurdan. Baskê îranî, kurtkirina wî "International Savac Intelegent Service" e. Nivîsgeha îstixbaratên Ewlekariya Navdewletî ya îstixbaratên îranî ye, di destê Parêzvanên Şoreşa Îranî de ye ku hevkariya Beis li Sûriyeyê dike û li dij rikberên Beşar dixebite. Baskê sêyem îsraîlî ye, "Israel Secret Intelegent Security" û tê wateya îstixbaratên ewlekariya veşartî yên îsraîlî; ji bo bicihkirina bandora dewleta dagirkeriyê kar dike. Rastî jî ew bi qasî wateya gotina saziyê ye, weke kurtkirina wateya Mûsada îsraîlî; ji ber ku adeta kurtkirinan ji bo zimanê erebî adeteke biyanî ye.
2. Rêxistina terorîst teknîkên herî nûjen bi kar anîn. Alavên wênekêşanê yên bipêşketî, her wekî "Kirîn" ya biha û "Silayder" di derhêneriya filman de bi kar anîn. Ev alav tenê li cem pergalên îstixbaratan yên xwedî şiyanên mezin peyda dibin; mîna îstixbaratên tirkî û Mûsada îsraîlî.
3. Xişrên (akseswar) rêxistina Daişê û bi taybet ya ku di wênekêşana kuştina dîlên mesrî li Lîbyayê xuya kir, terorîstê ku bi navê Daişê diaxivî seeteka destî ya Rolex li destê wî yê çepê bû. Ev yek ne li gor adetên komikên cîhadîst e, ku seetan li destê xwe yê rastê dikin.
4. Bikaranîna xencerên kolombî ku weke kêreke tûj e û yek ji çekên Natoyê ye yên leşkerên peyade.
5. Wergerandina pêşgotina filmên xwe di asteke bilind de û bikaranîna zêdeyî rengekî di nivîsînê de, teybetiya rengê sor yê xwînê û axiftina xweş û sivik ya bêjeran. Herweha weşana kenalên van koikên terorîst bi taybet ji Tirkî yê.
6. Bikaranîna rûpoş û cil û bergine wekhev û yekker ji bo terorîstan, ev taybetî ya hêzên taybete, herweha cilên ragihandinê. Nebaşî der heqê ola îslamî de kirin û nimêja li ser yê bi şûr weke rehemtekê ji bo xelkê hatiye

şandin, ev ne li gor deqa îslamî ye "Me tew eke rehmetkê ji bo xelkê şand". Teknîkên çandina mînan û bikaranêna kemînan, nîşane wê yekê ne ku ev endam perwerde derbarê devera Rojhilata Navîn de dîtine û wê nas dikin û endam û kêmarên wê nas dikin, ev lêkolîn girêdayî amojgehên ewlekariyê ne.

7. Binyada xurt û xweragir ya endamên rêxistinên terorîs yên Daişê mîna ya endamên hêzên taybet e, herweha em dibînin bê çiqas ferqa bilindahiyê di navbera wan û dîlan de heye.

8. Heke derfetên zanyarî yên mezin peyda nebin, gihiştina sînorên rêxistinê pêk nayê. Ev zanyarî ne bi rêya pergalên îstixbaratan bin ku teknîkên bilind li cem wan peyda dibin û bi taybet setelayt. Ev alav tenê li cem Mûsada îsraîlî hene.

9. Hebûna hejmareke hêzên dagirkeriya îsraîlî di eniyên şer de li kêleka Daişê, baskê îsraîlî jê û kes nêzî wan nabe.

10. Alîgirên vê rêxistinê tu çalakiyên ku mirov bikare behsa wan bike, li Îsraîl yan Îran yan jî li Tirkî yê pêk neanîne. Ev gav nîşaneya wê yekê ku kesê ku gelekî sûdê ji vê rewşa nearam li Rojhilata Navîn ev dewlet in.

11. Ji bo petrola Sûriye û Îraqê, bi rêya navbeynkarên tirk di rêya Tirkî yê re weke ku me got tê firotin; li hember piştevaniya lojistî. Heke ne wisa be, naxwe çawa Daişê siwareyên SUV yên ku endamên rêxistinê bi kar tînin, bi rêya nemînendeyên tirk ji kompanya Sadat bi dest xistin ku hejmara wan 100 siware bûn, siwareyên Toyota.

12. Setelayetên Îsraîl û Amerîkeyê, cihên kombûna endamên Daişê nedidîtin. Çawa setelaytên wan ava li ser Marsê dibînin û rêxistina Daişê li ser cîhana xwe nabînin.

13. Wêneyên fermandarên rêxistina Daişê bi fermandarên Tirkî û Îsraîlê re belav bûn. Herweha dengûbasa ku Xelîfeyê rêxistina Daişê kesekî cihû veşartî ye; ji bo pêkanîna armanca Îsraîlê di parçekirina deverê ji hundir ve bê rûbirûbûn.

14. Hin nemînendeyên pergalên îstxbaratên birîtanî û amerîkî aşkira got ku Îsraîlê bi xwe Daiş çêkiriye. Nîşaneya vê yekê jî xuyabûna ji nişkê ve ya serokê vê rêxistina terorîst e, kesê xwe dike mislman Ebû Bekir el-Bexdadî. Herweha Hillary Clinton aşkira ragihand ku birêveberiya Obama Daiş çêkiriye. Em dizanin ku birêveberiya amerîkî li gor rêxistina AIPAC ya sehyonî tevdigere ya ku serê pêşîn rajeya berjewendiyên Îsraîlê dike.

15. Nakokya zelal di navbera firira Daiş û el-Qayde de dar barê wateya cîhadê de û dijminê nêzîk yê Daişê û dijminê dû ji bo el-Qayde.

16. Ev rêxistin zêde nedihat topbarankirin, heta ku QSDê pest û fişar li ser pêk anî û ew têk bir.
17. Weşana bilez ya çalakiyên taybet yê rêxistinê li Tirkî , Qeter û Îsraîlê di heman derma weşana nûçeyên wan ji hundirê Tirkî yê, nîşaneya hebûna hemahengiyê di navbera Mûsadê û îstixbaratên Tirkî yê de û yên Îranê jî hin caran. Herweha endamên rêxistinê ne xwedî rpdênên erebî ne, tevî ku hin endamên ereb di nav wan de hene yên ku hêzên Daişê û dîl girtin, bûne girêdayî şepêla Ixwanan ya terorîst li welatên xwe, weke yên ku xwe kirine ereb. Herweha şiyanên wan yên şer bi ekên cihêreng, ne li gor şiyanên rêxitinekê ne ku ji nû ve ava bûye, her wekî bikaranîna tekolojiyayê û baldariya serederiyê û şerê li gelek eniyan.

## Lîsteya jêderan

### Yekem: Jêderên erebî:


- *Abu Ein, Cemal Zayid Hilal, Terorîzm û Destûrên Zagona Navneteweyî, Çapa yekem, Cîhana Nûjen a Pirtûkan ji bo Weşandin û Belavkirin, Irbid, 2009.*
- *Al-Banna, Hassan, Notên Deiwe û Daîyeyê, pêşkêşkirina Abu Al-Hassan Ali Al-Hasani, Qahîre, 1966*
- *Hesen Al-Turabî, "Hereketa Islamî li Sûdanê: Pêşketin, qezenc, rêbaz", bê weşanxane, Khartoum, 1989.*
- *Hesen al-Turabî, Pêşniyarên Currentslama forslamî ya Sê Deh Dehên Pêşîn, "Di Pêşeroja Islamicslamî de, Navenda Lêkolînên Pêşeroja Islamicslamî, London, 2-emîn, Mijdar 1991, rûpel 70-71.*
- *El-Tartûrî, Mohamed Awad; Ju Juihan, Agadir Arafat, Zanista Terorê, Bingehên Rewşenbîrî, Psîkolojîkî, Civakî û Perwerdehî yên Lêkolîna Terorê, Çapa Yekem, Çapxaneya Al-Hamid, Amman, 2006.*
- *Al-Telmesanî, Omar Al-Telmesanî, Bîranîn ne Rojnivîsk, Qahîre, bê tarîx.*
- *-Al-Jibreen, Saad Abdel-Rahman, Terora Navneteweyî, Lêkolîn ji bo masterê, Akademiya Naif Ereb a Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 1989*
- *-Al-Juhani, Ali bin Fayez, Axaftina lenceîdeta Terorîst: Kanal û Bandorên Wê, Zanîngeha Naif Ereb ji bo Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 2008.*
- *-Al-Harbi, Badr Abdel-Al, Rola hesta ewlehiyê di tekoşîna li dijî terorîzmê de: lêkolînek meydanî li ser efser û karmendên ku di karûbarên leşkerî de li Medîneyê dixebitin, lêkolîn hate pêşkêş kirin da ku pêdiviyên bidestxistina bawernameya masterê di zanistên leşkerî de, College of Graduate Studies, Zanîngeha Naif Arab ya Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 2007*
- *-Al-Husseini, Asma Abdul-Aziz Al-Hussein, Sedemên Terorîzm, lenceîdet û Extremîzmê, Lêkolînek Analîtîkî, College of Education, Riyadh, 2002.*
- *Al-Erian, Essam Al-Erian, Danûstendina bi Civaka Navneteweyî re ... Bingehên wê, Girîngî û Tedbîrên Wê: Dersên ji Tecrubeya Sûdanî 3, Al-Majma ', Hejmar 1397, 4/25/2000, rû 43.*
- *Al-Ferhan, Ishaq Al-Farhan, "Pêşiyên Çalakiya Islamicslamî ya li Dergehên Sedsala Bîst-Yekemîn"*
- *Al-Ferhan, Ishaq Al-Farhan, Helwest û Dîtinên Siyasî: Li ser Mijarên Neteweyî, Erebî û Islamicslamî, Beşa Dudan, Dar Al-Furqan, Emman, 1998*
- *Al-Qaradawi, Yusef Al-Qaradawi, Dîroka me ya Çêkirî, Dar Al-Shorouk, Qahîre, 2005*
- *Al-Dulaimi, Abdul-Razzaq Mihemed, Propaganda û Terorîzm, Çapa Yekem, Mala weşan û Belavkirina Jarir, Amman, 2010*
- *Bakr, Ali Bakr, Organisations Cihadi in Sinai and Egypt National Security, Middle East Papers Magazine, Navenda Neteweyî ya Lêkolînên Rojhilata Navîn, Hejmar 62 Çile - Adar 2014.*
- *Ji rojname û kovarên Rojhilata Navîn û navneteweyî analîzên cihêreng.*
- *Celal Zanati, Dîmenên Civakî û Eşîretî yên Çalakiya Terorîst li Sine, Kovara Kaxezên Rojhilata Navîn, Navenda Neteweyî ya Lêkolînên Rojhilata Navîn, Hejmar 62 Çile - Adar 2014*
- *Celal Zanati, Komên Islamicslamî di Cîhana Erebî de, Vejîn û Fading, Ronesansa Dar Erebî, Beyrût, 2019.*
- *Celal Zenati, Bîst û pênc delîlên têkiliya DAI ISIS bi îstixbarata Israelisraîlî (Mossad) re, Dar Al-Nahda, Beyrût, 2018.*

- *Celal Zenati: Razên Veşartî yên Cîhana Rewşenbîrî û Sîxuriyê, Navenda Pirtûkan a Alexandskenderiye, Alexandskenderûn, 2016.*
- *Celal Zenati: Rojhilata Navîn a Nû û Nifşa Çaremîn a Warseran, Alexandskenderiye, 2012.*
- *Celal Zenatî, Bernameya Raya Giştî, qenala satelîtê ya Misirî LTC. Beşa Çile û Sibat 2017.*
- *-Hammad, Magdy Hammad û yên din: Tevgerên Islamicslamî û demokratîk, lêkolînek di raman û pratîkê de, Navenda Lêkolînên Yekîtiya Ereb, 2001.*
- *-Hamzawy, Amr Hamzawy, Marina Ottaway, û Nathan J. Brown, "Pirsên Divê Tevgerên Islamicslamî Bersiv Bikin: Birayên Misilman ên Misirî wekî Model", Enstîtuya Carnegie, Sibat 2007.*
- *-Rifaat, Ehmed Mihemed; Al Al-Tayyar, Saleh Bakr, Terora Navneteweyî, Çapa Duyemîn, Navenda Lêkolînên Erebî-Ewropî, Parîs, 2002.*
- *-Rashid Ghannouchi, Hereketa Islamicslamî û Pirsa Guherînê, Navenda Lêkolîn û Wergerê ya Magreb, London, 2000.*
- *-Rashed Ghannouchi, Kovara Al-Qadeer, Sal 2, Hejmar 14, 15, û 16 (Hezîran 1997), ji hêla Zaki Ahmed ve hatî rêzkirin, Nîzama Cîhana Nû di Têgihîştina Islamslamîstên Ereb de, Kovara Pêşeroja Ereb, Adar 1992, Hejmar 157.*
- *-Al-Sarrani, Abdullah bin Saud, Bandora Kiryarên Terorîst Li Ewlekariya Neteweyî, Lêkolîn pêşkêşî Sempozyuma Zanistî "Bandora Kiryarên Terorîst Li Tûrîzmê", Navenda Lêkolîn û Lêkolînê, Beşa Semîner û Civînên Zanistî, Damascusam, 2010.*
- *-Amer, Salah al-Din, Zagona Rêxistina Navneteweyî, çapa yekem, Mala Ronesansa Erebî, Qahîre, 1998.*
- *-Asiri, Mustafa bin Ahmed Sultan, Siyaseta Islamslamê Di Têkoşîna Li Dijberiya Hemdem de, Teza Masterê ya Ne Belavkirî, Zanîngeha Naif Ereb a Zanistên Ewlekariyê, Riyad, 2006*
- *-Alyan, Shaukat Mihemed, Terorîzma ferzkirî û red kir, rastiya wê - sedemên wê - dermankirina wê, Mala weşan û Belavkirina Olayan, Amman, 2008.*
- *-Al-Amoush, Ahmed Falah, Sedemên Belavbûna Fenomena Terorîzmê, Lêkolîn pêşkêşî Sempozyûma Dij-Terorîzmê, Akademiya Nayef Ereb a Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 1999.*
- *Al-Amoush, Ahmad Falah, Di vê Sedsalê de Pêşeroja Terorê, Çapa Yekem, Zanîngeha Naif Arab ji bo Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 2006.*
- *Al-Amiri, Mihemed Abdullah, Helwesta onslamê ya li dijî Terorê, Çapa Yekem, Zanîngeha Naif Ereb ji bo Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 2004.*
- *Radwan Al-Sayed, "Pêşeroja Tevgerên Islamicslamî Di Ronahiya Guhertinên Herêmî û Navneteweyî de", di pirtûka "Tevgerên Islamicslamî û Bandora Wan Li Ser abilitystîqrara Siyasî ya Cîhana Ereb", Navenda imarat ji bo Lêkolîn û Lêkolînên Stratejîk, Ebu Dhabi, 2002, r. 184.*
- *Al-Bishri, Tariq Al-Bishri, Profîlên Giştî yên Ramana Siyasî ya Islamicslamî di Dîroka Hemdem de, Dar Al-Shorouk, bê dîrok.*
- *Ashmawy, Ali Ashmawy, Dîroka Nihênî ya Birayên Misilman, Bîranînên Ali Ashmawy, Rêberê Dawîn ê Rêxistina Taybet, Navenda Ibn Khaldoun ji bo Lêkolînên Pêşkeftinê, Qahîre, 2006.*
- *Awad, Mihemed Muhyiddin, Rastiya Terorê û Trendên Wê, kaxezek pêşkêşî xebatên Sempozyûma Dijî Terorê, li Akademiya Naif Ereb ya Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 1999.*
- *Abdel-Halim, Mehmûd Abdel-Halim: Birayên Misilman, sê beş, Dar el-Da`wah, Skenderiye, bê tarîx.*

- *Abdullah Abu Azza, Ber Bi Tevgereke Islamicslamî ya Zanistî û Aşitî ve, di pirtûka Abdullah Al-Nafisi de, Tevgera Islamicslamî, Dîtinek Pêşerojê: Gotarên Di Xweser-Rexneyê de.*
- *-Abd al-Wahhab al-Afandi, Tevgerên Islamicslamî: Çavkanî, Wate û Pevçûnên Rastiyê, di pirtûka Tevgerên Islamicslamî û Bandora Wan Li Ser Politicalstîqrara Siyasî ya li Cîhana Ereb, (komek nivîskaran), Navenda Mîrnişînên Lêkolîn û Lêkolînên Stratejîk, Ebu Dhabi, rûpel 13 +44, 2002.*
- *-Fouda, Faraj Fouda, Terorîzm, Desthilata Pirtûka Giştî ya Misirî, Qahîre, 1992.*
- *-Al-Malikî, Abdul Hafîz Ebdullah, Ber bi civakek ewlekarî ya entelektuelî: vekolînek xwerû û stratejiyek neteweyî ya pêşniyarkirî ji bo bidestxistina ewlehiya rewşenbîrî, çapa yekem, Çapxaneya Al-Humaidhi, Riyadh, 2010.*
- *-Mihemed, Hamdan Remezan, Terora navneteweyî û encamên wê ji bo aştî û ewlehiya cîhanî: ji perspektîfek civakî vekolînek analîtîkî, College of Journal of Research Research Journal, Volume XI, Issue 1, 2011, pp. 267-292.*
- *-El-Mutlaq, Abdullah Mutlaq Abdullah, Terorîzm û bendên wê di hukma îslamî de, ji hêla: Emêx / Abdulaziz Abdullah Al-Sheikh; Dr. Dr. / Saleh bin Abdullah bin Hamid, çapa yekem, Mala Albn El-Cewzî, Riyad, 1431 AH*
- *-Al-Mousawi, Dadrês Salem Roudhan, Kiryara Terorîzm û Sûcê Terorîst: Lêkolînek Berawirdî ya Ku Bi Serlêdanên Dadwerî Zêdetir Dike, Çapa Yekem, Weşanên Dadrêsî yên El-Halabi, Damascusam, 2010*
- *-Mustafa Al Filali, "Rapora Sentezê: akiyarkirina Olî ya Islamicslamî: Taybetmendiyên wê, Qonax û Pêşeroja Wê" di berhevoka nivîskaran de, Tevgerên emporaryslamî yên Hevdem li Cîhana Erebî, Rêzefîlma Pirtûkxaneya Pêşerojên Ereb ên Alternatîf, Navenda Lêkolînên Yekîtiya Ereb û Zanîngeha Neteweyên Yekbûyî, Beyrût, Çapa 2, 1989*
- *-Musa, Mustafa Mihemed, Nifûsa Rasthatî û Terorîzm, Çapa Yekem, Zanîngeha Naif Ereb a Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 2010.*
- *-Musa, Mustafa Mihemed, nirxandina hîndariya pispor ji bo xwendekarên Enstîtuya Polîs, serfirazê Xelata Lêkolînê - yekem panel gotûbêj - Stratejiya Hînkariya Polîs li Welatên Encûmena Hevkariya Kendavê, Rastî - Pevçûn, ku li rex civîna çaremîn a Rêvebirên Giştî yên Zanîngeh û Enstîtûyên Ewlekarî û Polîs li Welat Civata Hevkariyê ya Dewletên Erebî yên Kendavê, Kuweyt, 2004.*
- *Naguib al-Ghadhban, Di Cîhana Ereb de Veguhestina Demokratîk û Pevçûna Islamicslamî, 1980-2000, Dar Al-Manar, Amman, 2002.*
- *Al-Hawari, Abdul Rahman Rushd, Definition of Terrorism and Forms, lêkolîna zanistî ya ku di sempozyuma li ser "Terorîzm û Globalîzasyon" de hatî pêşkêş kirin, di kaxezên xebatê yên sempozyûmê de hatî weşandin, Zanîngeha Naif Arab ji bo Zanistên Ewlekariyê, Riyadh, 2002.*
- *Al-Huwaidi, Omar Saad, Têkoşîna li dijî Sûcên Terorîst ên di Zagona Ceza de: Lêkolînek Berawirdî, Çapa Yekem, Weşanxane û Belavkirina Wael, Amman, 2011.*
- *Ahmed Youssef Ahmed: Helwestên Ewlekariya Neteweyî ya Ereb: Di navbera têgeh û ezmûnê de, Qahîre, 2005.*
- *Ephraim Lebed: erservanên Nedîtinê, Intellistixbarata Israelisraîlî ji hundurîn, Ultra - Fîlîstîn, 2017.*
- *Habhab Xelîfe: Nifşa Çaremîn, Di Bikaranîna Tevnên Civakî de Veguheztinên Hatî, Trendên Bûyeran, Hejmar 2, Cild Yek, 2014.*
- *Birêz Abdel Fattah: Serpêhatiyek Rojnamevanê Misirî li Dewleta DAI ISIS, Navenda Qahîre ya Lêkolînên Kurdî, Qahîre, 2016.*

**Duyem: Jêderên biyanî:**

*- Intelegence and Security Committee of Parliament ،annual Report 2016-2017،p.77.*

*- Intelegence and Security Committee of Parliament ،annual Report 2016-2017،p.77Robert،Bruce Lockhart،Memoirs of British Agent،Lodon،2003. Mary Ellen Oconnell،Chatham House،Meeting Summary،International law and The Use of Drones،Summary of The International Law Discussion Group meeting held at Catham House،on Thursday،21 October2010*

*- Pat،Phelam،Fourth Generation Warfare & its Chalange for The Miltary & Society،Defence Studies،Vol.11،N.1،March،2011Szoldra،Paul،These 17 Agencies Make Up Most Sphisticated Spy Network in The World.*

*- Raab،Selwyn،Five Families،The Rise،Decline and Resurrection of Americas Most Power Mafia Empire،1ad.ed،Thomas Dunne Books،2014*

*- Stanton S.،Coerr، Fifth Generation War، Marine Corps Gazette،Vol.93،Issue 1،janurary،2009،*

*- Swiss Agency for The Environment ،Forests،And Landscap،Occurrence and relevance of organic pollutants in compost،digestate and organic residues،Research for Agriculture and Nature،8 November،2004،.*

*Drones،The can-do Story of Ryan's Unmanned spy planes،1982، Armed Forces Journal Innternational..*

*Yakov،Katz،Israel Vs Iran،The Shadow War ،Potomac Books،Inc،2012.*

*<u>- Prespective on Terrorism:</u>*

*<u>( Vol. X، Issue 4)</u>*

*- Craig Whiteside،New Masters of Revoloutionary warefare : The Islamic State movement (2002-2016)*

*- Scott Englund and Michael Stohl ، Violent Polotical Movements : Comparing The Shining Path to Islamic State. Prespective on Terrorism: <u>(Vol. X، Issue،5)</u>*

*- Jasper L. De Bie ، Involvement Mechanism of Jihadist Networks in The Netherland.*

*- Erin Miller ، Patern of Collective Desitance from Terrorism Fundmental Measurement Challenges.*

*- Martin Callagher ، Criminalised Islamic State Veternas ،A future Major Threat in Orgainsed Crime Development.*

*- Ian Turner ، A Communitarian Justification for Measures to Prevent Terrorism in UK.*

*- Gupta ،Rakesh،A Comparative Prespective on The Causes of Terrorism،International Studies،35(1)Januray – March،1988.*

*- Gregor Bruce،Definition of Terrorism Social and Polotical Effects،Journal of Millitary and Veterns Health،New Brunswick،1988.*

*- The Shorter Oxford Dictionary 3rd (London Oxford University press،1955)p.1292. Stephens،Tim،2004،International Criminal Law and Response to International Terrorism،27،(2)،University of New South Wales Law Journal،p.454. See also Berg،2004،Terrorism،The New International Chalange ،paper presented at public workshop،in Fiji،17 July،2004.*

*- Richard T.Schafer،Sociology،New York:Mc Graw-Hill Book Company، Charles Tilly،from Mobilization to Revolotion،Massachussets:Adison –wesley puplishing company،1978،p.841983،p.520 Dale F. Eicklman and James Piscatori،Muslim Polotics،(Princeton NJ:Princeton University press،1996).*

# Îran

( 4 ji 4 )

**Pêşeroja doza Kurdî li Îranê:**

Rewşa siyasî ya Kurdî li her çar aliyên Kurdistan wek hev in, nakokiyên siyasî berdewam in ku gelek caran dibe sedema şerê birakujiyê. Tevî yek nasnameb ye, lê ev taybetmendî ji destpêka hebûna Kurdan heye, hevrikiya êlî ya Kurdan berî zayînê veguherî dijatiyeke derbekî û di serdema Islamê de piştî sedsala 20`an ber bi hevrikiyeke partîtî hat veguherandin û dibe ku di pêşerojê de veguhere ber bi hevrikiyeke herêmî ya navxeyî, weke mênak hevrikiya hikûmeta başûrê Kurdistanê bi herêma Rojava û Bakurê Sûriyê re, berçav e. Bê guman tişta ku Kurdan bike yek û ji wan re statuyeke siyasî ava bike; tenê Îdeolojî ye, ne çîna desthilatdar yan jî serkêşê malbatan e, ev tişt di yekîtiya êlên Mîdî û Arî de di kesayeta" Diyako" de hat dîtin û îro rêjeyeke mezin ji Kurdan bi hemû mezhebên xwe ( Sune, Elewî, Êzdî, çepgir, rastgir) di kesayeta rêberê navnetewî " Ebdullah Ocelan" tê dîtin. Dema ku em Îro rewşa siyasî ya Kurdî li her çar perçên Kurdistanê bişopînin, em ê timî bibênin ku li her çar prçeyan tevgerên neteweyî, çepgir, rastgir û lîberalîst hene, lê her aliyek xwedî pirojeyeke cuda ye û her yek ji wan jî dixwaze bi tena xwe serkêşiya Kurdan bike û aliyê din tune bike. Ji bo jinavbirina vê kêşeyê rêberê navnetewî "Ebdullah Ocelan" pirojiya kongereya neteweyê ya Kurdistanî (KNK) ji bo hevrêzî û yekîtiyê, her wiha ji bo peydakirina lihevhatinekê, pêşniyarkir. Lê girêdan û peyrewtiya hin hêzên Kurdî bi hêzên herêmî ve û hin hêzan xwe sipartine li sr hêzine navneteweyî, hişt ev piroje neyê bi cih anîn û bû sedema ku Kurd gelek destkeftiyên neteweyî ji dest bidin. Mîna gelpirsiya ku li başûrê Kurdistanê pêk hat. Li Îranê jî ev tişt peyda dibin, dema her şepêlên Kurdî ên olî, lîberal, çepgir û rastgir ji hev cuda dixebitin ku dihêle rêjîma "Wîlayetûlfeqîh" bi hêsanî pilanên serkeftî li hember Kurdan, pêk bîne û mafê wan bin pê bike. Ji ber wilo divê sûd ji serpêhatiyên Kurdan li perçeyên din, were girtin.

Ji destpêka sedsala 21 an erdnêgariya rûbirûbûnê fireh bûye, tevgerên Kurdî yên kevneşop nema dikarin rêvebertiyê bikin, ji ber ku nikarin xwe nû

bikin û di çarçoveyeke dogmatîkî de mane. Li hemberî wê jî hêza dijmin xurt bû û karînên wan yên leşkerî û ewlehî pir bi pêş ket, hişt ku serkeftina li ser erdê ne pêkan be. Hêjayî gotinê ye, ya ku ev rastî da zanîn koma Civaka Kurdistanîv (KCK) bû ya ku Îdeolojiya xwe ji ramanê Rêber û ramangirê navneteweyî "Ebdullah Ocalan" werdigire. Vê felsefeyê diyar kir ku dawî li serdema dewleta neteweyî û olî hatiye, ev serdema ku bibû sedema hemû pisgirêkên herêmê. ji ber vê yekê îdeolojiya " Netewa demokratîk " weke pergaleke nû ji hemû gelê Rojhilata Navîn û bi taybetî ji gelên Kurdistan re, ji bo peydakirina jiyana hev beş û di warê siyasî de tunekirina rola ol û netewperestiyê. Vê pirojeyê piştgiriyeke xurt ji gelê herêmê, bi taybetî ji Rojava- Bakurê Sûriyê û Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dît.

Partiya Jiyana Azad a Kurdistanî (PJAK), ya ku ev felsefe li xwe girt tevgera herî bihîz bû ji aliyê rêxistinî û baweriya leşkerî ve. Ji aliyekî ve xwedî bandor û bargehên asê ne, ji aliyekî din ve jî xwedî Îdyolojiyke ku hemû kesên şerê dogmatîzm û nijadperestiya tundraw û împeryalîzmê dikirin ên ku dibin sedmên hemû pirsgirêkên rojhilata navîn, piştgiriya wê kirin, her wiha Îdyoljiya sosyalîzma pêkhatî jî rexne kir.

Îran stratejiya xwe ya kevn a tijî kuştin û wêrankirin ku pê rikberiya Kurd a çekdar diçewisand; bi stratejiyeke nû guhert, di encamê de qada rûbirûbûnê firehtir kir, sînorê Îranê derbas kir. Her wiha ji xwe re ajan erkdar kirin ku nûnertiya wê di eynî kiryarên gemar de bişopîne wek mînak; dema hin tevgerên Kurdî bi alîkariya PDK ya Îraqî ya ku bi hevpeymaniyekê bi Tirkiye û Îsraîlê re girêdayî ye, bi hin êrîşan rabûn, Îran siyasetek nû şopand. Çavkaniyên hêza wan tevgeran armanc kir, bi pêngaveke saloxgerî dijî ofîsa PDK ya Îranî li Hewlêrê paytexta herêma başûrê Kurdistanê rabû. Piştî demekê hêzên YNK bêalî kirin, paşê rêda Heşdaşabî ku bi bihaneya gelpirsînê êrîşî hêzên PDK bikin. Bi rastî jî karîbûn serweriya PDKê û desthilata herêmê li ser bajarê Kerkûkê yê stratejîk rakin û ew neçar kirin ku ji gelek herêmên Kurdî vekişin. Vê yekê hişt ku serokê hrêmê karbesta xwe ragihîne, encama vê yekê bû sedema nakokiyên di hundirê YNKê de. Her wiha aloziyek rasteqîn di herêmê de rû da, di encamê de komên Kurdî li rojhilatî Kurdistanê yên ku bi hêzên Kurdî li başûrê Kurdistanê re hevpeyman in, lawaz bûn û gelek ji hêza xwe winda kir, tevî ku van koman gelek caran şerê PJAKê kir ew jî bi handana PDK hevalbenda Tirkiyê. Bi vê yekê tu kes li hember Pasvanê

Şoreşêyên Îranî ji bilî PJAK nema. Tê payîn kirin ku rêjîma Wîlayetûlfeqîh dê eynî stratejiyê bimeşîne; da ku fişarê li ser gelê Rojava-Bakurê Sûriyê dilxwazê PJAKê, bike. Tê zanîn ku di dema dawî de nîşanên amedebûna tevlihevî û fitneyê bi riya saloxgeriya Sûriyê û komên çete yên Şîe li Rojava-Bakurê Sûriyê tên kirin. Armanc jê têkbirina tecrûbeya demoratîk li wê deverê ye, her wiha peydakirina nakokî û hevrikiya îdeolojîk di navbera hêzên Kurdî yên çepgir, rastgir û olî li dijî felsefeya Neteweya demokratîk, bi rastî jî hêzne Kurdî ketin ser vê xetê. Îran guman dike; dibe ku Rojava-Bakurê Sûriyê bibe kûrahiyeke stratejîk ji bo rikberiya demokratîk a li dijî pergala wê ya mezhebî, ji ber vê yekê hevrêziyê li ser asteke bilind bi Tirkiyê re dike. Mînaka wê jî dema bi hev re hewl dan ku serkirdeyê KCK Cemêl Bayik bikujin, berî vê hewildana têkçûyî srokerkanê artêşa Tirkiyê li Enqerê bû, ku her du alî pilanên xwe li ser doza Kurdî datînin, li nik her du alî dixwazin aloziya Sûriyê bo parastina rêjîma Sûriyê, hinkî sar bikin, her wiha her du alî bi hev re hevrêziyê li ser toparana gundên Kurdî yên li ser sînorê siyasî di nav her du aliyan de, dikin. Li aliyekî din jî Îran li zemîneke weke herêma başûrê Kurdistanê digere ku di riya Heşdaşabî û hin hêzên siyasî Kurdî fişarê li ser alîgirên felsefeya demokratîn li hin herêmên mîna "Mexmmûr, Kerkûk û Silêmaniyê û hwd" bike.

Tevî karînên Îranê, lê mîsyona wê rastî gelek pirsgirêkan tê. Tê zanîn ku PJAK ji hêla leşkerî, rêveberî, diravî û lojistîkî ji Rojava–Bakurê Sûriyê cuda ye û hişmendiya wê ya şoreşgerî nayê şantajkirin, her wiha wê gelek sûd ji serpêhatiyên berê yên bû sedema têkçûnên şoreşên Kurdî, wergirtien, jixwe hin hêznên navnetewî hene ku dijberî Îranê ne li hêviya vê derfetê ne, ji bo ku piştgiriya çi êrîşeke leşkerî ku ji hêla PJAK li dijî Pasvanê Şoreşêyên Îranî pêk were, bike; di heman demê de li benda raperîneke gelêrî li Rojhilatî Kurdistanê ne. Tê xuyakirin ku ev tişt li Rojava- Baurê Sûriyê bi ser ket û dikir li Bakurê Kurdistanê di sala 2015-2016an bi ser biketa heger eynî ew alîkarî bihatana pêşkêşkirin. Li milekî din jî hêzên radîkal û şofînîst ên ku Îran ji xwe re dikirin palpişt; bi sedema gendelî û nakokiyên di nav wan de gel dûrî wan ket, her wiha hêzên navnetewî jî ev hêz nepejirandin. Tê zanîn ku gelek şanên razayî yên Şîî, yên bi ser Îranê ve, li tevahiya cîhanê belav bûne û di rêya wan re gefan dide dijberên xwe. PJAK jî bi saya îdyolojî û felsefeya neteweya demokratîk, gelek alîgirên wê henê ku dikarin li seranserî cîhanê berjewendiyên Îranê têxin bin gefan. Ji ber wilo pêkan e ku Îran bi karekî

leşkerî li dijî sivîl û bargehên PJAK û hevalbendên wê rabe, yan jî dikare di riya saloxgêrên xwe re hêzên şofnîst û radîkal ên Kurd, Ereb, Tirk û Fars li dijî alîgirên felsefeya demokratîk sor bike û hin kesayetan bikuje. Hr wiha dikare di riya ragihandinê re şerekî psîkolojîk bike û tu berbesteke exlaqî nîne ku nehêle Îran van kiryaran bike. Vê yekê hişt ku PJAK xebata xwe ya îdyolojî di nava gelê îranê de pirtir bike. Bê guman dê teqezî li ser çalakiyên saloxgêrî yên Îranê were kirin wek; çavdêrî li şanên razayî, çalakiyên Pasvanê Şoreşêû salogêriya Îranê, her wiha komkirina dane û belgeyên li ser sîxur û kurtêlxurên çalak li hundir û derveyî Îranê yên ku xwe li paş cemekaneyên bazirganî yan jî şîebûnê vedişêre û hin caran bi çalekiyên veberanînê radibe, mîna xebata ku li Başûrê Kurdistanê bi rê ve dibe, li kêleka vê jî çalakiyên wê yên di warê ajana elektronîk li ser telefon û alavên ragihandina civakî de. Tê payînkirin ku PJAK hemû armancên pasvanên şoreşgrî li Îran, kendav, Sûriyê, Îraq, Lubnan û Ewropayê amade bike û bide zanîn û hewil dide ku çekên nûjen mîna mûşekên sivik ên dijî zirx û balefiran, tifengên segvaniyê û balefirên bê pîlot, bidest bixe. Her wiha pêşxistina taktîkên şerê bajaran, li nik pirkirina hêza xwe li ser qada Kurdî; di riya lidarxistina kongereya neteweyî û piştgiriya hêzên demokratîkxwaz.

Îdyolojiya ku PJAK pê bang dike ne îdyolojiyeke netewî ye; yan jî çepgir, olî, lîberlal radîkal e. Armanca wê peydakirina lihevkirinê ye û tunekirina serweriya rêjîma Îranê li ser hişmendiya gel. Her wiha tu metirsiyê li ser Îran û gelê wê çênake, xwesteka wê xurtkirina yekîtiya niştimanî di navbera hemû mezhebên ku îro li ser xaka Îranê û derveyî wê dijîn e. PJAK dijî dogmatizma olî ya rêjîma Wîlayetûlfeqîh e, bi taybetî şepêla kevneparêz. Ji ber wilo derfet heye ku xwe nêzî şepêla vesazîparêz û rikberiya niştimanî ya Îranê li ser bingeha demokratiyê û dadmendiya civakî bike û dûrî destwerdana di karûbarên dewletên din de weke ku ew angaşt dikin, bikeve. Bi vê yekê derfet heye ku deriyê danûstandina di nav wan de vebe, bi awayekî ku garantiya berjewendiyên Îranê wek statû ku bandoreke erênî li ser qada herêmî û navnetewî çêdike, bike. Ramangêrê navnetewî Ebdullah Ocelan vê yekê teqez dike, dibêje[1]: ”Potansiyela Îranê heye her kêlî parçe û dabeş bibe,

[1] Manifîstoya Şaristaniya Navneteweyî. Parêznameya pêncemîn, Pirsgirêka Kurdî û Çareseriya neteweya Demokratîk (parastina Kurdên di nava erzîngên tunekirina çandî de) R458, Ebdelah Ocelan

lewma dewleta netewe ji bo wê weke bombeyeke atomê ye ku di binê wê de hatiye danîn. Mîlliyetgiriya Şîe bi awayekî domdar dewletdariya netewe dijwartir dike û tevî cambaziyên wê yên modernîteyê hemûyan jî ev yek ê parçebûn û dabeşbûna Îranê ranewestîne, berevajî wê bêhtir bi lez bike. Teweriya neteweya demokratîk nexasim ji bo Îranê weke derman e ku divê rojane were bikaranîn. Çanda Îranê û gelê wê li dijî moderniteya kapîtalîst berxwedêr in, û bi tenê bi zêhniyeta neteweyên demokratîk dikarin bigihîjin cîhana azadî, wekhevî û demokratîk a bi hesreta wê ne. Bi teweriya neteweya demokratîk Îran dikare reşkujî û komployên dewleta netewe yên bi hev didin şerkirin pûç bike û bigihîje aştiyeke bi rûmet”

Tişta ku dihêle baweriya gelê Îranê pir bi PJAK were, ew rêbaza PJAKê ye, ya berovajî hemû tevgerên Kurdî ku ne di bin serweriya tu hezên navnetewî de ne, bi taybetî Brîtanya û Tirkiyê û hi dewletine nebaş, yên ku helwesteke neyînî beranberî KCKê nîşan dabûn, her wiha destek dabûn hêzên Kurdî yê din û ew weke kaxezekê ji bo birêvebirina ejendeyên xwe bi kar anîn. Îran giraniya hêza xwe li dijî PJAK bi kar tîne û ji bo vê rûbirûbûnê çavê xwe li hevalbendekî xurt digerîne. Emerîka ji bo vê alîkariyê berbijêra herî pêkan be dibe ku ji Îsraîl, Fransa, Siûdiyê û Tirkiy bêtir be. Tê zanîn ku Tirkiyê û Siûdiyê dijî felsefeya neteweya dîmokratîk in, Elmanya jî nikare dev ji Tirkiyê berde, Birîtanya jî piştgiriyê dide hêzên Kurdî yên din û Fransa têkiliyên wê yên nerasterast bi Îranê re hene. Heger nêzîkatiyek peyda bibe jî wê ne stratejîk be, dê taktîkî be. Her ku Îran dûrahiya di navbera xwe û PJAK de kêm bike, beramberî wê jî dûrahiya di nav bera PJAK û Emerîka de zêde dibe.

### Beşa pêncemîn: Pêşeroja Îranê

**Rastiya hêza Îranê**:

Îran weke dewleteke mezhebperestî û pragmatîk bêhtir ji dewleteke ku li ser bingeha hemwelatî, demokrasî û neayînî ava bibe, tê hesibandin. Jixwe Pasvan tevî dezgehên hewzên olî û bazar (bazirganên mezin, sermiyan û karsaz) sêgoşeya hêza ku desthilatdariya Îranê li serê ava dibe, çêdike û zehmet e ku bê pejrandin û alîkaraiya vê sêgoşeyê ya ku lêvegera olî, sermayedarî û hêza leşkerî dinimîne, tu guherîn di ramyariya derveyî û hundirîn de çêbe. ji bo ku ev her sê dezgeh desthilatdarî, berjewendî û destrewayan parve bikin, bi hev re çalak dibin.

Rêjîma Îranê karîbû xwe ji zextên hundirîn bi awayekî guncaw di rêya bikaraîna têgîna komplogeriyê  ya ku li dijî wê derdikeve, dûr bixe. Ev yek dihêle ku desthilatdariya xwe bi hêz bike. Ew jî di rêya ku çalakvanên mafî, siyasî yan jî rojnamegerî yên rikber bi hevaltiya dijmin tawan bike.  Rakêşana siyasî di navbera her du şepêlên olparêz û vesazîparêz de û bêaliya şêwirmendê bilind ji her duyan re, xizmeta ramyariya hundirîn a îranî dike, tevê vê yekê jî ewlehiyê bi awayekî bihêz di rêya Pasvan, Basîc û hêzên ewlehiyê re zeft dike. Her wiha piştevaniya karsaz, çîna borciwazî û olî ya kêmneteweyan misoger dike. Helbet lawazbûna rikberiyê û yeknebûna wan jî jê re baş e.

Îran ji aliyê derveyî ve di rêya destwerdana di karûbarên dewletên de tekez kir ku dikare karê wêranî, xerakirin û kuştinê bike bêhtir ku karibe karê avakirin, parastina sivîlan û aştiyê bike. Tevahiya alavên wê yên derveyî weke "Feylequlquds" ya girêdayî Pasvanan, tevgerên siyasî û milîsên çekdar, her wiha şandeyên diplomatîkî, çandî û olî yên ku veguhertine navendên berhevkirina agahiyan û çalakiyên saloxgeriyan; tev ji bo wêrankirin û nearamiyê ne. Ev tişt di herêmên germ ên Rojhilata navîn de weke Îraq, Sûriye, Yemen, Libnan, Behrîn û Erebistana Siûdî tê xuyakirin. Di warê navneteweyî de; Îran bi hewldana teqandina navenda çandî ya cihûyan li "Biyûnês Ayrês"[2] a Arcentînî, her wiha bi hewldana teqandina hêlên sûtemeniyê li balafirgeha "Kênîdî"[3] û hewldana kuştina balyozê siûdî yê berê "Adil Elcibêr li Waşintonê tê tawankirin. Ev xerabî tev li nik Îranê hene bê ku em tu roleke wê ya avaker li ser asta xwecihî, herêmî û navnetewîî bibînin. Ne tenê wisa lê belê Îran gelek bobelat bi ser gelek miletan de di nav de gelê Îranê jî, anî û bûne beşek ji pirsgirêkên milet û dewletan. Îran berovajî hizrên şorşeşa xwe ya Islamî yên ku parastina sivîlan li cîhanê deke, derket.

Karîna Îranê di derbasbûna civakên Rojhilata Navîn de û pêkanîna hêzên girêdayî wê ji çend serkeftinên girîng ên di warê leşkerî û siyasî de, nayê wê wateyê ku stratejiya wê ya derve bi ser ketiye. Pirsgirêkên herêmê û valahiyên ewlehî encama van tiştan e; plansaziyên dagirkeran û îdiyolojiyên

---

[2] Arcentîn: Îran darav dan û Hizbulah teqandina navenda çandî ya cihûyan li cîhanê di sala 1994'an de pêk anî- https://www. lebanese-forces. com/2011/07/19/155452

[3] Tirênîdad sê Misilmanên ku di plankirina teqandina balafirgeha Kênêdî de hatibûn tawankirin, radestî Emerîka kirin-
http://edition. cnn. com/arabic/2008/world/6/25/trinidad. jfk/index. html

neteweyî, şofînî û dogmatîka olî ya ku ji sedê salan ve di civakên Rojhilata Navîn de cih girtine. Tişta ku Îran kir ew e ku di rêya tevliheviya ku di herêmê de çêbûye  xwe sûrikandin û weke aliyekî dijber xwe ferz kir û gelek tiştên daringî û mirovî ji dest dan.

Îran piştî hilweşîna rêjîma "Sedam Hisên" di 2003'yan de, amadenebûna hêzeke herêmî ku li hemberî wê bisekine weke derfetekê dît. Her wiha Tirkiye û dewletên Xelîc bi arîşeyên xwe yên hundirîn mijûl mane û ne amade ne ku bi awayekî rasterast li hemberî Îranê rawestin. Berovajî rêjîma Îraqî ya berê. Yek ji tiştên ku hişt Îran di herêmê de kûr bibe ew e ku dijberiyên mezhebperestî û olî li herêmê gur dibin. Jixwe  îdiyolojiyeke ku gelên herêmê li hev bicivîne nîne, her wiha ji bo ku li şûna hişmendiya netewyî, şofînî û dogmatîka olî ya ku berpirsa serke ya êş û azarên gelên herêmê ye, rûne. Îran hişt ku dijberiyên mezhebî gur bibin, bi taybet piştî ku desthilatdariya dewletan vegeriya, tevgerên Islamî yên radîkal desteseriya hin herêman kir û piştî ku rêxistinên tevgerên siyasî yên neayînî, vesazîparêzî û demokratî lawaz bûn, her wiha piştî ku çend grûp û tevgerên siyasî parçe bûn û bûne alîgirên aliyên navneteweyî yên xwedî ramyariyên pragmatîkkî.

Em dikarin sedemên ku hiştin Îran kûr di qada herêmî de biçe wisa rave bikin: Ew qad ji demokrasî û mafên mirovan bê par e, pirojeyên pêşvebirinê tune ne, gendelî û bêkarî û dijberiya mezhebî heye, ji bo desthilatdariyê dijberiya hev dikin, hejarî û mitkirina şaristanî, bikaranîna pirsgirêka Filistînî ji bo rewakirina stemkariyê, stratejiya Emerîkî û Rûsî li herêmê û jevfêmkirina di navbera wan de, tunebûna îdiyolojiyeke niştimanî, tunebûna rikberekî bihêz ku li hemberî hêza Îranê ya leşkerî bisekine, dijberiyên di navbera dewletên herêmê de, piştguhkirina fêrkirin û wandayînê, ramyariya pragmatiya tekane ya desthilatdaran, dilsoziya kurtêlxurên Îranê, piştnegirtina dijminên Îranê ji hevalbendên xwe re, lawazbûn û bipaşketina îdiyolojiyên Rojhilata Navîn ên "neteweyî, olî, mezhebî û çepgirî", pêkanîna cudabûnê li dijî Şîe û Şîefobiyayê[4]. Jixwe gelek Şîî bawer dikin ku stemkariya mezhebî ya li dijî wan rewakirinek e ji bo ku civakên wan serûbin bikin, helbet

[4]Metirsiyeke nexweşî ye ji Şîeye  û ji wan ne bawer e û hewil dide ku qir wan bîne. Dewletên xelîc û yên Erebî yên navîncî girêbestên çekan yên bi milyarên dolaran girê dan, di eynî dem de pêşkêşkirina alîkariyên leşkerî  ku bi milyarên dolaran e ji bo Israîlê ragihand, ji bo ku dewletên Erebî û Israîl bi rûbirûmayîna li hemberî Îranê amade bin.

tişta ku hêj alî Îranê dike ew e ku rêjîmên herêmê hildiweşin bê ku bedêl hebe û hembêzgehên Şîî yên ku ji serwerên xwe nerazî ne hene.

Piştî ku Îran girêbesta navokî bi (girûpa 5+1) re girê da, hin cezayên ku li serê pêk hatibûn sivik bûn û bêhna xwe hinekî veda, ew her pênc dewlet "Emerîka, Berîtaniya, Çîn, Rûsiya û Ferensa) tevî Elmaniyayê jî endamtiya wan di Encûmena Ewlehiyê de her timî ye. Jixwe lawazbûna rikberiya siyasî ya îranî û kêmbûna operasyonên leşkerî yên rikberiya hundirîn weke Ereb, şiyoî, Kurd, Mucahidî Xelq û beloç, pê re alîkar bûn.

Hişmendiya dogmatîk ya "neteweyî-olî" ya biryarsazên Îranê hişt ku Îran ramyariya Donkîşotî bi kar bîne. Ew ramiyarî bi van yekan tê nimandin; Îran dijminatiya Rojava û Misilmanên sune û Kurdan dike û hewl dide ku statûyeke Şîî cîhanî ku navenda wê Îran e û navê "Kevana Şîî" lê tê kirin ava bike, ew jî di rêya belavkirina ramanên serwerê Şoreşa Islamî li Îranê "Xumeynî" da rewşeke demî û cihî ji bo derketina îmamê dozdehemîn "Elmihdî" amade bibe. Îmamê ku dê şerê hemû kafiran bike û dê bihêle ku Şîe serweriya cîhanê bikin, her wiha stemkariya ku bi Rojava, Misilmanên Sunî û şiyoiyan tê nimandin têk bibe. Li kêleka vê yekê jî Îran hewl dide ku emperatoriya "Farisî-Zeredeştî" ya ku dê dadwerî û wekhevî tê de hebe bi rengê "Îranî-Şîî" vejîne.

Mebest ji ramyariya donkîşotî ew e ku Îran dijberiya hêzên derveyî yên jê bi hêztir dike bê ku bizanibe ew ketiye goleke ku plansazên stratejîk ên emerîkî jê re amade kirine. Di rêya şopandina ramyariya Emerîkî li Rojhilata Navîn, em dibînin ku stratejiya wê bi parçekirina hêza zîrek a dijmin û hevrikên wê ya ku ji hêza hişk (leşkerî û aborî) û ya nerm pêk tê, tê nimandin. Lewre stratejiya Emerîkî sêgoşeya hêza desthilatdar a li Îranê armanc digire, jixwe sêgoşeya hêza Îranê ji dezgeha Pasvan, çîna bazariyan û dezgeha olî pêk tê. Emerîka dixwaze di rêya guherîna têgîna Sehyûniya emperyalîst a dijmin bi têgîna Îrana Şîî ya dijmin re, herwiha di rêya guherîna wêneyê emerîkî yê ku alîkariya rêjîmêm stemkar dike bi wêneyê emerîkî yê ku alîkariya demokrasî û miletên bin dest dike re, hêza xwe ya nerm bi hêz bike. Di eynî dem de Emerîka ji bo ku berdehî (tawîz) û destkeftiyên bêhtir ji dewletên li hemberî Îranê bi dest bixe, metirsiya wan ji Îranê ji xwe re derfet dibîne. Weke ku bi awayekî nerasterast rola Îranê ya ku weke asayîşê herêmê

di dema Şah de dihat bikaranîn lê bi awayekî nû vegerîne, ev yek jî li ser hesabê dewletên din ên mezin e weke Berîtaniya, Ferensa û Rûsiya.

Çavgirtina Emerîka li ser firehbûna Îranê li herêmê, bi awayekî tam nealîkirina hevalbendên xwe û tevliheviya ku li herêmê çêdibe û ya ku destê Emerîkayê tê de heye, van tiştan palpiştiya Îranê kir û hişt ku bi girseyî û bi rêbaza xwe di herêmê de kûr here, her wiha hêzên xwe di rêya "Feylequlqudis" re yê girêdayî Pasvanan belav bike. Jixwe vê hêzê tevahiya milîsên Şîî û hêzên hevalbendên xwe yên li Behrên, Erebistana Siûdî, Yemen, Filistîn, Libnan, Sûriye, Îraq û Efxanistanê bi rêxistin kirin, alîkariya darayî û çek pêşkêşî wan kir, û rê wan nîşan kir. Îran bi awayekî nerasterast kete şer û pevçûnan û gelek jidestdayînên daringî û mirovî ji her du aliyê şer re hebûn. Van tiştan tevan hişt ku hêza Îranê ya leşkerî li herêmên dûr belawela bibe. Hişt ku dezgehên saloxgeriyê yên Emerîkî û Ewropî çavdêriya wê bikin, lêkolînan li serê çêkin û agahiyên ku destên Îranê de ne û pê gefan li berjewendiyên rojava dixwe kom bikin. Her wiha aboriya niştimanî ya îranî ji hev xist. Vê yekê hişt ku hêza aborî ya Îranê bi alîkariya cezayên aborî û darayî û qedexekirina bazirganiyê[5], parçe bibe; hişt ku bandorên neyênî li ser peredanana çalakiyên Îranê yên navokî û bernameya moşekên balistîk yên xwemalî peyda bibin, her wiha hişt ku Îran çekên bervaniya asîmanî ji Rûsiya û Çînê bikire, zextek li ser çîna bazariyan çêkir (sermiyan, bazirgan û karsaz) û rêjeya hejariyê bilind kir, her Wekî tê zanîn veberanîn bi cezayên aborî bandor dibin. Ji ber ku ev tişt tev ji desthilatdariya Îranê re girîng in, lewre jî peredanên bêhtir ji çalakiyên leşkerî re ne. Vê yekê hişt ku pêkanîna gelek pirojeyên pêşveçûnê[6] yên ku ji welatiyan re pêwîst in dereng bimîne, nirx bilind kirin û rêjeya hejariyê zêde kir.

Ev tişt tev û tevî tunebûna demokrasî, maf û azadiyên giştî; hiştin ku nerazîbûna gel ji rêjîma desthilatdar zêde bibe. vê yekê hişt ku dezgehên ewlehî û tundiyê bi palpiştiya dezgeha olî, tundiya li dijî rikberî û welatiyan zêde bibin. Vê kiryarê û tevî binpêkirinên li dijî mafê mirovan ên ku hêzên alîgir li herêmên germ pêk tînin, hiştin ku hêza Îranê ya nerm lawaz û parç bibe.

---

[5] Têkiliyên tirkî û îranî li Rojhilata Navîn diguherin. F. Stephen Larrabee, Alireza Nader – navenda lêkoînan RAND a berevaniya niştimanî (ji bo encûmena niştimanî ya saloxgeriyê hate amadekirin. )

[6] Stratejiya Îranê li hemberî dewletên kendava erbî- Dr. Caifer El-Taî.

Di rêya xwepêşandanên ku rewşên 2017'an şermezar kirin re, em dibînin ku encamên vê yekê di dawiya sala aborî de û di gendeliya ku di dezgehan de belav bûbû xuya dikin. Xwpêşandanan sloganên li dijî serokê Îranê "Rohanî" û "Ayetulah Elî Xamêneî" û li dijî desthilatdariya olî û destwerdana Îran di dewletên herêmê de, hildan. Hin raporan eşkere kir ku xwepêşandanan sloganên wiha hildabûn **"Xelk parsekiyê dikin û kesên oldar weke xwedawendan kar dikin"** û hinên din jî wisa digotin **"Jiyana min ne ji Xeza ne jî ji Libnanê re ye, lê ji Îranê re ye. "**[7] Helbet sedem ew bû ku rêjeya hejariyê û bêkariyê pir zêde bûbû, rêjeya bêkariyê xortên ku temenê wan ji 15 heta 29'an e gihaştibû 27% di nav. Hin rapor destnîşan dikin ku beşeke mezin ji xelkên hejar li kolan û goristanan radizin û hinên din jî destnîşan dikin ku hin dayîk neçar dimînin ku zarokên xwe ji ber hejarî, bêhêvî û nekarîna xwedîkirinê difiroşin û ji bo ku nekevin di nav pencên bazirganên guhnelî (seksî) û hişbir û komên parsekiyê de[8], baweriya xwe bi rêxistinên nefermî û alîkariyên wan nahînin.

Lawazkirina hêza zîrek a Îranê dê bihêle ku Îran rastî hilweşîn û parçebûnê were, bi vî awayî gel dê bikaribin bi azadî raman û armancên xwe derbirînin. Ji ber ku bandorên neyênî yên destwerdanên îranî yên li derve li ser wan hene û ji ber ku zoriyê li hin gelan dikin ku ji aliyê mezhebî (sune) û ji aliyê nijadî ve (Ereb û Kurd) bi yên Îranê ve girêdayî ne, gelên Îranê pirojeyên ku desthilatdarên Îranê bangeşeya wan dikin napejirînin.

Hizirmendê navneteweyî "Ebdelah Ocelan" dibêje: **"Şerê cîhanê yê sêyemîn rastiyeke heyî ye, tewereya wî şerî erdnîgariya Rojhilata Navîn û hawîrdora wê ya çandî ye. Bûyereyên ku li Îraqê çêdibin weke ku navenda şerê cîhanê yê sêyemîn be, bi awayekî tam û zelal dide xuyakirin ku şerê tê de ne bi aliyekî tenê ve, lê belê bi berjewendî û hebûna hêzên desteser ên cîhanî ve jî girêdayî ye. Heger bandora Îranê bi tevahî neyê pûçkirin, ewlehî û aramiya li Efxanistan û Îraqê bi cih neyên û Çîn û Emerîkaya latînî ne weke hêmanên gefxwarinê werin hesibandin, ev şer nayê bidawîkirin. "**

Li gorî hizirmendê navnetweyî "Ebdelah Ocelan" şerekî cîhanê yê sêyemîn heye, lê bi awayekî din ew jî bi veguhastina kirîzê ber bi qadeke din ve û

---

[7] Xwepêşandêr li hemberî "destên hasinî" radiwestin-
http://www. bbc. com/arabic/middleeast-42522672

[8] Bazarganîkirina zarokan li kolanên Tehranê: http://www. dw. com

birêvebirina ajanên xwecehî ji şer re, dê were lidarxistin. Her aliyek alîkariya leşkerî, darayî û siyasî pêkêşî hevalbendê (sîxûr) xwe dike. Jixwe em vê yekê di şerên ku li Îraq, Sûriye, Libnan, Yemen, Xelîc, Israîl, Efxanistan, Ukraniya û hwd de li dar in, dibînin. Ji lewre pêwîst e karîgeriya îranê ya ku bû aliyekî girîng li herêmê û hin destkeftiyên mezin bi dest xistin, bê lawazkirin, ew jî di rêya avn tiştan re: avakirina satatûyên bihêz yên alîgir, pêkanîna ewlehî û aramiyê li herêmên germ, her wiha destêwerdana Îranê bi awayekî karîger di hin herêmên germ yên herêmî de. Îran bi Şîîperestiya xwe ya "dozdehî" bêhtirî xwe nêzê olperestiya Israîlê ya cihûtiyê ye, yanî jiyankirina bi awayekî wekhev û xwezayî li gel civakên cihêwaz napejirîne.

Heger hevrûkirinek di navbera dewletên herêmê de çêbibe, em ê bibîn ku Îran karîbû xwe weke hêzeke xweser bisepîne û beroveajî dewletên herêmê yên Erebî, Tirkiye, Efxanistan, Pakistan, Ermîniya, Ezrebîcan û hwd be, her wiha derveyî desteseriya navneteweyî maye. Vê yekê hişt ku biryarsazan meznahiyeke wateyî bi dest bixin û bi awayekî jidil xwe dagerînin hêzeke herêmî û navnetewyî û armanceke stratejî ya demdirêj. Lewre jî Îran karîbû destesriya çar paytextên Erebî bike ew paytext jî ev in: Bexda, Şam, Beyrût û Senaa û tişt nemabû ku Behrênê jî control bike, her wiha karîbû dorbêçkirina siyasî ya ku li ser hatibû sepandin di rêya giraniya xwe ya aborî, siyasî, çandî, leşkerî û olî re derbas bike. Jixwe karîbû xwe wekî aliyekî ku şerê Daişê dike ferz bike û di rêya bazarkirina pelika Kurdî re xwe nêzî rêjîma Tirkiyeyê kir.

Ji aliykeî din ve du şepêlên siyasî li Îranê hene, têkiliyên di navbera wan de rastî hin nakokiyan tên ku carinan bilind dibin û carainan jî dadikevin. Şepêla kevneparêz (muhafizkar) ew aliyê hişk û radîkal e, hewl dide ku destesriyê bike û pirojeyên siyasî û leşkerî li derveyî sînorê Îranê pêk bîne, her wiha pûtepêdanê ji Şêwirmendê bilind dibîne. Lê şepêla vesazîparêz ew aliyê nerm û pragmatîk ye, hewl dide ku şerê gendeliyê bike û demokrasiyeke bêhtir pêk bîne. Her wiha destwerdanên di dijkariyên herêmî yên derveyî sînor de napejirîne. Her du şepêl bi giştî li ser sazkirina zagonan, ravekirina feqha Şîî, şîrovekirina xalên makezagonê û lihevnekirinên li ser destrewa û cihên serweriyê, li hev nakin. Li gorî aqilmendiya diyalaktîk, Şêwirmendê Bilind roleke navbeynkar di navbera her duyan de dilîze, lê praniya caran xwe dide aliyê şepêla kevneparêz da desthilatdarî û Wilayetulfeqîh li hember gefan biparêze. Dibe ku nakokiyên di navbera her du şepêlan de ber bi

tevliheviyeke ku dê neyê kontrolkirin ve biçe, weke ya ku di şoreşa Kesk[9] di 2009'an de çêbû ew jî ji ber ku encamên hilbijartinên serokatiyê di navbera "Ehmedî Necad" û "Mîr Hisên Mûsewî" de hatin sextekirin, jixwe bi hêvotineke rasterast ji hêla "Şêwirmendê Bilind" ve hat rawestandin.

**Xalên lewaziya Îranê:**

Gelek xalên lewaziyê yên Îranê hene, hin ji wan:

- **Ji aliyê hêza nerm ve:**

1- Îran rastî hin nakokiyan tê weke; Rêjîma wê tiyokratîk e, makezagona wê nivîskî ye û rêjîma wê stemkar e; hilbijartinên wê yên giştî bi bijardeyên sînordar in, rêjîma wê bi navê şoreşê bang dike lê tundiyê li dijî xwepêşandanên rikberiyê bi kar tîne, du şepêl hene yek ji wan kevneparêz û radîkal e û ya din jî vesazîparêz û pragmatîk ye, hin dezgehên wê hilbijartî ne û hinên din jî tayînkirî ne, her wiha mezheba Şîî ramyar dike.
2- Heger zimanê farisî bi zimanê din re di nav de yê Erebî jî bê hevrûkirin, ew ji hêla gelên din ve ne hezkirî ye.
3- Nerîtên metirsîdar ên ku di boneyên xwe yên Şîî de vedijînin.
4- Nekarîn û nexwestina vehewandina rikberiya demokratîk, di nav de Misilmanên sune û nijadperestên Ereb jî.
5- Durûtiya helwesta Îranê der barê bûyerên herêmê de û tunebûna zirxînereke sincî. Weke yên ku li herêmên germ yên ku Îran destwerdanê tê de dike çêdibin, ev yek dihêle ku rastiya wê têk biçe.
6- Ramyariya pragmatîkk a Îranê li gorî îdiyolojiya wilayetulfeqîh e, nekarîna yasyîkirina têkiliyan bi gelek dewletan re.
7- Nekarîna Îran ku statûyên herêmî û navnetewyî qayîl bike ji bo ku wê weke hevalekî bêalî bipejirînin mîna Hindistan û Efxanistanê.
8- Nexwestina ku bi mezhebên Islamî re li ser maseyekê rûne û der barê neteweya Islamî de bighêjin têgihiştinekê.
9- Tunebûna rêgezên demokratîkî û mafên gelên ne farisî û bidarvekirina gelek welatiyan ji ber hin gunhên li gorî zagona îranî, sedema wê yekê jî çalakiyên siyasî yên rikber in an jî hejarî ye tevî ku Îran dewlemend e.
10- Pêşkêşkirina tevahiya alîkariyan ji bo hevalbendên xwe yên li herêmên germ li Rojhilata Navîn. Jixwe ew hevalbend jirêderketinên ku

---

[9] Têkiliyên tirkî û îranî li Rojhilata Navîn diguherin. F. Stephen Larrabee, Alireza Nader – navenda lêkoînan RAND a berevaniya niştimanî (ji bo encûmena niştimanî ya saloxgeriyê hate amadekirin.)

mafên mirovan metirsîdar dikin pêk tînin weke; komkujî, koçkirin, êşkêncekirin, binçavkirin, wêrankirin, şewitandina gund û mizgeftan, bû sedema dorpêçkirina li ser Yemenê, kuştina li ser nasnameyê û beşdarbûna hin kesan ji Pasvanan bi awayekî ne fermî di şerên derveyî de.

11- Pêşkêşkirina alîkariyê ji bo hin tevgeran ku wekî tevgerên terrorist tên curandin. Weke "Hizbulah", tabûrên "Elşehîd Ebdelah Ezzam" baskê leşkerî yê tevgera Hemasê û hin milîsên Şîî li Îraq, Sûriye û Xelîcê.

12- Gelê Îranê zoriyê ji ber rêjîma dewleta hember û ya kûr dikêşe, ya ku rêvebertiya dewletê di rêya hin dezgehên şaxî re ku pûtapêdaneke (baldan) bêhtir ji yên fermî dibîne, dike. Wekî mînak; wezareta çandî ya îranî heye û rêxistina "çand û pêşdarî"[10] jî heye ev rêxistin rasterast girêdayî Şêwirmendê bilind e, destrewayên wê ji wezareta çandî bêhtir in, her wiha alîkarî û pûtepêdaneke bêhtir distîne. Jixwe artêşa Îranê heye û Pasvanê Şoreşêhene, hevrikiyek li ser budce û çekdanê[11] di navbera her duyan de heye. Weke mînak serkêşê artêşê "Hesen Feyrûz Abadî" hat rawestandin û "Mihemed Baqirî" yê ku ji pasvanan e li şûna wî hate erkdarkirin, her wiha serokê komarê heye û Şêwirmendê bilind jî heye.

13- Îran hewl dide ku geşedana demokrasiya xwe ya Islamî û gişgirî weke ku rêjîma "Erdogan" dike, bike, ji bo ku li şûna demokrasiya Rojava bi cih bibe. Weke tê zanîn demokrasî, artêş û ramyariya Îranê ya hundirîn û derveyî alîgirên Şêwirmendê Bilind in, yanî alîgirên kesekî yan jî rêjîmeke "Olîgarşî"[12] ne; ne alîgirên xezmeteke ku ji bo gel be, weke ku hizirmendê navneteweyî "Ebdelah Ocelan" dibîne û wisa dibêje[13]: "...Tevahiya

[10] Pêşgotinek di lêkolînên stratejîk ên Rojhilata Navî de. Rûpela 457'an. Cîhad Ewda.

[11]Hêza Pasvanê Şoreşêgelek cureyên çekan di destê wan de hene, rêveberiyeke taybet ji hêzên bejahî, deryayî û asîmanî pê ve girêdayî ye, her wiha dezgeheke taybet a saloxgeriyê bi serweriya Pasvanê Şoreşêve girêdayî ye û di nivîsgeha şêwirmendê ku yekser serkariya wê dike de ye. Toreyeke temam ji cebilxane û çekan di destê wê hêzê de heye ku pasvanan bi çek û amadekariyên cengê zêde dike, her wiha hin çekan bi pêş dixe bi taybet moşekên navincî û dûravêj. Taybetmendiyeke hêza pasvanan heye ew jî ew e ku leşkeriya neçar li şûna ku li nik artêşê be, di destê wê de ye; her wiha xwebexşên hêzên sefeberiya gelêrî (Basîc) di refên xwe de kom dike.
Hêzên siyasî di civaka Îranê de- Peymangeha Misrî ya Lêkolînan.

[12] Oligarchy (Olîgarşiya) yan jî hukmê hindekayî, şêweyek ji şêweyên desthilatdariyê ye ku desthilatdariya siyasî di destê bireke biçûk ji civakê de ye; ew bir xwedî darav, regez, dsethilatdariya leşkerî û serweriya hindekayî- wekîpîdiya zanistnameya serbest.

[13] Manifîstoya Şaristaniya Demokratîk. Parêznameya pêncemîn, pirsgirêka Kurdî û çareseriya netewya demokratîk (parastina Kurdên ku di nava erzînkên tunekirina çandî de dorpêçkirî mane). Rûpela 581'î. Ebdelah Ocelan.

hewldanên Olîgarşiya farisî dikeve bin xezmeta şoreşa ku li dijî nûjentiyê ye (dijberî sermayedariyê ye) weke çekeke dijwar li dijî desteseriya rojavayî tê bikaranîn, bi mebesta ku rewatiyê bistîne ji bo ku li cihekî zêdeyî xwe di nav hevsengiya dewletên nijadperestî de li Rojhilata Navîn bigire" bi vî awayî nasnameya niştimanî windayî ye. Demokrasiya Îranî ji sînorê tîreya Şîî dernakeve, her tişta ku ji wî sînorî derkeve ev demokrasî wî venahewîne. Berovajî demokrasiya rasteqînî ya ku tê wateya rêvebirina dezgehên zagonsazî, cîbicîkirin û dadweriyê ji hêla gel ve. Tişta ku berovajî angaştên demokrasiya rêjîma îranî vala derdixe, alîkariya wê ji bo hin rêxistin û statûyên stemkar, gişgir û şofînî re ye ku ji demokrasiyê dûr in. Weke rêjîma Sûrî û baskê siyasî û leşkerî yê alîgirê Îranê li Îraqê.

14- Hizirmendê navneteweyî "Ebdelah Ocelan" vê yekê tekez dike[14] "...çanda Îranî ji destpêka nûjentiya sermayedar ve bi giştî û nûjentiya dewletî û nijadî bi taybetî, di şerekî her timî de ye. Ew şerê van hêmayan hemûyan dike. Ji a niha ve gelên Îranê têgihiştine ku mezheba Şîî ya ku weke diyardeyeke xwecihî û dîrokî li ser wan gelan hatiye sepandin, nijadperestiyeke xwerû ye. Kopiyayek ji nûjentiya sermayedarî ye. Rûpoşeke ku şoreşa îranî ji naveroka wê vala kiriye. Bi vî awayî ew milet bi raperîn û serhildanan radibin...".

15- Tevî îdiyolojiya olî ya ku rêjîma Îranî bangeşeya wê dike, lê belê nijadperestiya farisî jê dûr nakeve, ew jî di rêya bihêzkirina navlêkirinên kendava farisî, zimanê farisî, vejandina cejna Newroza farisî, bikaranîna salnameya farisî û hewldana bidestxistina lêvegera[15] olî ya Şîî ji Ereban li "Necef û Çiyayê Amil". Lêkolînên feqhî yên der barê qebîleyên îraqî[16] de û yên ku xwe dispêrin hin agahiyên ku di navbera her du şerên cîhanî de hatine berhevkirin, çîrokên der barê girêdana Şîe û sune bi hin êl û qebîleyên li nîvgirava Erebî dubare dike.

16- Zehmetiya lihevkirina xwestekên Yonîsko û têgehên şoreşgerî yên ku ramanên "Xumeynî" yên taybet bi rêbazên zanistî û fêrkirinê, dinimînin.

---

[14] Eynî jêdera pêşberîn e. rûpela 597'an

[15] Lêvegera olî, têgeheke Şîî ye, tê wê wateyê ku Misilmanên Şîî li kesên ku gihaştine asta ictîhad û zanistê (nelihevkirinek li ser ya dawî heye) di encamkirina hukmên şerî de, vegerin. Kesê ku ji bo cihê hikumdanê jêhatî be û karibe nêrînan di hukmên feqhî de di pirtûkeke ku bi nameya zanistî tê navkirin de bide, di têgeha Şîî de bi navê (Lêvegera Olî) yan jî (Ayetulah Eluzma) tê naskirin. Wekîpîdiya

[16] Nijadî, federalî û ramana hemwelatiya tîreyî li Îraqê: çareseriyeke rexnegerî bi pênûsa "Raysder Vîsar" lêkolînerek e li peymangeha nerwîcî ya karûbarên navneteweyî, her wiha sernivîskarê malpera www. historiae. org a taybet bi Îraqê ye.

17- Îran nikare hemû saziyên leşkerî û ewlehiyê bike farisî, her wiha zaroyên gelên ne farisî yên ku bi neteweya farisî re ne dilsoz in rêveberiya cihên leşkerî dikin.

18- Zehmetiyên demografî, jixwe çar dewlet tenê piraniyeke Şîî di wan de heye ew jî ev in "Îran, Ezrebîcan, Behrên û îraq" her wiha grûpên Şîî ew grûpên tîreyî (taifî) yên herî mezin li Libnanê ne.

19- Îdiyolojiyeke hevrik ku ji hêla gelên herêmê û ji hêla demokrasiya Rojava ve hatiye pejirandin li hember îdiyolojiya şoreşa Islamî derdikeve, weke îdiyolojiya "Felsefeya Neteweya Demokratîk" a ku hizirmendê navneteweyî "Ebdelah Ocelan" li şûna îdiyolojiya nijadperestî û dogmatîka olî û tunekirina serweriya nijadperestî û dogmatîkê, pêşkêş kiriye. Piştî ku îdiyolojiya nijadperestî û dogmatîka olî gelên Rojhilata Navîn jev dûr xistin, pêkvejiyana di navbera van gelan de dê bi vê îdiyolojiya nû pêk were.

20- Piştî pêşketina teknolojî û ragihandinê nifşekî nû ji gêncên Îranê ku şoreşa "Xumeynî" jiyan nekirine û tê de beşdar nebûne, derket. Ev nifş li gorî xwezaya mirovahiyê hewl dide ku azad bijî û biguhere, her wiha pêşveçûneke aborî ya zêde dixwaze û li zanistê digere. Jixwe dora 60% ji nişteciyên Îranê di bin temenê 25 salan[17] de ne.

21- Şepêla vesazîparêz Derket û ber bi hevrikeke rasteqîn li hemberî şepêla kevneparêz veguhert. Wê ji hemû caran bêhtir karîbû alîgirên xwe kom bike û rewşê protesto bike, jixwe bersiva tund a desthilatdariyê nerazîbûna milet zêde dike û dîwarê tirsê hildiweşîne, her wiha valahiya di navbera her du şepêlan de yê vesazîparêz û yê kevneparêz[18] fireh dike.

---

[17] Îran şoreşeke di geşbûnê de ye, Dr. Ziyar Kraçî, Pakistan, 2000.

[18] Eynî jêdera pêşberîn.

|  |  |
|---|---|
|  | |
| ***Hin nerîtên Şîe û bikaranînên rêjîma Wîlayetûlfeqîh*** | |

- **Ji aliyê hêza hişk ve:**

1- Artêşa Îranê ne artêşeke niştimanî ye, lê belê artêşeke girêdayî Weliyulfeqîh e. Ji serdema empratoriya Farisî, Exmînî, Sasanî û Sefewî ve û heta serdema hukmê Wîlayetulfeqêh, artêş her tim di bin desteseriya hakim de bû, çi Şah be çi jî Weliyulfeqîh be. Tevî hêza artêşên rêjîm û empratoriyên ku serweriya xaknîgariya Îranê dikir, lê nikarîbûn parastina xwe bikin, ji ber ku artêş ne niştimanî bû û yekser bi hin kesan ve girêdayî bû, yan rastî êrîşeke derve dihat yan jî rastî derbeyên leşkerî dihat.

2- Gotara (xîtab) Îranê ya dijberî îdiyolojiya gelên din û gefdanên domdar yên dijî berjewendiyên dewletên rojavayî li Kendavê û Rojhilata Navîn, dewletên cîhanê dixe rewşeke ne aram de. Weke mînak Îran gefan dide ku "Tengava Hirmuz"ê li kendavê bigire û wê weke alaveke gefkirinê dijî berjewendiyên Emerîka û dewletên rojavayî bi kar bîne. Lê ev kiryar dê

bandorê li piraniya dewletên cîhanê û di nav de yên heval jî bike, jixwe dê bandorê li xwe jî bike. Ji ber 90% ji petrola Îranê û 80% ji petrola herêmê di rêya vê tengavê re ber bi cîhanê ve diçe. Ev tengav 40% ji pêwistiya cîhanê ya petrolê[19] dabîn dike, heger bê girtin dê nirxê petrolê bi giştî pir bilind bibe û dibe ku hevbendiyeke cîhanî dijî Îranî derkeve. Heman tişt der barê bernameya wê ya navokî û moşekî de ye ya ku gelek dewletan dixe rewşeke bêramiyê de.

3- Bi dehan odeyên operasyonan ên girêdayî hêzên dijberî Îranê hene. Di her kêliyê de kar dikin û li navgînan bigerin ku di rêya wan re Îranê girê bidin, lê bidin û wê lawaz bikin. Ev yek jî bandoreke neyênî li ser rewşa Îranê ya hundirîn û ya herêmî çêke.

4- Îran nikare baregehên asîmanî û moşekî li hin dewletên hevalbend çêke, her wiha jêhatiyên şerkirinê di nav leşkerên wê de kêm e û lawazî di plankirina şer de di nav serfermandaran de heye. Jixwe jidestdayînên mirovî û daringî yên li Sûriye, Îraq û Yemenê van tiştan piştrast dikin. Ceneralên Îranî gelek caran neçar dimînin ku di beşdarî şerên biçûk de bibin. Li kêleka wê jî bername û perwerdeyên ronakbîrî û leşkerî pir lawaz in, di munaweratên leşkerî yên bi dewletên din re beşdar nabe û bi vê yekê sûdê ji karzaniyên wan nayê girtin (carinan munaweratên leşkerî li gel Rûsiya çêdibe lê bi awayekî kêm û lawaz). Dîsa jî Îran nikare rikberiya çekdar a hundirîn ya ku her tim operasyonên serkeftî pêk tîne, têk bibe.

5- Hin tevgerên rikber û çekdar li Îranê hene heger alîkarî, peredan û çekdayîna baş bistînin, dê bandoreke bihêz li siyaseta rêjîma Îranê çêkin.

6- Bandorên mezin ên cezayên aborî û darayî û qedexekirina kirîna çekan ya ku li ser hatiye sepandin, hene. Îran nikare êrîşeke leşkerî serkeftî û berhemdar ji bo ku hin erdên biyanî kontrol bike, pêk bîne. Her wiha nikare alavên leşkerî yên hesdar û binesaziya dijmin wêran bike. Jixwe wezareta berevaniya Emerîkî "Pentagon" hişmendiya leşkerî ya Îranî wisa şîrove dike: Ew hişmendî li ser bingehên berevanî û çavdêrkirina berjewendiyên dijminên xwe yên aborî, siyasî û leşkerî hatiye avakirin. Çekên Îranî kevn û kêmhûrbînî ne û cebilxaneya wê ya heyî jî kevn e û hîn ji dema Şah ve ne. Îran nikare çekên hûrbînî û alavên elektronî yên nûjen bi taybet yên yên girêdayî hêza asîmanî bi dest bixe. Çek û moşekên ku di destê wê de hene û gefên metirsîdar yên ku serwerên Îranê didin, ne li hemberî hêza leşkerî ya hevrikên wê ne.

[19] Stratejiya Îranê li hemberî dewletên kendava Erebî- Dr. Tacedîn Caifer El-Taî.

7- Dewletên herêmê hewl didin ku berevaniyên xwe zêde bikin, budceyeke mezin jê re terxan bikin û çekên herî nûjen bikirin. Weke mînak, mezaxtina berevaniya Siûdî nêzî 10 qatên[20] budceya berevaniya Îranê ye. Her wiha Erebistana Siûdî rêkeftinên hevkariya berevanî ji aliyekî bi Kiwêt, Behrên, Qeter û Umanê re mor kiriye, ji aliyekî din ve bi Emerîkayê re jî di sala 1991'ê de mor kiriye. Rêkeftineke bi vî rengî bi Îmaratê re jî di sala 1994'an de mor kiriye. Erebistana Siûdî bergiriyên bi vî rengî girtine lê ne bi awayekî fermî. Hin rapor hene ku girêdayî pergala "MOSAD"ê ne, eşkere kirine ku Siûdiyê du serikên navokî di rêya navbeynkarên Pakistanî re kirîne.

8- Hêza Îranê ji aliyê şerê elektronî ve lewaz e. Îran nikare li hember veyrûsên elektronî yên ku astengiyan di sîstemên bernameyên stratejîk yên elektronî û hesdar de çêdike, bisekine. Weke "veyrûsê kurmê" (Stoks Nêt[21]) yê ku astengî di dehên kompîtûrên bernameya navokî ya Îranê de çêkir. Her wiha sîstemên Îranê yên elektronî nikarin di şerên elektronî yên pêşerojê de xwe li ber dewletên ku di vî warî de pir pêşketî ne, bigirin. Jixwe hin jêderan destnîşan kir ku bombeya kehremegnatîsî[22] û ya tarîkirinê[23] di destê Emerîka de heye. Kûryaya Başûr jî ji bo ku karîna Koryaya Bakur bitepisîne, ew bombe weke çekekê nûjen pêş xistiye.

9- Îran şerê desthilatdariyê li dijî Erebistana Siûdî û Tirkiyayê dike, encama vê yekê ew e ku hêza wê ya zîrek bêserûber dibe, weke di krîza Sûriye,

---

[20] Bi hejmaran… hevrûkirinek di navbera artêşa Siûdî û Îranî de- Sputnik Arabic.

[21] Stoksnêt (bi ingilîzî Stuxnet): kurmeke kompîtûrê ye dikeve sîstema wîndozê. Tê gotin ku ew ji hêla Emerîka û Israîlê ve hatiye çêkirin. Wekîpîdiya.
Ev veyrûz bi taybet ji bo ku derbasî sîstemên kontrolkirinê bibe û ji bo ku daneyan ji beşgeha Sîmênz bistîne, hat sazkirin. Ew beşgeh carê ji bo rêvebirina alîkariyên avê, kolerên petrolê, îstgehên elektrîkê û hin kargehên din ên pîşesaziyê, tê bikaranîn. Ev veyrûz dikare bê enternêt û di rêya kerta bîrdankê re veguhêze û dikare ji sîstemekê ber bi sîstemeke din ve biçe. Rojnameya Elweset a Behrênî- Îran tekz dike ku ew rastî teroreke elektronî hatiye- Hejmara 2942'yan| yekşem 26'ê rezbera 2010'an.

[22] Bombeya kehremegnatîsî (bi ingilîzî electromagnetic bomb) an jî ya elektronî: Ev çek armanca wê ew e ku pergalên elektronîk di rêya birûska magnatîsî ya mezin re rawestîne, ew birûsk dikare bikeve nav alavên elektrîkî, elektronî û sîstemên vêxistinê û dikare ziyanê bigihîne wan û pûç bike. Wekîpîdiya.

[23] Bomebeya Tarîkirinê yan jî ya Grafît: Dezgeha pêşvebirina berevaniyê ya Kûryaya Başûr nûjen kir. Ew bombe piçkên karbona Grafîtê ya ku di rêya kîmiyayê re hatiye dirustkirin, li ser deverên elektrîkî tê belavkirin ji bo ku çirûskên elektrîkê çêke û toreya elektrîkê betal bike. Emerîka di şerê li dijî Îraqê di sala 1991'ê-1990'î de bi kar anî, NATO jî li dijî Sirbiya di sala 1999'an de bi kar anî.
Koryaya Başûr: Em amade ne bombeyeke tarîkirinê bi pêş bixin ku karibe sîstema wizeyê li Biyong Yangê pûç bike- http://www. youm7. com

Libnan, Îraq, Yemen, Misir û Behrênê de. Her wiha hebûna Rûsiya li Sûriyeyê nahêle ku Îran li gorî ku dixwaze di hundirê Sûriyeyê de tev bigere. Jixwe guman heye ku rêjîma Sûrî xwe bavêje Rûsan heger desteseriya Îranê nepejirîne. Têkiliyên Sûrî-Îranî di salên notî û heştêyî de têkiliyeke hevseng bû. Lê di dema lawazbûna rêjîma Sûrî di 2011'an de, Îran hewl da ku desteseriya vî welatî bike, her wiha xwe nêzî sînorê Israîlê bike û xwe bigihîne qeraxa rojhilatî Deryaya Spî.

10- Îran her tim di nerehetiyekê de ye ku Israîl êrîşeke leşkerî li dijî kargehên wê yên navokî pêk bîne, weke ya ku li dijî vejengeha Îraqê pêk anî. Dibe ku şerekî giştî li dijî wê derkeve heke berjewendiyên Emerîkî armanc bigire.

11- Pişta xwe bi milîsên ku tektîka şerê gerîlayî ji bo armancgirtina berjewendiyên dijminan bi kar tînin, xurt dike. Tişta herî bêhtir a ku Îranê dilgiran dike ew e ku şerên gerîlayî yên rêxistinkirî di hundirê erda wê de li dijî wê ji hêla rikberan ve derkevin. Heger ew tevgerên ha çekên mîna yên di destê milîsên Şîî de bi dest bixin, dê pêşketineke cureyî li nik xwe çêke. Jixwe hevgirtina eniya hundirîn sist e, sedema wê jî pirbûna pêkhateyan e û tunebûna azadî û mafên mirovan e. Her wiha gelek tevgerên çekdar ku weke bertekekê li dijî tundiya rêjîma Wîlayetûlfeqîh in, derketine.

12- Îran moşekên balistîk ên dûravêj ji bo ku gelekî dûr biçin, wan bi pêş dixe û nûjen dike. Her tim lêkolînan dike ji bo ku hûrbîniya wan zêde bike. Tişta ku wê dilgiran dike ew e ku rastî êrîşên moşekî ji hêla dijminan ve, tê. Dewletên li hember weke"Emerîka, Berîtaniya, Israîl, Erebistana Siûdî, Pakistan û Îmarat" moşekên dûravêj û yên xwedî bandor ji aliyê hûrbînî, qasiya wêrankirinê û xurtbûna derbeyê ve, di destên wan de hene. Her wiha hêzeke asîmanî mezin li nik wan heye, Siûdiyê 790 balafirên şerker di destê wê de heye, lê Îran 477 balafirên wê hene[24], Pakistan jî heman tişt e. Îran nikare êrîşeke pêşdem li dijî wan pêk bîne, ji ber ku navendên hayedariyê yên bilez û pêşketî ku girêdayî serweriya navîn ya Emerîkî e li Xelîcê hene. Jixwe Israîl û Pakistan çekên navokî di destê wan de heye.

13- Îran hewl dide ku bernameya xwe ya navokî bi pêş bixe û çekên navokî bi dest bixe. Di eynî demê de jî ev yek sawekê jê re çêdike. Asêgehên leşkerê yên ku Îran ji deverên xwe yên stratejîk re ava dike û dibe ku bibe armanceke leşkerî, pêwîst dike ku çekên stratejî yên sosretî bi dest bixe. Jixwe ev çek li nik artêşa Emerîkî, Berîtanî û Israîlî hene. Helbet wêrankirina vejengehên navokî yên Îranê dê bobelatekê bîne serê gelên Îranê û gelên

[24] Bi hejmaran… hevrûkirinek di navbera artêşa Erebistana Siûdî û Îranê de- Sputnik Arabic

herêmê[25]. Dibe ku bandora wê bi dehên salan bidome, weke bandorên metirsîdar ên ku vejengeha "Çirnobel" li Ukraniya û vejengeha navokî li Îraqê ya ku Îsraîl bordûman kir, li pê xwe hiştin. Ji ber vê yekê vejengehên navokî xaleke lawaziyê li cim Îranê çêdikin û nikare parastina wê bike.




## Pêşeroja Îranê

Desthilatdariyên ku li ser xaknîgariya Îranê rabûn, tevî ku xwedî artêşine bihêz bûn lê hilweşiyan. Sedema vê yekê gendelî, zordarî, tunebûna nasnameya niştimanî û hevrikiya li ser desthilatdariyê bû. Dewleta "Behlewî" rêjîma dawî bû, di sala 1979'an de hilweşiya. Rêjîmeke nû bi coşeke şoreşgerî û bi rengekî radîkalî ava bû. Ev rêjîm bi çalakî û bi karîgerî dihat xuyakirin. Tevî qedexekirina ku li ser hatiye sepandin, karîbû di demeke kurt de bibe hêzeke bibandor li Rojhilata Navîn. Karîbû şerekî demdirêj li dijî rêjîma Îraqî bike (Şerê Îraqî Îranî). Jixwe bi dehan rêxistinên rikberên wê hene. Dezgeha Wîlayetûlfeqîh  a ku ji hêla kesayeta karîzmî "Ayetulah Elxumeynî" ve hat avakirin, roleke navmanî di belîkirina rêjîma nû li Îranê de lîst û bi navê wî ve hat girêdan. "Xumeynî" bû bavê rewanî û lêvegera hizirmendî ji bo alîgirên

[25] Çi belavbûneke tîrêjên navokî ku çêbibe, çend demjimêran pêwîst dike ta ku bigihêje dewletên Kendavê. Weke dewleta Kiwêtê a herî nêzîk ji vejengeha Îranê re, piştire jî Siûdiyê tê, tîrêjên navokî dora sê rojan pêwîst dikin ta ku bigihêjinê. Dibe ku di şeş mehan de bigihêjin çend dewletên Erebî weke Misir, Sûriye, Urdin, Îraq, Libnan, Yemen û hin dewletên din jî weke Efganistan, Pakistan û Tirkiye.
Dibe ku belavbûna tîrêjan li dewletên ku digihêjê, hin xwariyan di laşê mirovan de çêke û cînên mirovahiyê biguherîne. Her wiha dibe ku çend nexweşiyên penceşêrê belav bike, weke penceşêra xwînê. Jixwe ev yek ji xeynî pêdiviyên wê yên leşkerî û aştiyane, jiyana mirovan li civakên nêzî vejengehên navokî rasterast dixe metirsiyê. Heke belavbûn di vejengeha Boşeher de çêbe, dewleta Kiwêt dê ji hemûyan bêhtir pê bandor bibe- https://alsafatnews.net/?p=103055

xwe yên Şîî li cîhanê. Tevî hêza Îran û rola wê ya bibandor, lê gelek valahiyên wê yên siyasî, ewlehî û leşkerî hene. Dibe ku hin dijminên wê ji  bo ku rewşeke tevlihev di rêjîma nû de derxin û lawaz bikin, bi kar bînin. Weke mînak, piştî mirina "Xumeynî" dezgeha "Wîlayetûlfeqîh " lawaz bû û hinek roniya xwe winda kir. Jixwe xelîfeya wî "Elî Xamêneî" bi eynî rêbaza ku Xumenî bi kar tanî û ji ber hebûna hin hevrikan ku dixwestin cihê wî bigirin, nikarîbû di desthilatdariyê de ber dewam bike. Vê yekê nelihevkirina siyasî ya ku  piştî mirina Hz. Muhemed di xîlafeta Islamî de derket, anî bîra me. Her wiha şepêla vesazîparêz (reformî) ya pragmatîk derket û ji bo ku serokomar destrewayên bêhtir bi dest bixe, zext kir. Jixwe ew nelihevkirin di serhildana sivîlî de ya ku di 2009'an ji ber tawankirin bi sextekirina hilbijartinan li Îranê, derkete holê. Navê "Şoreşa Kesk" li vê serhidanê hate kirin. Zextên ku cezayên dewletên rojavayî li ser Îranê pêk anîne dibe ku pragmatîkên Îranê yên ku bûne hêzeke girîng li Îranê bixin rêyekê û kevneparêzên radîkal bixin rêyekê. Dibe ku ev yek kirîzeke rasteqîn di pêşerojê de çêke. Pasvanên Şoreşger bûne serê kêra rêjîma Wîlayetûlfeqîh , ew ne hêzeke niştimanî ne, lê belê îdiyolojiyeke tundirew desteseriya wê dike. Ev tê wê wateyê ku proseya biryardanê ne li ser bingehên zanistî, lê belê li ser bingehên îdiyolojî ava dibe. Her wiha coşa îdiyolojî ji ber veguherîna dezgehan a domdar lawaz dibe[26].

Rêjîma desthiatdar nikare nakokiyên siyasî yên hundirîn çareser bike û nikare xwe nêzî rikberiya hundir bike yan jî wê bi dawî bike. Tomarnameya wê bi binpêkirinên mirovahiyê tijî bûye. Li kêleka wê jî alîkariyê dide hin rêxistinên ku tu girîngiyê nadin mafên mirovan, ne jî rêgezên demokrasiyê. Her wiha ketiye nav kiryarên ku navê tawanên şer li wan tê kirin. Ev rêjîm hewl dide ku ramanên xwe yên mezhebperestî û radîkalî di bin navê "Şoreşa Islamî" de, li derdorên ku ji îdiyolojiya wê cuda be belav bike. Ev tişt hemû bihaneyekê peyda dikin da eniyeke hundirîn ku li dijî vê rêjîmê rabe, ava bibe. Li gorî şopandina bûyerên germ li Rojhilata Navî, em dibînin ku jinûverêzkirina pelikan û jinûvevegerandina stratejiyan, heye. Weke mînak, jihevketina îdiyolojiya Sunî li cîhanê gelek êş û azar ji sune re peyda kirine. Rêxistinên Sunî yên bihêz li ser qada navneteweyî derketine û statûyên alîgir

[26]Pasvanê Şoreşêyên Îranî… avabûn, çêbûn û rola wan- nivîsîn: Kînêt Katizman- belavker: navenda Îmarat a lêkolîn û lêgerînan.

ji xwe re ava kirine. Lê ji ber radîkaliya wan û kordijminatiya wan ji dewletên rojavayî re, her wiha pêkanîna şerekî giran li dijî wan, hişt ku hêzên cîhanî kom bibin ji bo ku wê têk bibe û lawaz bike. Derketina bûyeran li dû hev destnîşan dike ku palnsazên stratejîk hewl didin ku bandorê li hişmendî û hestên piraniya gelên Rojhilata Navîn û bi taybetî yên Sunî bikin. Ew jî di rêya veguherandina dijminê "Israîla impryalîst" bi dijminê "Îrana Şîî" re, her wiha çavgirtin li azarên Sune û rewşên zehmet ên ku tê de dijîn, nemaze piştî ku Sune ji ber radîkalên Sunî û Şîî hatin koçkirin û rastî komkujiyan hatin û di panegeh de bi cî bûn. Li kêleleka wê jî afrandina tevliheviyan di rêya serûbinkrina rêjîmên hakim, tevlîhevkirina rewşa û şikandina rêjîmên Sunî. Her wiha alîkariyê pêşkêşî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk û QSD'ê li Rojava-Bakurê Sûriyeyê dikin. Jixwe Rêveberiya Xweser "Îdiyolojiya Neteweya Demokratîk" ji xwe re bingeh digire û ew weke çareseriyekê li Rojhilata Navîn li "Îran, Îraq, Tirkiye û Sûriyeyê" bi pêş ve diçe her wiha xwe berdêl ji hişmendiya şofîniya nijadperestî û dogmatîka olî dibîne. Ev yek dê bihêle ku neayînî, demokrasî û wekheviya civakî bi cih bibe.

Hin lêkolîn[27] destnîşan dikin ku dijberiyên mezhebperestî li herêmê dê di salên bê de jî berdewam bikin, bi taybet şerê Şîî-Sunî yê ku bûye nîşaneyek di dîmena Rojhilata Navîn de, ya ku Erebistana Siûdî û Îran bûne navendên rakêşan û vehewînerên lîstîkvanên vê dijberiyê. Kesên ku sûdê ji tevliheviyên mezhebperestiyê werdigirin dê civakên xwecihî li dor mezhebekê kom bikin, her wiha hevrikiyê bi kesên ku dixwazin cemaweran li dora nasnameyên niştimanî û demokrasî kom bikin, çêkin, ew nasname jî dê li gorî desthilata heyî bêne destnîşankirin. Tê payînkirin ku Emerîka û Rûsiya dê roleke mezintir li gorî berjewendiyên xwe ji bo aramiya herêmê bilîzin. Yanî nahêlin ku şerekî herêmî bi giştî li Rojhilata Navîn çêbe û dê rewşê di bin kontrola xwe de bihêlin. Tevî hevgirtina aliyê Şîî li hemberî tevliheviya li aliyê Sunî ya ku ji ber şerê navxweyî û lihevketina berjewendiyên suniyan derketiye ku di encamê de hêz banodriya wê kêm bike, ev tişt rê dide ku aliyê Şîî bêhtir belav

[27] Pêşeroja têkiliyên mezhebperestî li Rojhilata Navîn- Jeffrey Martini, Williams Yong û Heather Williams- dîtineke çareserkirinê û nêrînên pisporan der barê siyaseta nihayî de- Ev lêkolîn ji bo ku alîkariya grûpeke salogeriyên Emerîkî bike hat çêkirin, ew jî di rêya pêşkêşkirina hin senaryoyan de ku der barê pêşveçûna mezhebperestî li Rojhilata Navîn di dirêjahiya dehsaliya bê de ye. Dezgeha RAND

bibe. Lê ev belavbûn li gorî girêdana lîstikvanên çalak di aliyê Şîî de bi nasnameya xwe ya niştmanî ya ku ji ya nasnameya Îranî cuda ye.

Sedema hêza Îranê îdiyolojî û tunebûna hembereke herêmî jê re. Ji tiştên ku berê hatine diyarkirin em têbîn dikin ku Îran nikare baldariya vê taybetmendiyê bike. Lewre, ji ber ku hin hêz û statûyên din hene ku piroje û îdiyolojiyên wan jî hene, nikare di serweriya xwe de dirêj bike, her wiha nikare parastina ast û cihê xwe bike. Gelek gef hene ku rêjîma Wîlayetûlfeqîh metirsîdar dikin, ev yek jî bi gelek senaryoyên weke "belqankirina an jî efxankirina Îranê" tê nimandin.

Heger Îran li stratejiya xwe ya hundirîn û derveyî venegere û têkiliyên xwe bi gelên xwe û gelên din re çak neke, çarenûseke nenaskirî û dibe ku ne xêr be dê li benda wê be. Hêrsbûna gelêrî di hundirê Îranê de, hêrsbûna gelên din ên ku rêjîma Îranê gelek êş û azar anîne serê wan û hêrsbûna navnetewyî li hemberî ramyariyên Îranê yên ku gihaştine astên herî bilind; her wiha bûyerên gurkirinê, dibe ku rewşê biteqînin, her wekî yên ku li bihara gelên Erebî çêbûn. Hizirmendê navnetewyî "Ebdelah Ocelan" vê nêrînê dibîne[28]: **"Şoreşa herî mezin a sedsala bîstan ji para Îranê bû û tişta balkêş tê de ew e ku bi hêsanî nayê vemirandin, ji ber ku ya Rojhilata Navîn e. Dema ku bandora şaristaniya demokratîk ya derve bi dirûvê çaksaziyê yê ku ji dîrokê tê, bibe yek, xuya dibe ku dê revîn ji helandina Islamperestiya di bin navê şoreşa Islamî ya Îranî de tune be. Bi vê yekê Şoreşa Islamî ya Îranî; yan dê xwe têk bibe, yan dê di bin navê Islamê de li hemberî radîkaliya Rojhilata Navîn bisekine û dê zextê bike ji bo ku çareseriyeke kokî ji arîşeyê re were dîtin. Lewre jî encamên Şoreşa Islamî bi hêsanî ji holê ranabin. A niha jî tişta berbelav ew e ku Îran qonaxeke veguhêz jiyan dike, yan dê di nava xwe de tundrew be û cemawer vê yekê napejirînin, an jî dê neçar bimîne ku derbasî qonaxa encamê dawîn a çakzaziyan bibe. Wê demê jî pêkanîna Islamiyeke demokratîk li Rojhilata Navîn dibe neçariyek. Çawa ku demokrasiya sermayedar a Israîlî ji rojava ve zextê dike ku nijadperestî û feodaliya Erebî ber bi demokrasiyê ve bibe, Îran jî hewl dide ku eynî tişt bike ew jî di rêya veguherîna demokrasiya di hundirê Islamê de ji aliyê rojhilat ve. Her wiha rewşa veguhêz a Îranî gelekî dom nake, lê heke berê**

[28] Ji dewleta kahinên Somer ber bi şaristaniya demokratîk ve. Rûpela 472'yan. PDF. Ebdilah Ocelan.

**xwe bide ber bi tundrewîtiyê ve, dê ji hêla nijadperest û çaksazên hundir ve bê hilweşandin. Heger karîbe ber bi demokrasiyê ve veguhere, dê yekîtiya federalî ya Îranê a demokratîk bibe nimûneya herî bihêz ku bandorê li Rojhilata Navîn bike. "**

Hin kategoriyên bijarde yên Îranê hene ku siyaseta Wîlayetûlfeqîh napejirînin û parastina gelên bindest dikin, her wiha banga demokrasî û wekheviyeke civakî ya zêdetir dikin. Dibe ku ev bang rastî bangên din bê yên ku banga şerê gendeliya darayî û rêveberî dikin û misogeriya mafên mirovan dikin, her wiha rastî tevgerên din jî bê yên ku parastina mafên gelên din dikin. Ev yek, yekbûna gelên Îranê û serhildana li dijî rêjîma şah tîne bîra me, ku "Xumeynî" ji bo ku sîstema xwe ava bike sûd ji vê yekê girt. Dibe ku ev yek li dijî rêjîma Wîlayetûlfeqîh dubare bibe. Ji hin kesên ku alîgiriya demokrasî û pirsgirêka Kurdî dikirin: "Aytulah Mehmûd Eltaliqanî" (1911-1979), ji ber kesayeta wî ya şoreşgerî bi nasnavê "Vedenga Ebî Der El-Xefarî û hêrsa Malik El-Eşter" dihate naskirin. Piştî ku bi Kurdên neteweperwer û komînîstan (Tude) re karîgeriyeke çalak çêkir, bû alîgirekî bihêz ji demokrasî û pirsgirêka Kurdî re. û kuştî di nav nivîna xwe de hate dîtin. Her wiha "Aytulah Mihemed Hisên Elmuntezerî" (1922-2009) mirovekî çak bû, ji bo ku Îran bibe mînakeke demokrasiyê li herêmê, hewl dida ku pirsgirêkên hundirîn li Îranê çareser bike. Ji ber ku banga çakiyên kokî di civaka Îranî de dikir û ji ber ku sîstema siyasî rexne dikir, ji cihê şêwirmendê bilind hat dûrxistin. Berî çend salan ji ber rawestana dilê wî jiyana xwe ji dest da. Her wiha "Mehdî Bazirgan" (1907-1995) jî hebû. Ew kesayeteke lîberal bû. Bi awayekî eşkere li pêşiya Xumeynî got ku ew alîgiriya çareserkirina pirsgirêka Kurdî û neteweyên din dike mina, "Eltaliqanî". Kiryarên rêjîma desthilatdar rexne kir û daxwaza demokrasî û misogerkirina azadiya giştî kir. Ji serokatiya hikûmetê vekişiya û bû dijeberekî rêjîmê ta ku jiyana xwe ji dest da.

Ji xeynî berhengriya derveyî rêjîma Wîlayetûlfeqîh rastî berhengariyên (tehedî) hundirîn ên rasteqîn ku kesî payîn nedikirin û piştguh dikrin, tê. Gendeliya ku dezgehên dewletê xera dikin, parêzbendiya dezgehên ewlehiyê, kambaxbûna jiyankirinê, kirê û xizmetguzariyê li çend herêmên Îranê, tunebûna wekheviya civakî, windakirina gelek malbatan ji zarokên xwe re di şerên mezhebperestiyê de, astengiyên ku alîgirên rêjîma weliyê feqîh ji welatiyan re derdixin weke endamên Basîc ew jî di rêya çavdêrîkirin,

şantajkirin û bidestxistina takemafan. Ev tişt tev bûne zemînek ji her raperînekê re ku doza guhertinê dike weke raperîna gelêrî ya ku di sala 1979-1978'an de çêbûbû. Li vir ji bo ku kes serkeftina gel a ku bi şoreşê tê nimandin nedize û ji bo ku ji hêla hêz û kategoriyên ku dixwazin desthilatdariyê bi dest bixin neyê bikaranîn, rola hêzên mezin ên demokratîk û nerm tê. Tevî ku çêbûna vê yekê demeke hinekî dirêj dixwaze, lê çêbûna wê gelekî pêkan e. Ev yek gotina serwerekî şepêla vesazîparêz tîne bîra me, ew jî "Mihemed Rîda Xatemî" birayê serokê Îranê yê berê "Mihemed Xatemî" ye. Gotina wî jî wisa ye: **"guherîn li Îranê dê zehmet be û dê hin bi hin be… kesên payîn dikin ku her tişt dê di şeş mehan an salekê de çareser bibe, pêwîst e tê bigihêjin ku guherîna civakî ya kûr çend salan dixwaze[29]. "**

Hizirmendê navneteweyî "Ebdelah Ocelan" tekez dike [30] ku em nikarin aliyê olî ji aliyê neteweyî li Îranê ji aliyê desthilatdariya hakim ve ji hev cuda bikin, lê belê her du alî xwe bi hev ve girtine. Îran nebûye dewleteke neteweyî, ne jî dewleteke olî, lê belê xwe wekî mînakeke sêyemîn ku her duyan bi hev re kom dike, pêşkêş kiriye. Ev yek berovajî nûjentiya sermayedarî û sermayedariya cîhanî ye, her duyên ku têgînên neayînî û lîberalî ji aliyên hundirîn û derveyî ve pêşkêş dikin. Her wiha nikare bi vê mînaka xwe bidome; yan dê guherîneke kokî tê de çêbe, ev yek jî li gorî dewleta Îranê ne pêkan e, ji ber ku veguherîna ber bi dewleteke neteweyî û lîberalî ve yanî hilweşîna mînaka dewleta Islamî ya li ser piyan e; yan ev mînak dê belawela bibe da ku jinûvesazî li gorî nirxên demokrasiya bajarvanî yên têgînên navmaniya (cewherî) Islamê ku sincên baş, wekhevî, pêsikankirin û têgihiştina nirxên demokratîk ên nûjen vedihewînin, bê çêkirin.

Dogmatîka rêjîma Wîlayetûlfeqîh wê neçar dike ku dûrî çareseriyên kokî yên pirsgirêkê bikeve. Jixwe ev pirsgirêk bi van yekan tê nimandin: cudakirina ol ji dewletê, xurtkirina demokrasiyê di rêya rêzgirtina mafên mirovan û pirbûna siyasî re, misogerkirina azadiya giştî û hilbijartinan bi rengekî azad û rast, wekheviya di navbera jin û mêran de, mafê

[29] Îran şoreşeke di gurbûnê de ye. Dr. Ziyar Kiraçî, Pakistan, 2000.

[30] Manîfîsto şaristaniya demokratîk, parêznameya pêncemîn, pirsgirêka Kurdî û çareserkirina neteweya demokratîk (parastina Kurdên di nava erzînkên qirkirina çandî). Rûpela153. Ebdilah Ocelan.

destnîşankirina çarenûsa miletan, her wiha jinavbirina cudatiya ku ji ber zayend, ziman an jî olê derdikeve. Ji lewre nasnameya niştimanî ya ku gelan tevan bi hev re kom dike nayê bala aliyên desthilatdar yên li Îranê. Ne tenê wisa, lê belê wê nasnameyê di şêweyê îdiyolojiya "Xumeynî" de (mezhebî û netewyî) dihelînin, her wiha şîretan ji mînaka rêjîma Şah nagirin û eynî ramiyarî lê bi şêweyekî nû bi kar tînin. Li vê derê li hember hest û çanda gelên din ên ku bi hezarên salan li Îranê dijîn, radiwestin. Weke ku Niyûtin dibêje: **"Her kirinek berteka wê bi heman hêzê heye û berovajî wê tê. "** Lewma çi qas stemkariya rêjîma Îranê û dijminatiya gelên din zêde bibe, rijdbûna miletên bindest li ser azadî û mafê çarenûsê jî zêde dibe. Her çi qas tundî û terora rêxistinên ewlehiyê zêde bibe, daxwaza miletan a berxwedan û şkandina benda tirs û qedexeyê jî zêde dibe. Tundî û tundiya dijber dê bihêlin ku erdnîgariya Îranê û gelên wê yên xwedî şaristaniyeke kevnar ber bi kûrahiyê ve bigindirin, yanî weke ku hizirmend "Ebdelah Ocelan" destnîşan kir dê parçe parçe û belewela bibin. Ev yek bang dike ku niştimanwerên Îranî bi hemû bîr û baweriyên xwe bêhtir bi berpirsyariyên xwe yên niştimanî rabin, Her wiha zemîneke guncaw bibînin ji bo ku peywendiyê di navbera hev de bikin, hevkariyê li gorî rêzgirtina dualî pêk bînin, hevalên xwe bipejirînin û jiyaneke hevbeş bijîn. Ji ber ku her tişt destnîşan dike ku Îran ber bi hileweşîn û tunebûnê ve diçe, pêwîst e bergiriyên guncaw bên girtin ji bo ku cihêrengiya çandî, Isnî (Dozdehîmamî) û yekbûna xaknîgariya Îranê bên parastin, bi taybet piştî raperîna hemû gelan li dijî Wîlayetûlfeqîh  di sala 2017'an de ya ku navê raperîna rûmet û raperîna azadîxwaz û birçiyan lê hat kirin. Sedema wê jî hejarî, bihabûn, xizmetguzariyên kêm, tunebûna misogera tendirustî û civakî, ramyariya stemkarî û tengavkirina hemû cureyên azadiyê û mirina gelek îraniyan li şerên derveyî yên Wîlayetûlfeqîh . Jixwe daxwazên gel rastî tundî, terror, binçavkirina nerewa û bidarvekirinên hovane hatine.

Gelên Îranê yên ku daxwaza rizgarbûn û azadiyê dikin, bi serpereştiya navneteweyî ji kabûsa ku konê xwe ji sala 1979'an ve vedabû, hişiyar bû. Wê hingê du serbazên ferensî ketin bin baskên Xumeynî û ew birin balafira ku dê ji Parîs ber bi Tehranê ve bifire piştî ku "Mihemed Rîda Behlewî" reviya. Jixwe bikaranîna alavên tundiyê li dijî xwepêşanderan, şkandina hestûyan û rawestandina av û kehrebê nikarin dengê qêrîna rastiyê rawestînin. Çareserî ne di tundiyê de ye, lê belê di van tiştan de ye; pêşkêşkirina destpêşxeriyên

(Insiyatîv) rasteqîn, sererastkirinên kokî û li gorî peyman û zagonên navneteweyî, dayîna tevahiya mafên gelên Îranê. Jixwe mînaka Rêveberiya Xweser a ku xwe dispêre Felsefeya Neteweya Demokratîk mînakeke baş e ji bo çareserkirina pirsgirêkên gelên Îranê. Vê mînakê piştî qeyrana Sûriyeyê û piştî ku gelên Rojava-Bakurê Sûriyeyê pêsikaniya wê kir, karîgeriya xwe tekez kir. Her wiha roleke wê ya bingehîn di van tiştan de hebû; parastina hevgirtina civakî, dûrxistina şerê navxweyî, parastina binesazî û yekîtiya erda Sûriyeyê, her wiha bû herêmeke hêmin ji bo koçber û penaberên ku ji şerên herêmê reviyane. Pirojeyeke demokratîk û cuda ku bi Federaliya Bakurê Sûriyeyê tê nimandin pêşkêş kir, her wiha demokrasiya rasteqîn, beşdarbûna gel di dayîna ramanan de, dayîna biryarên ku xizmeta berjewendiyên wî dikin ku ji komînan dest pê dike û dûr ji desthilatdariya gişgirî û stemkarî, disepîne. Jixwe ev piroje bi awayekî baş ji hêla tevahiya gelên ku koçî Rojava-Bakurê Sûriyeyê bûne hat pejirandin û xwestin ku ev yek li ser herêmên wan yên rizgarbûyî weke Reqa û Dêra Zorê pêk were, ne tenê wisa, lê belê pûtepêdaneke mezin li nik gelên Sûriyeyê yên li herêmên din der barê vê pirojeyê de heye. Ji ber ku nêzîkatiyek di navbera rewşa siyasî, civakî û aborî ya civakên sûrî û Îranî û praniya civakên Rojhilata Navîn de heye, pêsikankirin û pêkanîna ramanên Felsefeya Neteweya Demokratîk; bandoreke erênî û mezin li ser her herêmeke ku di tevlihevî û nearamiya ku şofîniya nijadî û dogmatîka olî li pê xwe hiştin de dijîn, çêdike. Ne tenê wisa, lê belê dikare bibe bedêleke baş û cuda ji yên herêmê re.